بسم الله الرحمن الرحيم

الحمد لله رب العالمين

والصلاة والسلام على خير خلقه محمد وعلى اله وصحبه اجمعين

Hemd û şukur ê Rebbê 'alemê ne.

Selat û selam li ser qenctirînê mexlûqên Rebbê 'alemê Mûhemmed 'eleyhîssalatû wesselam bin, li ser al û eshab û hemî peyrewên wî bin.

Xwendevanên hêja!

Xwedayê Te'la roja di navbêna 'îbadên xwe de dewr dike. Rojên xweş û nexweş… her rojek û teb'en her zemanek dagirtî tê, zeman û roj qedera Îlahî hildigrin. Îmtîhanên ku bi xwe re tînin, li nav mexlûqan datînin. Qeder bi şeklê qezayê tecellî dike û herkes dighêje qedera xwe.

Kurdistan ku di navenda coğrafyaya ummetê de ye van rojan dibe şahidê hadîseyên bijan. Hadîseyên ku di van rojan de derdikevin pêş û bi serê civakan û karbidestan de tên di hesabê wan de tune bûn. Sancoyê Kurdistanê zêde dibin. Me hêviye ku vana sancoyê wîladeteke bi xêr bin.

Huner û edebiyata ku di nav sancoya de derdikeve a bi qîmet û bitesîr jî ew e.

De îja vê hejmara **Kelhaamed jî berhemek vê sancoyê** ye.

Di nav vê atmosferê de me di vê hejmarê de bi navê; **"Ji Ber Ku Hedef Rast Nayê Tespîtkirin Pirsgirêk Kûrtir Dibe"** encamnameya Komxebata Çareserıya Îslamî Ya Jı Bo Pırsgırêka Kurd ji bo xwendevanên xwe derxist pêş. Bi sebeb beşdarbûna 600 delegeyên ji cûrbecûr saziyên civakî yên sivîl ev komxebat hatiye sazkirin encamnemeya wê gelekî girîng e.

Û nivîsa **"Li Dij Aşîtiyê Du Astengên Girîng", "Ev Şer Ne Şerê Kurda Ye", "Gelê Kurd Şiyar Bibe"**, şi'ra **"Milletê Min"** yek tiştî dibêjin: **Divê sîleh û şîddet nebin enstrumanê çareseriyê. Çareserî, di nêrîna îslamî de bingeha 'edaletê ye.**

Hemî nivîsên meyê din jî hunerên gelek bi qîmet in, ji şewq û 'eksa van rojan peydabûne. Em ji nivîskarên xwe re minnettar in, Xweda ecra wan bide.

Ji ber hinek pirsgirêkan hejmara me ya 25a hem dereng derket hem jî hinek ğeletî tê de çêbûn. Ji ber vê em lêborînê ji xwendevan û 'eleqedaran dixwazin.


Bi hêviya, rola ku Kelhaamed girtiye ser milê xwe bi heqî anîbe cî û îstîfadekirina jê em xatira ji we xwendevanan naxwaz in; çimkî bihevrebûna me bi bihevrebûna xwendina nivîsên me didome.

Keremkin…

# naverok


Ji Weşankar ........................................................ 1
Jı İmamê 'Hesen El-Benna ................................. 3
Jiber ku hedef rast nayê Tesbîtkirin/Kelhaamed . 4
Mılletê Mın/Fethullah Yalçın .............................. 8
Ji Rîsala Uxuwetê-5............................................. 9
Ev Şer Ne Şerê Kurdaye/Mahmut Kılıç ............. 10
Li Dij Aşîtîyê /Mamoste Çebexçûrî .................. 12
Gelê Kurd Şîyar Bibe/Îbrahîm Elıhî.................... 16
Şehît Aytaç ......................................................... 18
Îro Sikûtkirin Sibe Zillete/Şerîf Emîn .................. 19
Dirok Bi We Xemilîye / Seyîdê Memolan.......... 22
Baba Tahirê Hemedanî/ Fatîh Akman ................ 24
Dı Dewra 'Usmanîyan-2 / Yasîn Heyderî ........... 26
Tesewuf-2 / M. Ce'fer Becîrmanî....................... 28
Hz. Adem / E'hmed Zeytunî.............................. 30
Xewn û Xîyal/ Cewdet Karaman ........................ 32
Gotinên Pêşîyan-2 .............................................. 33
Xanıma Şehîd / Muhemmed Baran .................... 34
Zîyaretgahên Me.................................................. 36
Ey 'Hebîbê Qelb û Ru'h / Sîyehpuş .................. 38
Dı Zimanê Kurdî de / Cewat Qemerî ................ 39
Salih Begê Hênî/ 'Ebdulkadir Turan .................. 43
Ger Dil Nebit / Mela 'Eli Bothî .......................... 46
Ji Bêtîfaqîyê / Mûhemmed Çelîk ...................... 47
Îro 'İde Bê Qerarim/'Ebdurrehmanê Axtepî ...... 48
Sûreyê İnşîrah...................................................... 49
Êsayîşê 'Halîma/ Îbrahîm Çebekçûrî ................. 51
Qalıgê Peyxemberê Ma/ 'Ebdullah Cewher...... 52
Quran Kelamê Îlahî/'Ebdullah Cewher ............. 53
Di Cehaletê de Xwe... /'Ebdussemed 'Hîlmî..... 55
Ji ber ku hedef rast nayê Tesbîtkirin/ 'Erebî....... 59
Bexçe Zaroka ...................................................... 60
Ferhengok............................................................ 64


- Mamoste Çebexçûrî



12

## Li Dij Aşîtîyê Di Asteng

*Bi rastî Îro hem 'alema İslamê hem jî 'alema însanîyetê bi qasî ava 'heyatê hewcdarê sempozyûmê wihareng in. Da ku pirsgirêkên xwe bi şêwr û mişêwrê çareser bikin.*

- Fethullah Yalçın

## Milletê Min

*Ey gelî milletê Kurmanc xelkê bi i'zzet û îman*
*Ji ğeyrî Îslama 'ezîz nîne ji mer sitr û eman*
*Ev çi hal e em tê de ne di vê dewra axir zeman*
*Yetîmê ummeta Îslam milletê Kurd xelkê min e*



8

- Cewad Qemerî



39

## Di Zimanê Kurdî de Ergatîf û Salığnav

*Di zimanê Kurdî de giringîya ergatîfê bê nîqaş e. Lewra rast fêmkirin û standardîzasyona ziman, di warê bikaranîna ziman de xalekî gelek muhîme. Em dê li jêr bi çend mînakan vê heqîqetê rast bidêrin ku zimanê Kurdî, nexasim Kurdîya Kurmancî zimanek ergatîve.*


kelhaamed
banga heq ji
Kovara İslamî Çandî û Hunerî

Sal (Yıl) : 7 ❖ Jimar (Sayı) : 26 ❖ Biha (Fiyat) : 6 TL
Payîz (Îlon - Cotmeh - Mijdar) 2015
❖
Xwedî û Berpirsîyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazı işleri Müdürü): Abdulkudus YALÇIN
❖
Ciyê İdarê (İdare Yeri) : Yavuz Selim Mah. Mehmetçik Sk. No:71 K: 3/E Esenler/İSTANBUL
❖
Têkilî (İletişim - Sipariş):
Tel : 0212 562 60 06

Web: www.kelhaamed.com
Mail: bangaheqq@gmail.com
❖
PTT Hesap No: Abdulhalim TÜRE - 591 87 91
❖
Yaygın Süreli
❖
Çapxane (Matbaa):
DERGAH OFSET : 0212 489 33 33
❖
Nîşe (Not): Mesulîyeta Ramanên Nivîsaran aîdê Nivîskaran e. Berhemên têne şandin nayên vegerandin.




Grafik-Tasarım: Hasan Güzey

# Îmam 'Hesen El-Benna

# Dibêje:

1. Şert û merc çi dibin ew zane dema we azana şerif bihîst ji bo edakırına nimêjê rabin

2. Qurana Kerîm pir bixwînin, bi tefekkur li ser hur bibin an bi kûrlêkolîn li ser bi xebitin an jî guhdarîya wê bikin. Wexeteke xwe ya kêm jî di karê pûç de badilhewa neborînin.

3. Zimanê xwe (ê zikmakî) baş bikarbînin û ji bo başbikaranîna ziman cehd û 'xeyret bikin. Lewra ev (başbikaranîna ziman) nîşana muslumantîyê ye. Zimanê 'Erebî fêr bibin. Lewra Qur 'an herîbaş bi zimanê 'Erebî tê fêmkirin.

4. Di tu mewzûkî de nekevin nav nîqaşên ji hed der. Lewra di her dem û dewranan de tu xêr ji pozbilindî û qurretîyê peyda nabe.

5. Pir nekenin lewra qelbê ku bi Allah te 'ala ve girêdayî bit dibê sakîn û bi waqar bit.

6. Xwe ji pêkenoktîyê dûr bikin lewra milletek mucahîd ji bil cîddîyetê tiştekî dî nas nake

7. Dengê xwe bi qasî bihîstina muxatabê xwe bilindkin. Baş bi zanibin ku bilindkirina deng a zêde xodbînî û ezîyet e.

8. Ne xeybeta kesî bikin ne jî tevgera kesî biçûk bibînin. Ji bil xêr û qencîyê hîç neşte'xilin.

9. Ew nexawzin jî dema ku hun rastî birakî xwe hatin li riya hevnasîya bi wan re bigerin

10. Wezîfe ji wextê zêdetirin. Jibo ku hun ji wextê îstîfade bikin destê alîkarîyê ji kesên dî venekşînin. Eger wezîfekî we a bikaranînê hebit ji bo ku hun wê wezîfê di riya herî kurt de bi awayek xweş bikarbînin cehd û 'xeyret bikin..

11. Çi mala we, çi cilê we, çi meskenê karê we (çi dibe ew zane) bi her awayî ehemmîyetê bidin paqijiyê. Lewra ev dîn li ser xîmê paqijiyê hatiye damezrandin.

12. Bi 'ehd û peyman û we'da xwe re wefadar bin. Şert û merc çi dibin ew zane muxalefetî 'ehd û peyman û we'da xwe nekin.

13. Xwendin û nivîsandina xwe bi kemilînin. Rojname û kovarên Muslumana bi mutaalayek pir bi xwînin. Ger biçûkbe jî dibê pirtukxaneyek we hebit. Ger hûn xwedî îhtîsas bin pisporîya xwe ya di warê îhtîsasa xwe de bi pêş de bibin.

14. Dilê xwe bi wezîfeyên hikûmetê ve ne zeliqînin. Bizaninibin ku wezîfeyên hikûmetê ji bo rizq derîyên herî tengin. Lê eger ku hikûmet wezîfekî bidit we û ew wezîfe jî dijberê wacibatê de'wa we nebit wezîfa xwe baş bikarbînin û dev jê bernedin.

15. Bi qismek malê xwe tevlî de'wê bibin. Zikata kul i ser we ferze bidin cema 'etê. Hatinîya we çiqas kêm dibe bila bibe parek ji hatinîya xwe ji bo feqîra veqetînin.

16. Kêmbe jî qismek ji malê xwe ji bo rojên teng veqetînin. Nebî nebî hûn nedin pey eşyayê luks

17. Bê sekn û hedan tewbe û îstî 'xfar bikin. Berya xewê bi qasi çend deqîqa nefsa xwe muhasebe bikin. Xwe ji tiştên bi şik dûr bikin da ku hun nekevin nav heramîyê.



18. Ji mekanên zewq û sefayê xwe dûr bikin û bi wan cîhan re (ku mekanê munkerata ne) ceng bikin. Ji temmamî dîtberîyên qonfor û rehawetê xwe dûr bikin.

19. Li her derê de'wa xwe bi teblî'xê belav kin. Bi nefsa xwe re mucadele bikin da ku hûn karibin hefsarê wê bixin deste xwe. Çavên xwe ji heramîyan bi parêzin û hîsên xwe kontrol bikin.

20. Hem rû'hen hem jî 'emelen daîma bi cema'etê re bin. Xwe wek wî leşkerî bibînin ku di qişla xwe de li benda emr û ferman e.

# Ji Ber Ku Hedef Rast Nayê Tespîtkirin Pirsgirêk Kûrtir Dibe



*Encamnameya Komxebata Çareseriya Îslamî Ya Ji Bo Pirsgirêka Kurd:*
*- Dijwarbûna Pevçûnê Wê Hemî Kesê Herêmê Bişewitîne*
*- Divê Sîleh û Şîddet Nebin Enstrumanê Çareseriyê*
*- Çareseî: Di Nêrîna Îslamî De Bingeha 'Edaletê*

Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm

Li Diyarbekirê di 7-8ê Adara 2015an de, li ser navê 3500 saziyên civakî yên Îslamî bi beşdarbûna 600 delegeyên ji cûrbecûr saziyên civakî yên sivîl, cemaet û camîa', 'alimên medreseyan û pêşîvanên me yên me'newî, Komxebata Çareseriya Îslamî ya Ji bo Pirsgirêka Kurd hat tertîbkirin. Bi armanca çewtiyên ku di pêvajoya çareseriyê de hatine kirin û sedemên xetmînên qewimîne bên xeberdan, tewsiye bên kirin da ku pêvajo li ser zemîneke saxlem rûnê, şaşîtî bên rastkirin, xetimîn bên vekirin; rêya gihaştina çareseriyeke adîl û aştiyeke daimî bê niqaşkirin, du rojan delege hatin cem hev û encamnameyek diyar kirin.

"Pirsgirêka Kurd ne tenê bi ewlehiyê re eleqedar e; meseleke ku hêlên wê yên dîrokî, siyasî, sosyolojîk, aborî, herêmî û navneteweyî hene. Ji ber ku hedef rast nehatine tesbîtkirin û rêbazên rast nehatine bikaranîn, çareserî dereng dikeve û ji lew pirsgirêk kûrtir dibe. Gihaye nûqteya ku ber bi kangrenê ve diçe, ji lew divê mesele beriya her tiştî û acîlen bê çareserkirin.

Kurd hema piştî 'Ereban, beriya Tirk û Farisan bi Îslamê şerefyar bûne û bûne insûreke 'eslî ya ummeta Îslamê. Kurdistana ku bi piranî û komî kurd lê dijîn, di navenda coğrafyaya ummetê de ye. Pirsgirêka Kurd bêçareser bimîne, ew ê bandoreke neyînî li hemû coğrafyayê û ummetê bike, lê belê çareseriyeke 'adîl, ew ê ummeta Îslamê û coğrafyayê dilrihet bike. Tirk û 'Ereb û Farisên ku qewmên cîranên coğrafyaya Kurdistanê ne, taybetmendiya wan a herî girîng a bi Kurdan re hevpar, mislumantî ye. Cûdabûna ziman û rengên me, ji ayetên Xweda ne. (Rûm-22) Em wek xelk û qebîleyên ji hev cûda hatine xuliqandin da ku em hevûdû nas bikin. (Hûcûrat-13)

Fermana Tanzîmatê ya 1839an, nerihetiyên merkezî bi xwe re anîne. Laîktî û netewekariya ku kurtasiya felsefeya sazbûna Cimhûriyetê ye, pirsgirêk mezintir kiriye, di encama tebîî ya pratîka dewleta netewe de,

polîtîkayên Tirkkirinê (an jî asîmîlasyonê), înkarkirina nasnameyên cûda, îmhakirin û bidûrxistin, zulum gihandine wî heddê ku nayê tehemmulkirin. Xelkê Tirkê musluman ew bi xwe jî mexdûrê îdeolojiya resmî ye. Bêyî meriv têkeve şaşiya ku fatûra li xelkê Tirk bê birrîn, divê polîtîkayên dewletê yên tekparêz, netewekarî û laîktî bên mehkûmkirin.

Tarîx nebûye şahidê hebûna xelkên musluman ên bi hevûdû re şer kirine. Di heyama 30 salên dawîn a lihevxistinê de, sedema herî mezin a ku planên berhevdana xelkê Kurd û Tirk hev negirtiye, muslumanbûna herdu xelka ye. Ger Kurd û Tirk ji Îslamê bên dûrxistin, ew ê şerê di navbera hêzên çekdar ên rêxistin û dewletê de, rîska ku şer di navbera herdu xelkan de jî biqewime derîne û wê ev rewş bibe felaketa Kurd û Tirkan.

Pirsgirêka Kurd, mesela Tirkiyê ya herî girîng û acîl e. Ji bona ev mesele adîlane bê çareserkirin, divê pirsgirêk di zemîneke rast de bê niqaşkirin, pêvajoya çareseriyê zelaltir bê meşandin, dev ji wê yeka ku sîleh û şîddetê wek metoda bidûketina mafan û wasîteya pêkanîna hakimiyeta sehayê dibîne bê berdan. Hêla navneteweyî ya pirsgirêkê, mûwezeneya siyasî û jeopolîtîk, çareserkirina pirsgirêkê dijwartir dike. Lê belê ev faktor ne xwedî bandoreke diyarker in. Hêzên navneteweyî nexasim nûnerên emperyalîzmê dawetî maseyê bên kirin, ew ê meseleyê girîftir bike. Çareserkirina meseleyê divê li ser dînamîkên navxweyî pêk bê.

Digel rast tesbîtkirina hedefê, pêwîst e ku rê û rêbaza tê şopandin jî rast bin. Ji ber vê yekê divê meriv qaîdeya ku "usûl dikeve pêşiya esasan" ji bîr neke. Yan na gihaştina armancê ne mimkun e. Di çareserkirina vê meseleyê de muxatab dîtina hêlekê tenê, çareseriyê dijwartir dike û dibe sedema xetimînên ciddî. Çareserkirina Pirsgirêka Kurd, gava ji paradîgmaya dewleta netewe û nêrîna neteweperwer û lîberalê bête dûrketin, mimkun e. Divê di nêrîna Îslamî û tecrûbeya tarîxî de li çareserkirina pirsgirêkê ya li ser bingeha 'edaletê bê gerîn. Mixabin heta niha ji bergeha vê nêrînê dûr sekinîne, ji tecrûbeyên tarîxî jî nehatiye îstîfadekirin.

Li Tirkiyê hemî nasname û kultur, dixwazin bi reng û nexşên xwe di 'eynî tûwalê de bigihêjin hev; di heman ebrûyê de hebin, bi amûr û enstrumanên xwe 'eynî newayê bibêjin. Di heman demê de dil dikin ku di 'eynî çarçoveyê de li 'eynî asoyê bi hev re binêrin, xewna pêşerojeke xweş a ku wê qedereke muşterek hevpar bikin dibînin.

Em 600 delege û digel nêzî 4 hezar pevgihanên xwe, di dawiya komxebata ku me ji ber mesûliyet û şahidiya xwe ya Îslamî pêk anî de, tesbîtên xwe yên di warê "Ji bo çareserkirina Pirsgirêka Kurd, pêkanîna aştiyeke daimî û awayê sağlemtir meşandina pêvajoya çareseriyê, gavên divê bên avêtin" de derketine holê, bi raya giştî re parve dikin:

1- Gelê Kurdên musluman, herî meğdurê şer û pevçûnên li ser tê kirinê ye. Ji ber vê yekê hemî însanên li Kurdistanê dijîn, li herêmê çareserî û hizûrê dixwazin.

2- Bêyî dîqetkirina daxwazên maf û hessasiyetên xelkê kurdê musluman, çareserkirina pirsgirêkên ku bi sed salan e çê bûne ne mimkun e. Paydeya hevpar a xelkê Kurd Îslam e. Ji ber vê yekê xelkê Kurd tu çareya ğeyrî Îslamî qebûl nake.

3- Di çarçoveya çareserkirinê ya Pirsgirêka Kurd a ku di encama zordestiyên îdeolojîya resmî ya Kemalîst de derketiye holê û heta îro bûye sebebê mirina bi hezaran însanan û kişandina êşên giran de, eşkere bûye ku divê sîleh û şîddet nebin enstrumanê çareseriyê.

4- Divê çareseriya bi rêyên siyasî ya pirsgirêka Kurd bê parastin û pêvajoya çareseriyê ya ku bi vî awayî hatiye destpêkirin bê destekkirin.

5- Divê pêvajoya çareseriyê; terkkirina polîtîkayên înkar û asîmîlasyonê yên îdeolojiya resmî ya netewekar, berfirehkirina maf û azadîyên sereke, bi awayê hemwelatîbûna wekhev bidawîkirina cûdahîxwaziyê, bidawîkirina pevçûnên ku ev serê 30 salî ye welat bi gelek derd û kulên pirhêlî re rû bi rû hiştiye û wesayeta

leşkerî xurt dike, bêçekkirina rêxistinên çekdar, pêkanîna tevlîbûna siyaseta sivîl û di analîza dawîn de jî sekinandina xwîna diherike vehewîne.

6- Divê zemîna civakî, siyasî, aborî û psîkolojîk a pêvajoya çareseriyê bê çêkirin.

7- Pirsgirêka Kurd heta îro ji bo kesên ku dixwazin statuko berdewam be û sîstema wesayetê li ser piya bihêlin, tim bûye wasîteyeke bikêrhatî. Ji vî alî ve hem kesên terefdarê wesayeta mîlîtarîst hem jî hemî hêlên ku xwe bi pirsgirêka Kurd xwedî dikin, xwestine pirsgirêk berdewam be û xebitîne ku hewlên çareserkirina pirsgirêkê bêencam bikin.

8- Pêvajo digel hemî êrîşên provokatîf jî, bi saya piştgiriya civakî didome. Ji bona pêvajoya çareseriyê ya ku pir caran hatiye sabotekirin, şeffaftir û di zemîneke sağlemtir de bimeşe, divê bingeha heyeteke ku ji kesên xwedî pêbaweriya civakî û ji temsîlkarên partiyên siyasî pêk tê bê avakirin û tevlî pêvajoyê bibe. Wê ev heyet weka çavê sêyemîn di navbera dewlet û rêxistinên çekdar de hakemtiyê bike, yên dixwazin pêvajoyê qetûbir bikin û soza xwe naynin cî deşîfre bike û wê erênî midaxela pêvajoyê bike.

9- Divê Mesela Kurd û Pirsgirêka PKKyê ji hev bên veqetandin. Divê herdû pirsgirêkên ku ev 30 sal e ji ber tevger û sepandinên dewletê yên ewlekar û netewekar ketine nava hev, ji hev bên cûdakirin û zemîneke siyasî ya ku pirsgirêk li serê çareser bibe bê bipêşxistin.

10- Rayedarên dewletê divê Pirsgirêka Kurd, danexin asta bi sîlehan yan jî agirbestiyê. Kurd mijara 'eslî ya pêvajoyê ne. Mafên wan ên sereke yên Îslamî û însanî ku ji aliyê sîstema Kemalîst ve hatine ğesbkirin, divê qet nebin mijara tu bazarkirinê û di her halûkarî de bêyî derengxistinê bên dayîn.

11- Divê ji ber zulmên heta niha hatine kirin, di serî de yên li 'alimên kurd wek Şêx Seîd ku xelkê Kurd wan bi rêz û hurmeteke mezin bi bîr tîne, li ser navê dewletê uzr û lêborîn bê xwestin û îtîbara wan bê îadekirin. Her wiha ciyên mezergehên Şêx Seîd, Ustad Bedîuzzeman û Seyyîd Riza bên diyarkirin.

12- Divê Kurdî wek zimanê resmî yê duyem bê qebûlkirin, hemî astengên li ber perwerdeya bi zimanê dayikê bên rakirin.

13- Çewtiyeke mezin (kêmasiyeke girîng) e ku hikûmet di pêvajoya çareseriyê de hêlekê tenê dike muxatab, kes û grûb û saziyên ku li herêmê bergindên wan ên sosyolojîk û siyasî hene dîqat nagre. Ji bona pêvajoya çareseriyê şimûlî hemî civakê bibe, di serî de aliyên Îslamî hemî hêlên civakê, divê tevlî pêvajoyê bên kirin û li hessasiyetên wan dîqet bê girtin.

14- Ji bona çareseriya pirsgirêkê di serî de HUDA PAR û HAK PAR, divê nûner û temsîlkarên aliyên Îslamî tevlî pêvajoyê bibin. Ji bilî aliyên Îslamî, fikr û îdeolojiya wan çi dibe bila bibe, divê bi hemî saziyên rêxistînî yên Kurdan re jî hevdîtin pêk bên û rê li ber keda wan a ji bo çareseriyê bê vekirin.

15- Perspektîfa siyasî ya ku hikûmetê ji bo çareserkirina Pirsgirêka Kurd bi pêş xistiye, ji aliyê pêşketina siyaseta sivîl ve qonaxeke musbet e, lê belê îro ji aliyê rewşa ku hizûr û ewlehiya xelkê xistiye bin talûkeyê ve, divê ji nû ve di ber çavan re bê derbaskirin.

16- Heta îro di heqê bûyerên êrîş û agirpêxistinê ku hema hema serê 10 salan e bênavber li ser komel û partî û kargehan hatine kirin de, lêpirsînên ciddî nehatine kirin, di heqê gelekan de ji ber ku doz nehatiye vekirin, ji aliyê ewlehiya qamûyê ve tabloke zeîfiyê der anîye. Hîssiyata pêbaweriyê ya civakê zirar dîtiye.

17- Nexasim di bûyerên 6-8ê Cotmehê de li ber mîlîtanên ku bi hinceta Kobaniyê daketin kuçeyan û êrîşên wan gihane zîrweya vandalîzmê û paşê di hedîseyên ku li Cizîrê qewimîn de hêzên asayîşê, çavên xwe ji êrîşên li ser sivîlan re girtin, midaxele nekirin û rê li ber zayîata can û mal negirtin, bûn sedema ku pêvajoya çareseriyê bê pirsîn. Ev êrîş û yên bi vî rengî li herêmê, ne li aliyên Îslamî tenê, yekcar li Îslam û muslumanan tê qebûlkirin. Êrîşên

li nirxên Îslamî tu car nayên qebûlkirin.

1- Pkk û pevgihanên wê bi pêvajoya çareseriyê, stratejiya ku li herêmê bibin hêza serdest a bi tenê bi pêş xistin. Bûyerên 6-8ê Cotmehê yên di bin vê stratejiyê de pêk hatin, zordestî û te'deyên din ên qewimandin, zemîna ku li Kurdistanê bi yên ne wek xwe difikire re û ji yên ğeyrî xwe re pevre bijî ji holê radike. Pêvajoya Çareseriyê ya ku digel pirê hêlên civakê û camîa' Îslamî jî piştgiriyê didê, piştî bûyerên 6-8ê Cotmehê, marûzî kêmbûna pêbaweriyeke ciddî bûye.

19- Stratejiya zordestî û te'deya ku li herêmê tê meşandin, digel ku tu menfîet nedaye xelkê Kurd, mixabin bi zeman re dibe sedema ku hêlên cûda ji bo parastin û hebûna xwe, mecbûrî pevçûnan bibin. Divê PKK û pevgihanên wê dev ji siyaseta şîddet û zordestî û qutifandinê ya ku herêmê ber bi kaosê ve dibe berdin; qebûl bikin ku mecbûr in bi rêxistinên ne wek wan difikirin re pev re bijîn.

20- Qanûna bingehîn a darbeyê ya ku fêkiya zihniyeta Kemalîst e û çavkaniya qewimîna Pirsgirêka Kurd e, divê bê guhertin, ji cext û îfadeyên etnîkî bên parzûnandin û li ser esasê welatîbûna wekhev qanûneke esasî ya nû bê amadekirin. Divê dev ji wesfandina ku her kesê bi bendê hemwelatiyê bi dewleta Cimhûriyeta Tirkiyê ve girêdayî ye Tirk e bê berdan. Di serî de qanûna bingehîn, di qanûnan de cextên etnîkî bên derxistin. Gotinên irqçî, nejixwehesibandinê û înkarî yên hakimê zimanê dewletê, divê ji hemî mewzûat û lîteratur û sîstema perwerdehiyê bên avêtin.

21- Divê sînorên sûn'î yên xelkê Kurd, 'eşîran û heta malbatan ji hev vediqetîne bibin sembolîk, ji bona pêşketina têkiliyên însanî, aborî, çandî û civakî û pêkanîna hiqûqê merivantiyê hemî rêkûpêkkirinên hewce bên kirin.

22- Berpirsiyariya hemî hêlan e ku xwe ji her cûreyê tewr û helwestên wê nîvenga pevçûnê kûrtir bike biparêzin. Jixwe dijwarbûna nîvenga pevçûnê û li herêmê qewimîna nîvenga kaosê, wê bibe sedema şewata ku li herêmê hemî kesî bişewitîne. Ji ber vê yekê ji bona li herêmê di navbera Kurdan de pevçûnek neqewime, divê herkes mesûliyeta ku dikeve ser milên wî bîne cî.

23-Divê ji bona di pêş de dijminantî û meğdûriyetên muhtemel neqewimin, tedbîr û bergiriyên hewce bên hildan, sîstema parêzvanî bê rakirin.

24- Aqûbeta bi hezaran welatiyên wenda divê bê daxuyandin û lêpirsînên ciddî bên kirin daku failên meçhûl û înfazên navxweyî yên rêxistinê bên ronîkirin, gundên hatine şewitandin û valakirin û berpirsiyarên ku koçberiya mecbûrî dane kirin bên tesbîtkirin.

25- Ji bo 'edilandina bingeha exlaqê ku di civakê de ber bi xerabûnê ve diçe û ji nû ve avakirina biratiyê, weka berê medreseyên ku wê roleke sereke hildin ser xwe bên bicankirin. Rê li ber perwerdeya dînî bê vekirin, heyama ku di perwerdeya medreseyê de dibihure, ji dema perwerdeya mecbûrî bê hesibandin û ji îcazetên tên dayîn re belgeyên hevtayî bên dayîn.

26- Divê qanûna partiyên siyasî, ji helwestên dewra wesayeta leşkerî bên parzûnandin, digel bergiriyên îstîkrarê diparêzin, bi awayê ku wê temsîliya civakî bi herî belavbûyî tesîs bike bê guhertin, bendava hilbijartinê bê rakirin.

27- Bi armanca kesên ji ber sedemên siyasî di hepsan de vegerin heyata civakî û yên mecbûrî derketine derveyî welêt vegerin welatên xwe, divê rêkûpêkkirinên qanûnî yên hewce bên kirin.

28- Ji bona pêşveçûna Kurdistana ku bi polîtîkayên zanebûn, ji aliyê aboriyê ve li paş hatiye hiştin û ji bona başbûna aboriya wê, divê ji herêmê re cûdahîxwaziyeke pozîtîf bê kirin, ger hewce be divê bi veberhênanên rasterast ên dewletê, îmkanên îstîhdamê bên zêdekirin.

"Bêguman aşîtî bixêrtir e."(Nîsa-128)
Dawîya de'wa me Hemdê ji Rebbê alemê re ye

HEYETA TERTÎBKIRINÊ YA KOMXEBATA ÇARESERIYA ÎSLAMÎ YA JI BO PIRSGIRÊKA KURD

# MILLETÊ MIN

Fethûllah YALÇIN

Ey gelî milletê Kurmanc xelkê bi i’zzet û îman
Ji ğeyrî Îslama ‘ezîz nîne ji mer sitr û eman
Ev çi hal e em tê de ne di vê dewra axir zeman
Yetîmê ummeta Îslam milletê Kurd xelkê min e

Ehlê xaç û agirperest û mel’ûnê hezar salan
Ji hevdû re pêşkêş dikin welatê me dikin talan
Bi destê rûreşên menhûs bi hîlew dekkê neyaran
Îxanet û kêra zingar çikandine sênga min e

Li dewsa şêr û pilinga derketin rovîy û çeqel
Talan kirin war û welat rê girt eşqiya û çepel
Dîn û mizgefta xerakin li cîyê wan dêr û şapel
Dixwazin ku ava bikin li ser ax û warê mine

Wan konê şehinşahiya tirsê li welat vegirtin
Bi hovîtî û zortestî deştû çîyayê me girtin
Bi rêtina xûnê meşîn li pey mel’ûna şop girtin
Ev herb û şerrê gemarî ne cehda welatê min e

Li vî heqyê guhdar bibin ma’r tucarî kedî nabe
Bi koranî nebin esîr dûpişk bêj’ar qet’î nabe
Gelek me pirsî yû seh kir gurê wehşî xwedî nabe
Bi rastî ev çetewarî ne azadya warê min e

Em xelkê Kurd bi Îslamê ‘ezîz û hem azade bûn
Xwedî exlaq û bi namûs avayê me bal qible bûn
Çima îro bi koranî li pey şopa sergerde bûn
Çavnas bibin ev fitna han ne cenga milletê min e

Ey siwarê xweş azadî qaîmê ‘edl û heqîqet
Bitev hukmê xwe dagere bide gellê me besîret
Qevdikek bihar verêke ji rojê çengek me’rîfet
Bigre destê min xelasî ev welat û axa min e

Ev welat û axa me ye namdar e bi nav Kurdistan
Ev çend sal e li vî warî ma xelas nabe zivistan
Bihar hate ji bîr kirin li vî welatê gulîstan
Min kişand ta’de vî qasî di vê dewrê besî min e

Besî me ye di vê qernê ey ax û erda nazenîn
Heta kengî tê bînî xwar nav û dila ah û enîn
Ey welatê aşiqên heq wek Cezerî û Mem û Zîn
Feqîyê Teyran û Xanî hîv û roja warê min e

Li ser vê erdê hîv û roj wê cardin qam bidin nûrşen
Di piştî Şêx Se’îd û pey şehîdên ‘ezîzên rûşen
Mij û tarî wê bela be welat dîsa bibe gulşen
Dîclew Firat wê av bidin dar û berê warê min e.






## Ji Rîsala Uxuwetê-5

# 'Halekî Îctima'î Ku Şayanî Teesufê Ye

Hedîseyeke balkêşî 'îbretê: Wextekî Xwedê Te'ala jê razî be îmam Hezretî 'Elî (di herbê de) yekî kafir avêtiye erdê. Dema ku Hezretî 'Elî şûr kişandiye ku wî kafirî bikuje, wî tû kiriye rûyê Hezretî 'Eli. Hezretî 'Elî ew kafir berdaye, ser jê nekiriye. Wî kafirî ji Hezretî 'Elî re gotiye te çima min ser jênekir. Îmam gotiye min xwest ku ji bo rizaya Allah bi tenê serê te bipekînim. Lê wexta ku te tû kir min. Ez hêrs bûm, ji ber ku para nefsê ketê min dev ji serjêkirina te berda. Wî kafirî ji wî re got: Ji bo ku tu min zû ser jêkî min xwest ku ez te hêrs bikim. Lê madem ku dînê we hewqas safî û xaliseev dîn dînê heq e.

Hem bûyereke şayanî balkêşê ye: Wextekî amirê yekî ji ber kuhakim di hengama destjêkirina yekî de hatiye ğezebê, ew ji wezîfê vekişandiye. Lewra eger wî dadmendî li ser navê şerî'etê bi hesabê qanûnê îlahî ew dest jê bikira, dê di hengama jêkirinê de dil pê bişewitanda. Lakîn qelbê wî jî dê nehata hîddetê. Lê belê dê bi awayê lê merhemetê neke destê wî jê bikira. Nexwe ji ber ku wî dadmendî para nefsê tevlî hukmê xwe kiriye. Hukmê 'edaletê pêk ne anî ye.

Halekî îctima'î ku şayanî teesufê ye û merezeke muthîş, mereza îçtimaî ku lazime qelbê ('alema Îslamê) pê bigrî:


(Gelî muslumanan hûn dibînin) qewmên herî bedewî jî di hengama zuhûr û hucûma neyarên xaricî de jibîrkirin û detsjêberdana 'edawetên daxilî ku mesleheteke îçtimaî ye teqdîr dikin û bi cîh tînin. Gelo ma çi xwelî bi serê wan kesan de bariye ku de'wa xizmata cema'eta Îslamê dikin,digel ku hewqas neyarên Îslamê yên bê hed ên ku li pey hev ji bo hicûma muslumana rêzbûyî hene 'edaweta cuz'î jibîr nakin.Ji êrîşa neyaran re zemîn hazir dikin.Ev hal sukut e.Wehşet e.Li heyata Îslamîya îçtima'î îxanet e.

Hîkayeteke şayanî îbretê: Ji 'eşîrên bedewî ji hevre neyar du qebîlê ji 'eşîra Hesenan hebûn e.Digel ku ji sedî zêdetir ji hev mêr kuştibin jî, dema ku qebîlekî wek a Sîpkanan jî ya Heyderan derdiket pêşberî wan, wan herdû qebîle yên neyar, hetta ku wî neyarî def bikin neyartîya kevn ji bîr dikirin û 'edaweta daxilî bi bîr nedianîn.

Gelî mu'mînan! Ma hûn zanin çi qas neyarên di hukmê 'eşiretê de hene (ku îro) û li dij 'eşîra ehlê îmanê ketine weziyeta tecawizê.(Bi rastî) wek daîre yên di hundirê hev de ji sed daîreyî zêdetir (neyarê ehlê îmanê) hene. Gelo ma bi çi hawayî bi ehlê îmanê dikeve digel ku li dij her yekî ji van ('eşîrê neyaran) weziyata mudafayê ya bi tesanud û desthevgirtinê mecbûrî be (û ew jî li dij vê) bi alîgirtineke bi ğerez û 'edaweteke bi înad ku (ji bo neyarên îslamê) ji bo daketina herema Îslamê di hukmê hêsankirina hucûmê û vekirina derî de ye. Ji wan daîre yên neyar belkî heftê nevê neyaran hene. Go ji ehlê îlhad û delaletê bigre ta ehlê 'alema kufrê, ta ehwal û mûsîbetên dinê bi hevre li dij we ketine wezîyeta neyartîyê, bi hev re bi hirs û hîddet li we mêze dikin. Li dij van hemî neyaran sîliha te ya herî bi hêz, sîper û qel'a te uxuweta Îslamê ye. Êdî şiyar bibe û baş fêr bibe ku bi behane û qozên biçûk hejandina vê qel'a Îslamîyetê çiqas muxalifê ûjdan û mesleheta Îslamîyetê ye.

Di hedîsa şerîf de hatiye ku kesên wek deccal û sufyanê axirzemanê muthîş û muzirê ku dibin serekê nîfaq û şîqaqê de, ji hirs û şîqaqa ('alema) Îslam û beşer îstifade dikin. Û bi hêzekî pir kêm new'ê beşer herc û merc dikin. Û 'alema îslamê ya mezin dikin bin esareta xwe.

# Ev Şer Ne Şerrê Kurda yê









✍ Mehmûd KILINÇ

Bi damezrandina Cumhuriyetê heta niha gelê Kurdê misluman bi gelek felaket û trajediyan re rû bi rû mane. Felaket û trajediyên bi damezrandina cumhuriyetê herî pir tesîr li gelê Kurd kiriye. Heta do dewleta Kemalist bi polîtîkayên înkar û îmha û asîmîlasyonê yên îdeolojiya resmî, zulm û neheqî li Kurdan dikir, lê mixabin ev serê çend sala ye, PKKê ev wezîfe ji destê dewletê girtiye û êdî ew zulmê li Kurdan dike.

Bûyera piştî cejna Remezanê li Pirsûsê dest pêkir, bû sebeb ku pêvajoya aştîyê biqede. Piştî hilbijartinan destpêkirina van bûyeran balkêş e. Lewra şerrê piştî hilbijartinan dest pêkir, dibe sedemeke bingehîn ku mirov pirsekî bike. Gelo van bûyeran çima niha dest pêkirin? Ji roja ewil de çi dewlet çi PKK di pêvajoya aştîyê de ku ev serê çend sala ye bi hevre didomînin ne semîmî bûn. Ji bo çareseriya pirsgirêkê, ji roja ewil de pêvajo li ser zemîneke sağlem dananîn. Tevlî Pirsgirêka Kurd, pirsgirêkên dîrokî yên hêlên wê yên siyasî, herêmî, olî, sosyolojîk û navnetewî hene. Mixabin dewletê ev hêlên pirsgirêkê nedît, yan jî nexwest bibîne. Guman kir ku wê pirsgirêka serê 100 salî ye bûye wek qangrenekê bi rêxistineke Marqsîst re safî bike. Gelê Kurd pir reng e, pir deng e, pir ol e, pir xwedî sazî û rêxistinên Îslamî û însanî ye. Dewletê ev dewlemendîya gelê kurdê misluman nedît, nexwest bibîne. Heta niha rêxistineke çekdar jibo çareserkirina pirsgirêkê mixatab kir. Ev gavaviteneke şaş bû. Ji ber vê saziyên civakî wek Cem'îyeta Mustez'efan, partiyên siyasî wek Huda Parê, ji roja pêvajoyê dest pêkir heta xirabû derbarê pêvajoyê de digotin: "Ji çareseriyê re erê; bes ji pêvajoyê re na! Pirsgirêka Kurd pêwist e çareser bibe, lê ne bi PKKê re. Lewra PKK û şaxên wê Kurdan temsil nakin, muxatebê vê pêvajoyê ne PKK ye. Heta pirsgirêk bi gelê Kurd re neyê axaf-

tin, hesasîyeta Kurdan neyê nîqaşkirin, sazîyên Kurdan tev neyên dawetkirin û muxateb neyên girtin, bi rastî ev pêvajo bi pêş de naçe, di hemî qonaxê de çareserî dê nîvco bimîne" Dewletê nexwest ev dengî hîs bike, PKKê nexwest ji xeyrî wê tu kesekî din li ser maseyê runê. Di Encamê de xuya bû ku herdu alî jî naveroka çareserîyê ji gel veşartine. Hem gel hem hevdu xapandin. Gele Kurdê misluman bi qedera wî re bi tenê hiştin.

Di nav PKKê de gelek aktore kûr hene. Gelek destên biqirêj PKKê di rêyên menfîetê de dixebitînin. Ev dest û aqtor nahêlin ku PKK çek û sîlehan deyne. Lewra jibo rêxistinên wek PKKê çek û sîleh sebebê hebûna wan e. Dema çek neteqin û siya tifengê li ser siyasetê kêm bibe, PKK jî û HDP jî diqede. Herwiha ev aktoren kûr di nav dewletê de jî hene û siyaseta dewletê diyar dikin. Her aktor xwedî armancên cuda ne. Mixabin di vê navberê de yê zirarê dibîne xelqê sivîl ê û ciwanên çekdar ên ku şer dikin, bi nêta Kurd û kûrdîstanê têne kuştin xwîna wan heder dibe.

Berpirsên PKKê wek Cemîl Bayik û Dûran Kalkan, di nivîs û daxûyaniyên xwe de berya bûyera Pirsûsê, 9 caran gotin "me pêvajoya aştîyê li cem xwe qedandiye" Rêxistinên bi PKKê ve girêdayî yên wek HDP/KCD/DBP(Partiya Herêmên Demokratîk) jî di vî warî de daxuyanî dan. Ev daxuyanî li gor hesabekî dikirin. PKKê guman dikir ku wê gelê Kurd wek hedîseyên 6-8 Cotmehê ya jibo Kobanê dîsa rabe ser piya. Bes hesabekî şaş kir, di texmînê xwe de xapiya. Hem dewletê nêta PKKê fêhm kir û hem jî gel bi wan ve ranebû. Wechê dewletê yî hişk derket pêşberî PKKê û şerr dest pêkir.

Piştî operasyonên dewletê yên bi ser Qendîlê ve û yên li hundirî Turkîyê, PKKê derbeke dijwar xwar û dev guhert. Daxuyanîya di heqê pêvajoyê de dabû ji bîr kir. Dewlet sûcdar kir û got em şerr naxwazin, em aştiyê dixwazin. PKK û HDP siyaseteke durrû didomînin. Gelê Kurd dixapînin. Bes êdî bi siyaseta durrû xelk nayê xapandin. Ji aliyekî ve zulm û heqaretê li gelê Kurd dikin, Kurdên sivîl didin kuştin. Rojê bi dehan wesayîtên Kurdan dişewitînin, bajar û navçeyên Kurdistanê ji gaza îsotê û bi barût bombe û mayinan wêran dikin. Ciwanên Kurd bo şerrekî bêarmanc didin kuştin û li ser xwîna wan siyaseteke qirrêj dimeşînin. Bi sedem van bûyeran ekonomîya herêmê bi carekî ve mexel hatiye. Esnaf dikanên xwe ji heftekê 2-3 rojan encax vedikin. Gelê Kurdê misluman, perîşan bûye. Û ji aliyekî din ve jî behsa yekîtî û azadiya Kurdan dikin. Kî çi bêje bila bêje; heta niha zirara herî mazin PKKê daye Kurdan. Rêxistina ku hem doza mafê Kurdan bike û hem jî zirarê bide Kurdan, ev rêxistin tu eleqê wê bi Kurda ve tuneye. PKK rêxistineke ku cesedê wê Kurd e bes mejîyê wê ne Kurd e.

Nexêr! Nexêr! PKK û şaxên wê dûr nêzîk tu eleqa wan bi Kurdan ve tuneye. Ji roja saz bûye heta niha, belkî yê herî zirar daye Kurdan, Kurd perîşan kirine û Kurdistan wêran kiriye, PKK û hevalbendên wê ne. Temamê Kurd dizanin ku PKK û serokê PKKê Ocalan, dewleteke Kurd naxwazin û li dijî avabûna dewleteke Kurd in. Ji ber vê yeke şerê ku armanca wî tune be, zirarê bide Kurda ne şerê Kurda ye. Di encamê de ez dixwazim bêjim, rastî tehl e û hewce ye ku hinek van rastiyên tehl bêjin. Mixabin bi giştî ev erka "xerab" li ser milên me ye. Çi dibe bila bibe, bedêla wê çiqas giran be jî dîrok, bi tevî PKK û taşeronên mîna wê û tifaqa rasterast binavgîn ya qirêj ya dagirkeran, teqez wê şahidiya serkeftina Kurdên misluman bike. Di nav guhartinên pêşerojê de dengê herî bilind dê dengê Îslamê û mislumanan be.

# LI DIJ AŞÎTIYÊ DU ASTENGÊN GIRÎNG (NIJADPERESTÎ Û TE'ESSUB)



✍ Mamoste Çebekçûrî

Temmamên hemd û sena û pesna, layiq û babetê wî Xwedayî ne ku 'alem bi temmamî ji tunebûnê anîye hebûnê û kiriye xizmetkarê însan. İnsan jî wek eşrefê mexlûqa pejirandiye û ji xwe re kiriye xelîfe da ku li ser rûkê erdê jê re 'ibadet bike û li gorî emr û nehyên wî bimeşe.

Selat û selam li ser pêxemberê axrê zeman û ehlê beyta wî û temmamê pêxember û şopvanên riya wî bit.

Bi rastî Îro hem 'alema İslamê hem jî 'alema însanîyetê bi qasî ava 'heyatê hewcdarê sempozyûmê wihareng in. Da ku pirsgirêkên xwe bi şêwr û mişêwrê çareser bikin.

Ji lew Em berya her tiştî sipasîya xwe ji îdarevanên zanîngeha Bîngolê re teqdîm dikin ku di mijarek wiha muhim de sempozyûmek navetewî li dar dixe.

Gelî xwendevanên bi qedr û qîmet! Herwekî ku hun jî dizanîn Xwedê Te'ala însan li ser nîjad û zar û ziman û rengên muxtelif xuliqandiye. 'Eql û îrade jî wek nî'metek bê hempa ji însan re bexş kiriye da ku însan bi 'eql û îrada xwe hev binasin û vê gerdûnê îmar bikin.

Lakîn sed heyf û mixabin ji roja ewil û ta niha nesla, însan ev wezîfa xwe bi awayekî kamil bikar neanîye. Mexluqê ku ji bo îmar û têkuzkirina 'alemê hatibû wezifedar kirin, ev 'alem bi xwîna

hemcinsê xwe herimand.

Di vi warî de digel kişkişa şeytan wek nexweşînek qedîm du xalên balkêşê din jî hene ku ji roja ewil û ta niha bûne sebebê helaket û felekata însan û însanîyetê. Ev nexweşînên qedîm jî te'essûb û nîjadperestî ne. Gelo nîjadperestî û te'essûb çine an jî dibê em di warê istilahê de van herdû peyva bi çi rengî fêm bikin.

Nîjadperestî: ew nexweşîne ku insan çi heq û çi niheq, çi baş û çi nebaş di her warî de xwe û nîjada xwe serdest û mafdar û ji herkesî çêtir di hesibîne.

Li gorî bawerîya me Muslumana bapîrê vê bawerîyê Şeytan bi xwe ye. Lewra li gorî beyana Qur'ana Mecîd: Dema ku Xwedê Te'ala însan xuliqand ji melaîketa xwest  ku jê re herin secdê. Melaîket tev çûn secdê lê Şeytan dijberîya vî emrî kir  û neçû secdê. Dema ku xwedê Te'ala sebebê dijberîya wî jê pirsî bi tabîra ayetê wî wiha got:

اَنَا خَيْرٌ مِنْهُ خَلَقْتَنِى مِنْ نَارٍ وَخَلَقْتَهُ مِنْ طِينٍ

Yani "ez ji wî çêtir û bixêrtir im. Lewra te min ji agir  xuliqand ew  ji axê." De ka werin em bêhnek li ser vê te'bîrê bifikirin. Gelo çi ferq dinavbeyna van peyvên nîjadperestî û van peyvan de heye:

Çêtirên dinyayê Tirk in.
Kurd ji herkesî çêtir in.
Yek Tirkek hemberî cîhanê ye.
'Ereb ji herkesî ewlatir in.
Qewmê hilbijartî cihû ne.... Hwd.
Ji bil Kurda dostê Kurda nîne
Ji hirçê post ji Kurda dost peyda nabe

Dîrok şahide ku nîjadpresetî di her demê de bûye sebebê felaket û helkata însanîyetê.

Digel vê heqîqetê ji bo ku em şaş neyên fêmkirin, lazime ku em di serî de bêjin. Em û dîne me em dijberî gelperwerîyê nînin. Lewra li gorî me gelperwerî û gelperestî du tiştên ji hev cûda ne. Gelperwerî tiştek fitrî ye. Lewra Dema ku Xwedê Te'ala Xulqa însan kiriye 'huba nêzmerivên wî bi awayek fitrî xistiye dilê wî.

Her wekî ku Bedî'uzzeman jî dibê 'eleqedarîya însan a bi gerdûnê re ji daîra wîya biçûk destpê dike û ber bi daîra fireh ve didome. Yanî însan ewil ji nefsa xwe, paşê ji mala xwe, paşê ji eqraba û û gundê xwe, paşê ji bajar û welatê xwe paşê jî ji gerdûnê re  'eleqedar e.

Ji lew mesûlîyeta însan a bi gerdûnê re ji nefsê dets pê dike û ber bi gerdûnê ve didome. Ji lew pêwiste ku însan ewil ji bo ıslaha nefsa xwe, paşê li a mala xwe paşê jî li a miletê xwe paşê jî ji ıslaha cîhanê cehd bike. Gelperwerî İnsan mecbûrî xizmeta gel dike. Ev jî tiştek fitrî û baş e. Ku însan di warê qencî û başîyê de hamberîya miletên dî bikin û bixwazin ku gelê wan di warê qencîyê de bibin serok û serdarê însanan. Divî warî de delîla me dû 'ya hezretî İbrahîm e:

رَبَّنَا وَاجْعَلْنَا مُسْلِمَيْنِ لَكَ وَمِنْ ذُرِّيَّتِنَا اُمَّةً مُسْلِمَةً لَكَ

Yanî ya rebbî! Tu me bigerînî ji wan muslumanên ku teslîmî emrê te bûne. Û ji nesla me jî zurrîyetek muslumanên ku teslîmî emrê te dibin peyda ke. Li gorî vê ayetê pêwiste ku her kes di warê qencîyê de ji bo pêşveçûna gellê xwe cehd û 'xeyret bike.

Ustad Bedî'uzzeman û gelek ûlemaên Îslamê ji vê heqîqetê wek xîreta mîllî û fikrê mîllîyeta musbet şîrove dikin. Di bin siya vê bawerîyê de û li gorî vê qaîdê duruste ku Kurd jî bixwazin ku gelê wan di warê qencîyê de bibe pêşîvan û serdarê însana.

Te'essub: Ew nexweşîne ku însan di her warî de bê delîl xwe mafdar dibîne. Ji bil zanîna xwe guh nade kesî. Bîr û bawerîya xwe wek heqîqeta mutleq dibîne û bi ser xwe re tu kesî nabîne. Ev bawerî jî hem bi delîlên 'eqlî hem jî bi delîlên neqlî tiştek çewt û şaş e.  Te'essub jî wek nîjadperestîyê nexweşînek qedîm e û di qada dîrokê de bûye sebebê gelek gengeşî û pevçûn û komkujîna.

Te‘essûp nexweşînek qedîm de em vê heqîqetê ji vê ayetê fêm dikin ku Xewdê Te‘ala ji zarê  hezretî Nûh wiha ferman dike:

وَإِنِّي كُلَّمَا دَعَوْتُهُمْ لِتَغْفِرَ لَهُمْ جَعَلُوا أَصَابِعَهُمْ فِي آذَانِهِمْ وَاسْتَغْشَوْا ثِيَابَهُمْ وَأَصَرُّوا وَاسْتَكْبَرُوا اسْتِكْبَارًا

( Ya Rebbî!) Bi rastî ji bo ku tu wan mexfîret bikî çi dema ku min ew (bi bal hîdayetê ve ) de’wet kirin. Wan tiliyên xwe xistin guhê xwe û xwe bi kincên xwe nixumandin û bi înadek li ser înadê (dijberîya heqîqetê kirin)

Ev ayet û gelek ayetên dî bi me didin zanîn ku te‘essub û nîjadperestî dû nexweşînên qedîm in. Lewra qelek qewm û miletan ji ber te‘essub û nîjadperestîya xwe dijberîya Pêy‘xembera kirine. Wek mînak ji ber ku hezretî Muhemmed bi neseba xwe ne ji beni İsraîl bû Yehûdîyan  bi înadek kor dijberîya wî dikirin.

Bi rastî ev mewzûbehs mewzûhsek duvdirêje ne mimkune ku em di navbera 15 deqîqa de îzah bikin. Bes wek nimûne emê li vir çend mînakan teqdîmê web bikin.

1- Di vî warî de mînaka herî balkêş ‘eqîbet û rewşa qewmê Cihû ya dîrokî ye. Lewra ji ber ku vî qewmî xwe wek efdeltirê qewma hesibandiye gelek cara hem bûne sebebê Felaketa xwe hem jî felaket anîne serê însanên dî. Gelek cara komkujîn li ser wan pêk hatiye û gelek cara jî wan komkujîn li ser xelkê pêk anîne. Çûne kê derê ew der tevlihevkirine milletê wan dera ji wan nerihetbûn e, en nîhayet Ewrûpaîyan ew anîne li Fîlistîn bi cîh kirine. Niha jî hem li Filistîn hem jî li deverên dî tevdanokî û nîjadperestîya xwe bi te‘ssub didomînin.

2- Di tarîxa İslamê de mînaka hezretî ‘Usman Minakek balkêş e. Ji ber ku mêla Hezretî ‘Usman li ser eqrebayên wî hebû wexta ku hezretî ‘Usman bû xelîfeyê çaremîn, digel nelayiqiya wan eqrebayên xwe ji Muslumanan re wek îdarevan neqand û di bin maîyeta xwe de musameheyek nîşanî wan da. Eqrebayên wî jî îcraatên nelirê pêkanîn. Ev rewş di nav muslumanan de bû wesîla fîtnekî herî dijwar. Di encamê de hem hezretî ‘Usman hat şehîdkirin hem jî pirêza vê fitnê ta niha dom kir. Buyera Elîm a Kerbelayê, Zulm û Zordarîya  Emewî û ‘Ebbasîyan, Şerê ‘Usman û Sefewîyan û gelek bûyerên dî bi serkanîya we dighên Îcaraatên Mu‘awî ye. Muawîye jî bi mêla eqrebatîyê ve ji teref hezretî ‘Usman ve hatiye muhafazekirin. û paşê jî bi darê zorê qaşo bûye xelîfe.  Digel İcaratên wî yê nebaş hezretî ‘Usman ew ji walîtîyê ezil nekiriye.

3- Fikrê nîjadperestî û te‘ssûba Olî di ‘alema xerbî de bûye sebebê şerrê sed sala. Yanî ewrapaîyan ji ber te‘ssûba olî u nîjadperestîyê sed sala bi hev re şer kirine. Bi milyonan însan hatine kuştin.  Di encamê de fêmkirine ku te‘sûb û nîjadperestî bikêrî wan nayê û dev jê berdane.

4- Di rojihilata navîn, nexasim di nav ‘ereban de fikra nîjadperestîyê di bin baskê Partîya Baas de bi sala domîya. Ev fikr bû sebebê selteneta dîktatorên  ‘Xedar Ê wek Seddam, Hafiz Esad û gelek kesên dî. Van dîktatorên nîjadperest bi navê nijadperestî hem dinya ji gelê xwe herimandin hem jî ew bi xwe çûn helakê.

5- Li welatê Tirkî damezrînêrên komara Cumhurîyetê piştî şerrê azadîyê Rejma Cumhurîyetê li ser xîmê nîjadperestîyê damezrandin. Bi zulmekî ‘ezîm ji bil kêmqewma gelên eslî yên Anadolê wek Tirk qebûl kirin. Ji bo ku herkesî bikin Tirk pirojeya asîmîlasyonê xistin dewrê. Awayê te’lîmê wergerandin. Li Kurdistanê ji bo serkeftina projeya asîmîlasyonê Bi

navê Yatili Bolge Okulları mekteb vekirin. Ji bil bikaranîna zimanê Tirkî Zimanên din qedexe kirin. Lê ev proje negehîşt mexseda xwe û bi paş ve teqîya. Bîl‘ekis bû sebebê peydabûna nîjadperestîyeke din.

Gelek qewma nexasim Qewmê Kurd ev siyaset nepejirand û dijberîya vê siyasetê kir. Ji lew bi hezara însan hatin qetilkirin. Gelek sirgûn pêk hatin. Gelek kes mecbûr man welatê xwe terk kirin çûn Sûrî, Lubnan û Ewrûpa. Bi deha serhildan li darketin.

Ev pirsgirêka ku îro bi navê pirsgirêka Kurd tê zanîn û bi deh hezaran mirî û bi milyonanan İnsanên jîndar îro mexdurê vê pirsgirêkêne serkanîya xwe ji vê polîtaqa ya Înkar û asîmîlasyona damezrînerên Cumhûrîyetê digre. Dibê ev rewş îdî biguhere da ku bi milyonan kesên dî nebin Qurbana vê sîyaseta nîjadperesta ‘xeyrî însanî.

6- Te‘essuba olî îro li ‘alema İslamê berdewam e. Encama wê jî li berçava ye. Lewra di ‘alema İslamê de hem li Iraq hem li sûrî hem jî li gelek deverên dî musluman li ser navê mezheb hevdû qetil dikin. Yek yê di tekfîr dike. Bi milyonan kes îro mexdûrê vê te‘ssubê ne. Gelek qetlî‘am ji ber vê te‘ssubê pêk tên. Wehşeta ku îro daîş û mîlîtanên şî’î li ser hev pêk tînîn ji vê te‘ssûbê re delîlek aşîkar e.

**ENCAM**

Nîjadperestî û te‘ssub du nexweşînên şeytanî yên qedîm in. Hem ‘alema İslamê, hem jî ‘alema İnsanîyetê gelek êşû elem ji ber vê nexweşînê kişandine. Lazime em xwe ji vê nexweşînê bi parêzin. Lazime em mêjîye xwe ji her fikrî re vekin û hê fikra qenc bi pejirînin. Lewra Rebbê me wiha ferman dike:

اَلَّذِينَ يَسْتَمِعُونَ الْقَوْلَ فَيَتَّبِعُونَ اَحْسَنَهُ

Yanî: Ew her ew kesin ku guhdarîya (hemî peyvan) dikin lê dibin peyrewê ya herî qenc.

Dîsa lazime em mêjîyê xwe ji fikra nîjadperestîyê bişon. Lewra pejirandina nesebî ne di dest me de ye. Bi temmamî ji îrada me dere. Xwedê Te‘ala xulqa kê di nav kîjan qewmî de kiribe ew bi neseba xwe ji wî qewmî ye. Ev ne mirov mezin dike ne jî biçûk dike. Ji lew pesinandina bi qewmîyetê fikreke li dijî ‘eql e. Lê di warê qencîyê de xizmetkarîya gel ji bo ferdê her gelî ferze. Ji xwe ferze ku herkes ji bo selamet û pêşdeçûna gelê xwe cehd û ğeyret bike.

Hem ji bo dîylox û aşîtî û selameta gelên Turkîye lazime dewlet û sazûmanên dewletê dev ji polîtîqayên xwe yê faşîzan berdin. İdî te’lîma bi zimanê zikmakî ferz e. Her gel herî kêm bi qasî Tirka mafdar e ku bi zimanê xwe ê zikmakî perwerde bibe. Dîsa herkes herî kêm bi qasî Tirka mafdar e ku mafê xwe yê nîjadî û însanî bikarbîne.

Lazime di sazûmanên Fermî de bikaranîna xizmetê li ser zimanê herêmî be. Ji ber vê pêwiste ku memurên sazûmanên fermî xwe bi ‘elimînin zimanê herêmî? Ev hem İslamî ye hem însanî.

İslamîye: Lewra hezretî Pêxember wezîfedarê xwe şandibe kê derê xwestîye ku bi ‘elime zimanê wê derê

İnsanîye: Lewra lazime yek bi ‘elime zimanê hezaran ne hezar bi ‘elimin zimanê yekî.

En nîhayet dermanê nexweşîna nîjadperestî û te‘essûbê geleperwerî û xwendin û zanîn û, dilgermî û sernermî biratî û diyaloğe. Çewa ku Bedî‘zzeman dibêje:

Xwendin xwendin xwendin. Desthevgirtin desthevgirtin desthevgirtin.

Xwedê Te‘ala me ji nexweşîna nîjadperestî û te‘ssubê bi parêze.

Bimînin di xêr û xweşîyê de. Em ji we re duadarin ji duayê we hêvîdarin

# GELLÊ KURD ŞIYAR BIBE



✍ Îbrahîm ÊLIHÎ

Bî Navê Xweda ê Mezîn u Dilovan

Bawermend pêwîste ku hema bî tenê nebêjin “me bawerî/îman anîye” u bi vê tenê bımînin. Péewiste ku bawermend, ji bo ku “bawerîya” wa bigîhîje serî u serkeftinekê bi destxın bî tevahî bi de vî karî.

Bawerî anîn, ma ne tesdîqkirina bi dil, gotına biz iman u nîşandana di pratîkê de ye. Bawerî anîn, bi va her sê situna lı pîya dimine. Din av va de jî a herî mıhim pratîke. Weka wî lingê pergelê ê sabit e ango pratîke; ‘esil e, ‘eyneye. Baweriya meriv bi qasî giranî u rastîya xwe, xwe di wê ‘eynê de di de nişandan. Ji ber vê, bawerîya meriv biqasi pratika merîve. Lewra şerî’et; li dervayê meriv dinêre. Bin ava merîv, bi tenê Xweda dîzane.

Kafir, biqasî ku dengê misilmana derdikeve u biqasî ku bawerîya xwe dî pratika xwe dw nîşandıdın dikevîne tîrse u wa giringdibînin. Heke ku misilman, bawerîya xwe bi qasê ku dixwaze di pratika xwe de bidin nişandan u denge xwe zede bilindbîkîn kafir jî lî gora vî dengî zede ditirsin. Lê ku xwedî bawereka ze’if bîn u dengê wa jî nîzîm derdîke ve be bêguman kafîr jî ji vî dengî natîrsîn. Lewra va ye îro em li Misrê li Bangladeşê vêya bi çavên xwe em dibînin. Li vande ra çi dixwazin, çawa dixwazin wisa dikin.

Hekke ku iro rm lı Kurdîstanê enejiya kafîra a rawestî/statîk diqelîbînîn a kinetîkê bÎ sedem tevgerên mîsîlmane Kurd u Kurdîstanîyê vê heremê ye. Kafîr van tevgera jî xwe re û jî pêşeroja xwe re taluke dibînin û dixwazin pêşiya van misilmana bigirin. Vê pêşigirtinê jî bi deste Kurdên sekuler, bi destê Kurdên Xwedê ne nas u Kurdên xayînê gele xwe didine kirin.

Misilman pêwîste k udi hemu hal u karî de pişta xwe bidine Perwerdekarê xwe. Ji alîkarîya wi bawerbin. Însanê ku dijî şerî’etê bin, dixwazî bila ji gelê meriv bin, ji ‘eşîra merıv bin an jî bav u bırayên meriv bin jî nikare yekî misilman u bawermend bi wan re hevaltîyê bike, nikare li pey wa hare u nikare din av çalakîyên wan de cî bigire u reşîtîya wa zede bike.

Hekke ku misilman nebin yek u pişta hev negirin, ji hevre nebin hêz u qewet bêguman hingê kafir ewê hê pirtir bi ser misilmana de werin. Îro roj meriv tu tiştî neke ı ji kafira bîtirse, bi vê tirsa xwe rabe xwe din av sefê kafira de bi de nişandan Xweda bi parêze îmana meriv dikeve talukê. Hema bi hindikayi ve dikare reşîtiya misilmana zêde bike ji bı vê dikare xwe li ba misilmana bide nişandan u din av sefê misilmana de cî bigire.

Hekke ku em bixwazin heq serdesti li kufrê bike, Xweda sedemên k udi herba heq u batil de heq serdest bibe van sedema jî alîgirê yekitiparês re daye xwuyanî kirin xweda dı Qurana Pîroz de wiha ferman kiriye:

**“Geli ên bawerî anîne! Heke hun ji Xweda bitirsin/xwe bi parêzin wê furqan/veqetandina navbera heq u batilê wê bi de we.” (Suretê Enfal:29)**

Heke pıştî ku eb însanên ji kulare partî u sazîyên wa ji bu Kurd u Kurdîstanê ye (!) di temamê tevger u gotînên xwede xwe didine aşîkar kirin ku neyarê Îslam u şerî’etê ne, hêjî me wa nasnekiribe, hêji me ji wa fa’m nekiribe, hêji ku em l pey wa diçin , hêji ku em dinav çaakîyên wa de cî digirin, hêjiku em ji bu wan dişuxilin…Bê guman evêya ewê bibe sedema ku em axîreta xwe hunda bikin. Pêwiste ku em qasek berî qasekî tobe bikin. Lewra ev însanê hayî ku bi zimanê xwe dibêjin em doza mafên Kurda dikn did rastî de neyarên Kurda ne u neyarê Îslaê u şeriêtene. Ê ku bawer neke bila hema pirtukeka b tenê a serokên wa bixweyne ewê wa nasbike. Bênamusîya ku ev şerê sed/du sed salîye ewrupa nikaribu dinav gelê Kurd de belav bike va bênamusa dinava çend salade belavkirin u vê bênamusîyê jî kirin tiştekî ji rêzê.

Xweda piştî ku vê xelata herî mezin –ku ew ji misilmantî, baweri u şerî’ete-kirîye nesîbe me gele Kurdê misilman, em rabin kumê rezîlîyê bikişînin sere xwe u li pey van bênamusa harin ma ji vê rezîlîyê mezintir rezîlîyeka di heye. Heke ku piştî hevqas bênamusîya wayî mezin u aşîkr hêji meriv rab eli pey van însana here bêguman meriv jî dibe şirîkê vê bênamusîy wa. Pêwîste ku berî kevir bser meriv de bibarin meriv hişê xwe bide sere xwe u tobe bike Xwe ji van însana dûr bike. Lewra imana meriv pêwiste ku nehêle meriv bi van însana re rabe u rûnê.

Em bi van însana bidin fêmkirin ku Îslam u şerî’et ji bu me xeta sore.Em ji weka bav u kalen xwe şeref u ‘ızzeta Îslamê li ser xwe bidin nişandan.

Em axireta xwe fedayî dinya xwe nakin. Hişê xwe bidine sere xwe, em şîyarbibin. Îdî bila tu kes bin navê Kurd u Kurdîstanîyê iman u Îslama me ji me nestîne, me ji din3e me dûr neke.

Gotına dawî;

Vaye em dîsa ketin demsala Payîzê. Dı 6-8 Cotmeha par de hevaldozên me yî ku bi deste xayînê Kurdîstanê hatin şehidkirin em careka dî dıbira xwe tînin. Ew ji civaka me re bune guvahînêr. Ez, pakrewanîya wa u a temamê şehîdê salê 80’yi 90’yi u 2000’a u ên pey 2000’a pîroz dikim. Xweda pakrewanîya wa qebul bike. Xweda tu carî vê daxwazê ji dile me yekîtîparêza dernexe. Vê miraza me teva bîne cî. Em ji bu temamê tuxubboran u tuxubnenas u bêbalberîyên li ‘erdnigarîya Kurdîstanê de dijin re jî dibêjin; “Biji Dojeh”.

Bimînin di xêr u xweşîyê de. We dispêrim Xweda ê mezin u dilovan.



# ŞEHÎD AYTAÇ





Li welatê Kurdistan
Xayîn û xaçperestan
Kemîn danîne li ber we
Ey şehîd Aytaç bira

Xayinên Kurdistanê
Li dij ehlê îmanê
Dagirtîne jî kînê
Ey şehîd Aytaç bira

Li Amedê hîzba Şeytan
Danîn kemînek giran
Tu bûy şehîdê Qur‘an
Ey şehîd Aytaç bira

Tu şehîdê Qur‘anî
Ferdek hîzba rehmanî
Fir da l-cennetê danî
Ey şehîd Aytaç bira

Xebat û xweydana we
Her dilopek xwîna we
Wê bi fetsîn neyarê we
Ey şehîd Aytaç bira

Ey bira can şehadet
Li herdû dinya bi
se‘adet
Pîroz li te ji ba e‘hed
Ey şehîd Aytaç bira

Me soz û ‘ehd û peyman
Daye d-bey‘êta ridwan
Mê dujmin bikin Qurban
Ey şehîd Aytaç bira

Bi qurban bin neyar tev
Roj li wan wê bib e şev
Lew mu’mîn civîn li hev
Ey şehîd Aytaç bira

Kelhaamed



# Îro Sikûtkirin Sibê Zillet e

Şerîf EMÎN

Çerxa dunyayê, ehwalê dewlet û milletê musulmanan ji hêla silametîyê zêdetir ber bi rexê fitne û fesadîyê ve diçe. Temamê teşkîlatên cîhanê, behsa qencî û medenîyetê dikin, lê belê xebata wan ji xirabî û cehaletê re xizmet dike. Her wekî Ewrûpa, wekî Koma Milletan û Emrîqa. Kesên ehlê îman û însafê, ehlê Xweda, ehlê îlmê; roja giran, roja fitne û fetretê -ku ew roja jî îro ye- dengê wan qet nayê. Roja xebatên bi mêranî û îmanê, em gerek yeqîn bizanibin ku îro ye. Îro sikûtkirin sibê zîllet e, bindestî ye, hakimîyeta kufr û zulmê ye; hem wellahî û hem billahî!

Bo musulmanan, bo temamê kesên bindestên dunyayê, rewş çawa ye, em di Hedîsa Şerîf de binêrin. Serwerê Kaînat Xatemul Enbîya, Rehberê Herdu Dunya, Ronahîya Çavan Dermanê Kul û Derdan Hz. Ehmed Muhemmed Mustefa -ku ruh û canê me ji Wî re fida- ferman kirîye:

"Bo insanan zemaneke wisa tê; DEREW, tesdîq dibin; gotinên RAST, têne derewkirin, inkarkirin; bi kesên xaîn BAWERÎ tê kirin, kesên EMÎN jî xaîn tên zanîn; a wê wextê -her kes sikût dike- RUWEYBÎDA qezî dike!

Eshab dipirse: Ya Ronîya Çawan, RUWEYBÎDA çîye?

Rehberê Dareyn got: Ew, di der heqê "iş û karên millet yên MUHÎM u MEZİN de (daîm) qezî=gotin dike lê belê kesê SEFÎH e!"

Sefîh kî ye? Kesê ehmeq, ê cahil, musrîf, ji bo hubba cah xwe fîda dike. Sefih xwedîyê ihtiraseke pir mezin e. Navê wî yê dî jî meriv dikare bêje ehlê dunya.

Roja ku Peyxemberê me xeber daye, heqîqeta hal îro ye. Em bi çavên heqîqetê, qasi teqet û zanîna xwe binêren.

Em bi çavên xwe dibînin: Feryad û qêrîn ên kesê bindest, xasseten jî yên musulmana ye. Kufr û zulma dunyayê, sedema derd û kulên bindestan in. Muesseseyên Cîhanî jî temamî ji emperyalîzmê re, ji ehlê xaç û seneman re xizmet dikin. Yekîtîya Ewrûpayê, Koma Milletan(BM), Devletên Yekbûyî yên Emrîqayê, NATO; bi talankirina erdê musulmana ketinin û ji qîrîna belengazan re kerr û lal in.

Dunya xaç û senem; her çi wext agirek bikeve mala musulman û mustezefên rûyê erdê, destên van zaliman ne "av"ê "benzîn" digre. Bi gotina Xwedayê 'alem; "Çavê wan heqîqetê xweş dibîne lê belê kor e, zimanê wan heye lê belê lal e, guhên wan henin lê belê kerr in!" Nîyeta wan kafir û xwînmijan,

temamî ji bo kesba heram, bo kuştina insanên bêkes, bo dek û dolavan e. Heqîqet, ji wan kesan merhemetxwestin, qebahateke giran û zîlleteke mezin e.

Em gerek îtîraf bikin; milletên musulman, bo îcrakirina "heqq û hiquqên xwe yên qanûnî, iro roj di parsê da ne. Li ser milkê musulmanan ekser zalim û zordar hakim in. Ev zordar jî encax li hember gelê xwe yê bêçare otorîter in. Mêranî û qurrebûna wan li hember ehlê xaç û seneman tunneye û tuccar jî nebûye. Ji ber vê yekê muslumanên meğdûr, her daîm, jibo qezenckirina hiqûqên xwe, ekser îltîcayê Ewrûpa kirine. Ew îltîcakirin, "jibo çareserîya tesetturê, jibo starbûnê, jibo qezenca dunyê hvd" daîm bûye. Ev tiştên hanê; parsektî, 'eyb û şerm be jî, heqîqet ev e lê belê ev; jibo millet MECBÛRÎYET, jibo dewletê 'eyb û şerm û ZILLET e.

Rojava Dunyayê; sebeba jiyana dewletan, çareserîya pirsgîrekan û xizmeta gell e. Rojhilata dunyayê, dîmen temamî cihê ye, ne wisan e. Dem û dewra dunyayê; jibo me (şerq) û ğerbê yek e lê belê, ehwalê millet, mua'mela dewletan ji bo gelekî nîne.

Di halê HIQÛQê de 'ESR; jibo Ewrûpa 20, lê bele jibo musulmanan 19 ye, yanê sed sal ferq heye.

Serok û rêzanê xelqê Musulmanan; jîyana xwe, li ser zulm û zorê bîna kirine. Karê wan serokan; xapandina 'ewam, dizî û talankirina milk e. Jibo ku zarokên me şîyar nebin; 'enwa'ê çeşît mani' û zehmetî derdixînin. Hakimiyeta wan Xwedê nenasan; li ser tirsandina gel, heps û zîndanan ava bûye.

Qanunên me(!), temamî yên Ewrûpî ne, lê belê qanûnên li ğerbê, dibin sebeba asayîşê, sebeba aşîtîya millet û dewletê. 'Eynî qanûnên esrî(!), jibo me sebeba talanbûna milk, qeyd û bendkirina masûman e. Pişta wesayeta li ser erdê mustez'efan, ji gelê xwe zêdetir, xwe daye emperyalîstan, Emrîqa, Ewrûpa hetta Îsraîlê. Ew, bi milletên xwe yên masûm re nînin, bi kafir û zaliman qaîm in. Xweda hafiz.

Gotinên ku me jibo Musulmanan gotine, tê de xîlaf tuneye, temamî bûyerên zindî û heqîqet in.

Madem halê me MUSTEZ'EFAN ev e, wê çaxê wezîfa zanayên gel çiye? Gelo kesê xwendevan, ên şîyar û îlimdar jibo bindestan DEYNDARê çine?Em temamî deyndarê milletê xwe ne. Ev deyn deynê bi sed salan, belki hezar salan e. Paqijkirina hêsrên çavên dayik û bavan, deynê me ye. Mamûrbûna îstîqbala ciwanan, îzah û tefsîra zulm u zordaran yeqîn deynê meye; deynê stuyê zanayên vî milletê ye!

DENGê BELENGAZAN xweş tê guhê me; ger em kerr û lal nebin, ev dengê mezlûman ji gelek "kûr û dûr tê" lê belê bi sewtek bilind tê. "Çûyîn û neçûyîna di hewara wê dengê bêguneh de" ROJA MEHŞERê, ROJA MÎZANê elbet ji me tê sûalkirin.

Em li hember YEZÎDAN HUSEYNÎ NE! Heqîqet jî em HUSEYNÎ ne.

Huseyn îbn-î 'Elî jibo çi çû KERBELAYê?

Kerbela cîyê QIYAMê, erda zulm u zorê; ehlê bêbextîyê, îrtîdadê, rîc'etê ye Kerbela.

Em jî dibêjin; "Kullû erdîn KERBELA Kullû yewmîn 'AŞÛRA!" Îro jibo temamê mustez'efên rûyê erde jî "Her der KERBELA, her roj AŞÛRA ye!"

Talîbbûna nasnameya HUSEYN; îstîfakirina ji dunyayê, îltîcakirina Cennetê ye.

Îstîfakirina ji dunyayê; tucar ji bo zaliman terkkirina hakimîyeta dunyayê nîne! Em; hem talibê Cennetê hem jî jibo Xwedayê 'Alem talibê hakîmîyeta dunyayê ne; temamê koledar, zordar vî tiştî xweş dizanin!

EM DIZANIN Û DIBÊJIN:

Kesê ku "îxtîlaf û ze'fên însanan" baş dizanin, ew zanayê însana nin.(Î. Ğezalî)

1- Em dizanin û dibînin ku îro sikûtkirin sibe zillet e, hem dibêjin;

2- Qanûnên li ser musulmanan, qanûnên kufr û zulmê ne.

3- Ekser lîder, îdarecî, rêber, serok û hikûmetên li ser musulmanan bendeyê xaç û seneman, girêdayîyê bi Frengistan ve ne.

4- Li ser erda musulmanan gelek kes, hevalê zaliman, YARê kafiran; NEYARê musulmanan in.

5- Ji ber vê yekê jî xelkê musulman, mustez'ef û bêçare, azad nînin, esîr in.

6- 'Alim û zanayên me, piştî SEÎ'DEYNa

(Ustad Seî'dê Nûrsî û Şêx Seî'dê Palevî) wezîfa xwe li ser heqiqetê îcra nekirine; gelek zêde deyndarê millet in; tuccar me'zur nînin.

7- KURD û KURDISTAN: Meğdûrê ewladê xwe û YETÎMÊ ummetê!

a- Zimanê Kurdî (Kurmanc, zaza, soran, goran, hvd); kevneşopî, tore, 'urf û 'adet û temamê folklora Kurdî; bi "HÎMMETA şêx, mela, seyda û medresan" hatine holê, bi sed salan hate îro roj hatine parastin. Bo vê yekê jî Kurdistan her daim musulman bû, dîndar bû, ehlê şerîe'tê bû.

b- Piştî Seî'deyna; musulmanan Kurdistan gelek îhmal kir.

c- Piştî vê îhmalê; Kurd û Kurdistan bê serî û bê rehber ma, lê belê te'dîb, tenqîl, zulm û zordestiya li ser milletê Kurd, piştî Seî'deyna neqedîya, bil'ekîs zêde zêde dewam kir.

d- Milletê me bi tevî derd û halê xwe, bê hewar û bê pergal; çavê wan li rîya 'alim û mêr û mêrxasan mabû. Kesek di hewara wan de neçû. Dengê Kurdistanê yê li ser "komkujî û tehcîr"ê DENGBÊJAN û dayikan bi lorîn û helbestan neqişandibû, me ew dengî jî bi layiqî nebihîst û behsa van heqîqetan zêde nekir. Dengê HEQÎQETÊ:

**"Şêxêm qurban meçe Dîyarbekra şewtî ha bi coye/ Îro ŞÊXAN TÎNIN BER ÎDAMÊ zo bi zoye"

**Destê min kelepçan de, lingê min qeydan de rizyane Xalo! /HEWARE XALO, ez girtî me li ĞERÎBÎYÊ!!"

**Li Dêrsimê li Koçgîrî / Teva kuştin jin û mêrî

**Ma HELEPÇE hindik e? Fermane fermane..!..hvd.

e- Birayên me yên Turk; biratî, ummet û tewhida Îslamî tev ji bo qaîmbûna Cimhurîyetê yan jî ji bo tiştên teferrûatê hesibandin. Hesabên dirêj nîne yên kin anîn holê. Ew jî jibo ku hesabên rastî nebûn, ji Bexdayê zîvirîn, temamî betal bûn.

f- Muhafezakar û Muwahhîdên Kurd, hem kêm bûn hem jî ummet û tewhîda ku behs dikirin, haşa pêxember ('e.s) behseke wisa nekiribû. Haşa ji pêxember zêdetir(!) ehlê ummetê bûn.

g- Gel, îhmal bû; derd û birînên wan, di halê ewladê wan de nehat dîtin, lê belê PIRSGIRÊKA KURD mîna goga berfê ji çiya hate xwarê û her roj mezin bû.

h- Piştî ŞOREŞA QOMONÎST(1917), wekî her derê dunyayêli Tirkîyeyê jî têkoşîna "rast û çepan.." peyda bû.

i- Di wê serdeme de, li Kurdistanê têkoşîna musulmanan hebû, lê belê di wê têkoşînê de nawê Kurd û Kurdistanê, heqq û hiqûqên ku paymal bûne, behsa van tiştan zêde tunebû.

j- Hola têkoşîna hiqûqê Kurdan, di halê musulmanan de gelek vala bû.

k- A hola ku musulmanan vala hiştîye, piştî 1980ê ekser qomonîst û sosyalîstan û kesên modern tije kir. Bi vê behsê zimanek nû, qadroyek xwedênenas ava kirin. Xwelî li serê millet û musulmanan bû!

DERMAN: Îro roj, kesên têkoşîna doza musulmanîyê dikin, gerek zahf qezî bikin, pir bişuğulin, bi deng û xebatek gelek bilind werin meydanê. Roj; roja îmanê, roja musulmanan, roja musulman û mucahîdan e, lê belê li ser heqq û heqîqetê, însaf û îzanê.

Firqeyên dujmintî û neyarî digerînin; tehemmulnekirin tucar kare îzanê û îmanê nîne! Dujmintî nîne lê belê xebat ferz e. NEYARÊ ME; benî adem nîne, cehl û kufra herêm e!

Nasnameya Kurd u Kurdistanê îro roj bi destê 'evdê tirş, 'evdê pûl û peran diçe KUFRê; teslîmî zulmê dibe. Li hember vê delaletê neşuxulîn zillet e, sikûtkirin teresî ye, nedîtin û nebihîstin jî kûr û lalbûne. Xwedayê 'Alemê, me ji vê ğefleta hanê şiyar bike, ji HELAKETA dunya u axîretê jî muhefeze bike.

Heger ev milletê bê çare û belengaz di vê DEWRA FETRETê de dengê musulmanan nebihîse; em sibe di roja MEHŞERê de nikarin vî hesabî bidin. Musulman, bi DERMANê QUR'ANê ewil derdên Kurdistanê, dûre jî yên Ummetê gerek derman bikin.

"Wel Fecr..!" Dengê TEKBÎRAN wa tê guhê min!

Xweda heye ğem tunneye! Xweda yar be 'alem neyar be! Dua û silavên qelbî.

# DÎROK BI WE XEMILIYE

✍ Seyîdê Memolan

Dîrok ronahîye, şewq û şu'le dide şevên tarî. Bûyerên dîrokî, nîşan û peyvên dîrokî, roniya îstîqbalê ne, dîtin û bingeha paşerojê ne. Dîrok çavkanîye. Dem û wext mîna av û xwînê diherike ji vê çavkaniya dîrokê. Lewma jiyan û cîhanşîn û hêşîn dibin bi ava dîrokê, gewde û hebûn bi can dibin, candar dibin bi xwîna dîrokê. Dîrok, carinan deng û banga ketiya ye, carinan dara xweziya ye. Car caran tovên reşandinê ye ji simbil û fîdana re. Dîrok hin caran dibe kumla mezlûman li hember zaliman. Car car dibe mizgîna belengazan. Û car carjî dibe qisseke 'îbretê, dîwaneke hîkmetê, baraneke rehmetê. Bêgûman dîroka rast, tu caran ne dûre ku em kevinbibînin. Û ne hûre ku em rûmetê nedinê. Dîrok her wextî werîsê warisaye, ji bonî xelasiyê, jibonî xweşiyê.

Di her dem û wextî de ji bonî fêda însanan, tiştên qenc û xerab hene. Her tim jî bi ser sebebên wan, an du'a û mukafatê qezenc dikin, an jî nifir û cefa û ceza dibînin. Ji bonî vê yekê, insanên di nav civakê de, yên ji însanan ra dibi nalîkar, qenciyê bi wan dikin, her tim dildarin di nav derdora xwe de, ewan xêrxwaz her çax dilşad û bextewarin. Merivê di ferqiya van encamên xweş de be û kesê xwey îman be, hay ji heram û helalan hebe, me'lûm e ku hê bêtir dibe xwedî rûmet û hurmetan, xweyqedr û qîmetan. Aha weke vê heqîqetê, muminên xwedyê îmana xurt, misilmanên dûrî zîllet, yên jibonî Xweda werin cem hevdû, mîna bira bin li hember hev bi rehmet, li hember zaliman şedîd bin, hingê ev rewşa van merivan, dibe nûrun 'ela nûr.

Ez dixwazim piştî vê

gotinê, hindik jî be bibim dengê wanên ku rewşawan nûra li ser nûrê ye, roja Îslamê lı ser wan dihilide, rengê wan rengê Xweda ye, werisê wan werisê Xwedayê Rehman e. De binêrin û bifikirin kurewşa wan weha be, rêber û rêzanê wan Pêxember be, ce'da wan cîhad û xizmeta Îslamê be, tevger û qanûna wan li gorî Qur'an be, ğaye û armanca wan riza Xweda, Îslamiyet û şehadet be ku can û heyata xwe kiribin qurban, marûzî sirgûn û zindan û kuştinê bûbin, ma qey dîrok ji wan re ne mizgîn e? Ma qey tağût û zulm û kufir li ber vê hêzê karin xwe bigrin, zalim û zordar qey dikarin vê xumînê bisekinînin? Dîwar û xanî, hêwan û stad ma dikarin vê 'eşqa pêxember zevtbikin, betalbikin?

Bi îzna Xweda şoreşkerên azadîyên Îslamê derketine meydanan, xizmetkarên Qur'anê xuya dibin li beledan. Meydan û ce'da, bi dengê tekbîr û selawatan dixemilînin, dihejînin. Bi îzna Xweda, ev ronî û ev tevgera ku eşkere bûye, azadiya meazlûma ye, xelasiya bulbulên Qur'anê ye, bidawîbûna girîn û feryada mustez'efa ye.

Bi îzna Xweda misilman di cehd û xizmeta Îslamê de ne. Dengê azadiya rast, hizûr û aştiya rast, siyaseta rast, tîcaret û 'edaleta rast tê guhêmin. Banga Eshabê kehf, Ebûzerê Ğifarî, banga şêx Se'îdê Palewî, şehîd û rêzanên 'esrabîstan tê guhêmin. Neviyên Selaheddîn, vaye dîsa bi sebat û xebatin. Va ye dîsa peyrewên Ciziri û Teyran coş dibin tevlî cezb û mestê. Te'qîbkerên Xanî û Nursî, dîsa neyar û hişyarin li hember fikr û hizrên xerab, lihember neteweperesta kêmaqil û ehmeq bi izn û înayeta Xwedayê Hekîm û 'Alî.

Û ez xwe dixemlînim bi teslîmiyeta Îbrahîmê Xelîlê Xweda, bi 'îffeta Meryema ayeta Xweda. Bi exlaqê Hebibê Xweda, evîndarê dilan, umîda her çaxan, xweşmîsala ji bo her şexsan Hz. Muhemmed (s.x.l). Û ez jîdibêjim, bang dikim:

Bisekinin gelî mezlûmên ku heqên wan ji wan hatine stendin! Ey mustez'efên ku dengê wan hatibû girtin! Ey kesên dibin jiyan û zihniyeta Ewrûpayê de şerpeze û perîşanbûne! Vayê evîndarên pêxember, 'aşiqên Mûhemmed tên, di her aliyên cihanê de. Ey evîndar û aşiq û dildayên pêxember! Ey ên dînê wan ji wan re hiqûq, miqedesata wan jiwan re namûs, nixumandına wan ji wan re azadî, îffeta wan ji wan re xemilandın, ey jinên Zeynebî! Ey şehîdên de'wa Îslamê! Xwîna we ji me re bûye gulîstan, xebata we ji me re bûye ji yan, dîroka we ji me re bûye mizgîn, bûye dibistan.

Ey ên di hicret û zindanan de! Hûn nîv şehîd in, hem xwêdan û berxwedana we, weke xwîna şehidan li me tesîr dike. Û hem jî îman û jiyana we, 'ezm û sebata me tûj dike, nû dike, dilême geş dike û imana me yeqîn û qewî dike bi îzna Xweda. Ey mumin û dost û şehîdên rêya Xweda! Dîrok we ji bîr nake, dîrok bê we naxemile, di dîrokê de we destan nivîsandiye.

Ez hêvîdarê duayên we me ku hûn ji hemû misilmanên cîhanê re di'abikin, nexasim ji yên ku haya wan ji Îslamê tune re û ji yên ku ji bonî haya wan ji Îslam û Qur'anê heye û ji lew ketine zindanan, mal û warê wan hatiye xerakirin û talankirin re.

Hûn tev emanetî Xweda bin.

# Baba Tahirê Hemedanî

## Pîrê Tesewûfê yê Kurd, Stêrkek Ji Gulîstana Kurdistanê



*Dilêm ji derdê te herdem xemîn e*
*Balîfêm kevir, doşekem zemîn e*
*Sûcêm ev e ku min ji te hez kirye*
*Ma her ê te hez dike dil bi xwîn e*

✍ Fatîh AKMAN

Kesên pêşeroja xwe nizanibin, kesên ji rêber û rênasên xwe, ji şêx û alimên xwe ne hayîdar bin, paşeroja xwe wenda dikin. Ji ber vê heqîqetê û ji bona ku em rê û şopa wan bişopînin, divê em rêzanên xwe zanibin û wan nas bikin.

Baba Tahîrê Uryan yek ji wan rêber û rêzana ye ku hewce ye em wî nas bikin. Li gorî zanînê ku di destê mê de hene, ka em binêrin bê Baba Tahirê Uryan kî ye? Baba Tahirê Uryan, bi navekî din Baba Tahirê Hemedanî ye. Gelek agahdariyên li ser jiyana Baba Tahir, negihiştine destê me û em bi zelalî nizanin ku bajarê lê welidiye kîjane. Dîsa divê em zanibin ku agahîyên derheqê dema jidayîkbûna wî de jî ne zelal in. Guman dibe weku ji paşnavê wî jî tê fêmê û li gor agahîyan, di sala 944an de (yanî di dawîya sed sala 10. de) li Hemedana Kurdistana Rojhilat hatîye dinyê.

Baba Tahir, hozan, helbestvan, alim, zana û dewrêşek kurd e. Mexlesa wî Baba Tahirê Uryan, di wateya Baba Tahirê Xwas de ye. Ê ku yekemîn paşnavê "uryan" bikar anîye, Baba Tahir e. Lewra berî Baba Tahirê ku paşnavê "uryan" bikar anî ye, nayê zanîn. Piştî Baba Tahir, şêxên Qelenderîyan "uryan" bikar anî ne. Çîrokeke vê paşnavê wî "uryan" jî heye. Li gor tê gotin, Baba Tahir ji biçukanî de bi tehsîla 'ilmê ketiye, belê perwerdeyîya xwe her tim kêm didî, ji ber wê rojekê ji feqên medresa Hemedanê dipirse **"ji bo mirov 'ilmê hîn bibe çi hewce ye?"**

Feqî henekê xwe pê dikin û jêr dibên "hewce ye ku tu şeveke zivîstanê di nav hawizeke ava qeşa de derbas bike" Baba Tahir, şîreta feqîyan tîne cî. Wexta roja dîtir sibê hişyar dibe, bi îzna Xweda bi nûra 'ilmê xwe ronî dibîne û dibê **"kurd razam, 'ereb hişyar bûm"** Belkî mirov dikare vê gotinê wilo bixwîne, ji ber 'erebî zimanê Qur'ana pîroz e, deryê 'ilmê Îslamî ye jî. Bi hişyarbûnê bi izna Xweda ji ber deryê 'ilmên Îslamî lê vebûye gotîye "kurd razam, 'ereb hişyar bûm".

Li gor gotineke din, Baba Tahir piştî vê xeberdanê fêm dike ku henek pê hatîye kirin, dilê wî dimîne, pê diêşê û mehzûn dibe. Ew halê wî bi izna Xweda diqelibe 'ilm û zanînê. Piştî vê bûyerê gelek keramet, li dor Baba Tahir hatine dîtin. Ji ber wê ve gelek mirov jibo ji Baba Tahir îstîfade bikin û dua wî bistînin, çûnin civata wî.

Sabah Kara di pirtûka xwe ya "Dubeytî Baba Tahirê Hemedanî" da dibê, Rawendî jî di pirtûka xwe ya Rahetu's-Sudûr de wiha behsa Baba Tahir dike: "Min bihîst, dema ku Siltan Tuğrûl Beg (990-1063) hat Hemedanê, ji ewlîya sê pîr

hebûn; Baba Tahir û Baba Ce'fer û Şêx Hemşad hatibûn li ber deriyê bajêr sekinîbûn. Çavê Sultan bi wan ket. Ji hespê xwe daket û bi wezîrê xwe Ebû Nesr el-Kunderî ra hat cem wan û destê wan ramîsand. Baba Tahir bi mihrîbanî jê re got: **"Ey Turk, tuyê bi xelkê Xwedê çi bikî?"**

Sultan got: "Tu çi ferman bikî; ew!" Baba got: "Wê bike ku Xwedê ferman dike; ayet: Xwedê bi edalet û qencîyê emir dike" Sultan girîya û got: "Ezê wilo bikim."

Baba bi destê wî girt û got: "Te ji min qebul kir?" Got: "Erê" Baba serê misîna xwe ya şikestî ku bi salan pê desmêj girtibû, (yan jî hungulîska di tilîya xwe de) ji tilîya xwe derxist û kire tilîya Sultan û got: "Min memleketê alemê, bi vî şiklî da destê te; 'adil be." (li gor tê zanîn ev sefera Tuğrûl Beg di sala 1055an yan jî 1058an de pêk hatîye) Gelek dîrokvanên Tirk û mislimanên din behsa vê sefera Tuğrûl Beg dikin ku Tuğrûl Beg serê wê misînê (yan jî hungulîskê) xisûsen di herban de dixist tîlya xwe.

Baba Tahir bi salan li Hemedanê jîyana xwe derbas kirye û di serê sedsala 11. de li wir çûye ber rehma Xweda. Qebra wî, di Meydana Baba Tahir de li bakûrê bajarê Hemedan e.

**Têkilya Baba Tahir bi Tesawûfê ra**

Baba Tahir, mirov dikare bêje ku sofîyê yekemîn e. Jîyaneke bi dewrêştî derbas kirye. Ehlê zuhd û teqwayê bû. Ew û dinya ji hev ğeyîdî bûn; dinya û tiştên dinyayê ji xwe berda bûn bi sê telaqan. Evîndarekî pêğember bû. Di derenca tesewufê da pir bi pêş ketîbû. Fenabûna di Xweda de, hebûna ji bo Xweda yanî "fena fîllah" wek deryê xelasîya ji êş û kederan ji xwe re dîtibû.

Baba Tahir ji Umer Heyyam heta Mevlana, ji Hecî Bektaş heta Yûnis Emre, Pîr Sultan 'Ebdal, Kaygisiz 'Ebdal, ji Cizîrî heta Xanî ji gelek 'alim, zanyar, şêx, feylesof û helbestvana ra bûye bingeh û çavkanî. Ji lew mirov dikare bêje, Baba Tahir yekemin mutesewifê Kurd e. Mijarê helbestên wî jî tesewuf e. Ji bo agahî ne zelal in, kesên çepgir û komonîst dixwazin Baba Tahir, bi bawêrîya xwe ra tekildar bikin, bila bê zanîn ku Baba Tahir ne Şêxê Qelender e, ne yarîsanî ye, tiştê qet'î misilmanekî xweşik, evîndarekî Muhammedî ye.

Ji xwe di çarîna "Ey Xweda hewarê dilê min bibihîs/Kesê bêkesa tu yî ez mame bêkes

Hemî dibêjin kesê Tahir nîn e/ Xwedê yarê min e, çi hacet bi kes" û di "Bure, Bure kî cananem tu yî tu/Bure, Bure kî sultanem tu yî tu

Te xud zanî kî xeyr ez tu ne zanem/Bure, Bure kî îmanem tu yî tu" (bi lorî) bawerî, hevaltî û hêla xwe eyan kir ye.

Di ğezeleke xwe de jî, bi kutna "Ez ew tahir im ku ji muhemmed re/Ji noker û xulaman xulamtir im" evîna xwe ya Muhammedî îlan kirye.

Dîsa, ev çarîna "Her ew ku aşiq e ji can natirse/Aşiq ji zencîr û zîndan natirse

Dilê aşiq weke gurê birçî ye/Ku ew ji heyheya şivan natirse" jî bi me dide zanîn, bê çewa dil û jîyan, evina xwe di nav hev de hûnandîye.

**Pirtûkên wî**

Berî behsa pirtûkan bikim, divê em bêjin, Baba Tahir bingeha Edebiyata Kurd û Farisa ye. Lewra niqaş li ser heye ku Kurd jî Faris jî Baba Tahir bingeha xwe dibînin. Belê ji ber ku zaravayê lorî, zaravayê Kurdî ye û ji ber gotina wî ya "ez kurd razam, 'ereb hişyar bûm" mirov dikare bêje, kesê çavê xwe ji rastîyê re veke, rastî li ber çava ye. Bila ev li vir bimîne, em herin behsa pirtûkan.

Li gor tê zanîn ji pirtûkên wî yên namdar dîwana wî ye. Di 'ilmên zahir de çiqas ku 'alim bû jî; namdarîya Baba Tahir, ji ber ku pîrê çarîna ye, ji helbestvaniya wî tê. Helbestên xwe bi ruhekî 'irfanî, bi dubeytên bandorî û bêtir bi zaravayê Lorî ava kirye.

Dîwana wî ya ku Edvard Fitzgerald di sala 1880î da 260 çarînan li hev kom dike, bi navê "Dîwana Baba Tahir" pêşî li Tehranê paşî li Stenbolê hatîye weşandin.

Pirtûka wî ya duyemîn "Kelîmatu'l-Qisar"e. Mijarên exlaq û tesewufê bi gotinên wecîz bi zimanê 'erebî hatîne nivîsandîn. Ji 23 beşan tê holê. Bi 'erebî û farisî gelek şerhê wê hatine kirin. Mesela "nezanîn kêmasiyek e, nehînbûn kêmasiyeke dubare ye" gotinek ji vê pirtukê ye.

Gotina dawî heger îro em rêber, rênas, şêx, 'alim, helbestvan û peşîvanên xwe nas nekin, kesên bê ol, bê dîn, neyarên Xweda û Quranê, wê wan ji bo xwestekên xwe yên gemar bi kar bînin. Li gor fikir, raman û îdeolojîyên xwe yên xerab, ewê wan şîrove û şerh bikin.

Xweda me ji xwe, doz û de'wa xwe dur neke.
Wesselam.



Dı Dewra 'Usmaniyan Û Sefewıyan De

# Mîrektî û Begtiyên Kurdan -2

✍ Yasîn 'HEYDERÎ

9-MELÎKŞAHAN (MELKÊŞÎ)/BEGÊN ÇEMÎŞGEZEKÊ/DÊRSIMÊ(?-1600): Navend Dersim, 32 kelhû 16 nahiyebûn. Begêpêşîn Şêğ Bege. Di 1514an da hinek begên wan ji aliyê Yawiz Siltan Selîmve hatin îdamkirin. Begê dawî Yalman Bege.

10-MÎRDASÎYAN (BEGÊN EGÎLÊ) (?-1597):Erdnîgarî navçêyên Diyarbekirê Eğil, Pîran, Palo, Çêrmûg e. Begê ewil Şêğ Pîr Mansûrê Seyyîd HuseynêTopal e. Ji Colemergêhatiye Piranê. Begê dawî Mihemmed Begê neviyê Welat Beg e (?-1597).

11-BEGÊN HÎZANÊ: Erdnîgarî Hîzan û Muks e. Li gorî Şerefnamê, sê bira ji Xinûsê hatine. Dîl li Hîzanêbi cî dibe. Begê pêşî ev e. Ew 9 begên din ji nesla Dîl in. Begê herî dawî Zeynel Beg e. Di dewra Siltan Selimê 2an de tabiê Osmaniyanbûn.

12-CANPOLAT ZADAN (BEGÊN KILÎSÊ) (?-1605): Ji nesla begên Bahaddînanin. Begên Zaxoyêji Colemergê tên. Di dewra Eyyûbiyanda dibine mihafizên Kelha Qûserêû begên Kilîsê. Begê pêşî navê wî Mend Beg e. Malbat navê xwe ji Canpolat Begê hildide (1500-1572). 72 salan serektî kiriye. Tabiê Osmaniyan in. Di 1630î da, ji Mala Canpolatan Seîd Beg, li Cebelê Lubnanêbi cih dibe. Canpolatên Lûbnanê ji nesla wî nin. Li Kilîsê jî îro hene. Begê herî dawî Canpolatzade Huseyn Paşa (Muneccim) e, li Kilîs û Mûsilê mîrîtî kir (1593).Dûvra bûbegê Helebê. Di 1605an da li Wanêhate kuştin.

13-BEGÊN ŞÎRWANÊ:Erdnîgarî, Sêrt û Şîrwan e. Begê pêşî Hesenê Îbrahîm e. 9 beg derbasbûne. Ê dawî Evdal Begê3an e. Şîrwan sancaqbû. Bavê Evdal Beg, Mihemedê Gewr, di 1575an da diçe sefera Tûnisê û di 1597an da wefat dike…

14- BEGÊN ZIRGAN (EZRAQIYAN) (?-1587): Li devera Mêrdînê ne. Begê ewil Şêx Hesenê'Ebdûrrehmanê Zirgî ye. Pismamtiya wan û begên Hîzanê jî heye. 11 beg derbasbûnê. Begê rêza 9an Yaqûb Beg (1543-1567) ji begtiyê ferağetkir. Di 1580an da mir.Dîwana wî ya bi Kurdi heye. Begê 11an Elî Beg e. Begên Girdikan jî li dora Hîzanê pismamê wan in.

15-BEGÊN TERCÎLÊ (DEVERA HEZROYÊ): Pismamê Begên Zirgî ne…

16- BEGÊN SWÊDÎ (?-1585): Erdnîgarî

Dara Hênê, Xançûk, Çabaqçûr e. Ji Sêwrekê hatine Çabaqçûrê. Mistefa Beg di 1585an da Tebrîzê şehîd bû.

17-SİLÊMANÎYAN: Navend Qûlpê ye. Erdnîgarî Meyafarqin Îlûh (Batman) e. Begê Pêşî Merwan Beg e. Di 1597an da Qasim Beg kargerbû...

18-BEGÊN SORAN: (1502-1597):Erdnîgarî devera Hewlêrê, Soran, Ewan, Sûmaq, Şekaabad e. Begê yekem Îsayê Kewlos e.Begên Hewlêrê jî tê gotin. Begê 13an Seyfûddîn li Stenbolêhat îdamkirin. Begê dawî Elî Begê Silêmanî ye, piştî 1597an...

19-BEGÊN BABAN (II.) (-1597): Erdnîgarî Larcan, Sêwî, Seldûz, Maran, Şehrbazar e.Begê ewil Pîr Bûdaq Begê Evdal Beg e. 8 beg derbasbûne. Ê dawî Mihemed Begê Kestanê ye.

20-BEGÊN MUKRÎYA (?-1594): Eşîra Mukriyan in. Erdnîgarî Deryas, Dûlberik, Axtac, Seldûz, Eltemûr,Sarikûrgûn, Dûab, Terka Leylan e. Demekê Şehrezor jî dibe navenda wan.6 an jî 8 beg derbasdibin. Ê pêşî Seyfûddîn Mukrî ye. Beriya 1515ane. Lewra di 1515an dalawê wîSarim Beg hikumdar e. Ê dawî Şêx Heyder BegêIlan e. Di 1594an da li Îranê sancaq begê Merago û Sariqûrğanê bû.

21-BEGÊN BRADOSTÎYAN (?-1597): Berdewama Hesenweyhiyane. Ji eşîra Goran in. Di 1515an da tabiê Osmaniyanbû. Erdnîgarî, Navend Somay, Terkor, Dewl, Terkewer, Kelha Dawûd e. Begê dawî Hûseyn, an jî Heyder Beg e, piştî 1597an. 6 beg derbasbûne.

22-BEGÊN MEHMÛDÎ (?-1595):Di ‘esra 16an da dibinmisulman. BerêÊzîdî bûn. Lewra begê yekem di dewra Qereqoyûniyanda Şêx Mehmûd bû. ‘Eşîr navê xwe ji wî distîne. Şêx Mehmûd mîrê Xoşab û Aşûtê (devera Wanê) bû. 10 beg derbasdibin. Ê dawîÎbrahîm Bege, (Sunnî-Şafiî), di 1650î da begê Xoşabê ye.

23-BEGÊN DIMILIYAN(?-1579): Ji ‘eşîra Dimilyanin. Êzîdî ne. Di dewra Îsa Beg da dibine misulman. Di dewra Aqqoyûniyandane. Lewra Îsa Beg, ŞêxEhmed Beg, mîrên Aqqoyûniyanên Sokmenabadê ne. Erdnîgarîli Îranêdora Xoyî, Sokmenabad, Ebqa (Ebeğ), Çaldêran, (Bêgir) Sûlêmansaray e. Dûvra tabiê Sefewiyandibin. Piştîherba Çaldêranê dighêjin Osmaniyan. 10begderbasdibin. Ê dawî Qiliç Begmîrê Sancaqa Çaldêranêye.

24- BEGÊN KELHORÊ (?-1594): Ji ‘eşîra Goran in. Navend Pelengana Îrane. Erdnîgarî Dew-diz, New-diz Dizman e. Begê yekemGybûllah Beg e. Keça Şah Îsmaîl ji lawê xwe Mihemed Begra xwest. Begên Derteng (Hûlvan),Bawê, Kelha Zincir, Baskê jîji vê malbatêne. Di 1535an da gihîştine Osmaniyan. Begê dawî Mansûr Beg e. (1594)

25-BEGÊN BANÊ(DEWRA SEFEWIYAN): Navend Banê, erdnîgarî kelatên Şiwêû Piroz e. Navbera Erdelan, Baban û Mukriyan e. 4 beg in. Ê pêşî Mîrze Beg, ê dawî jî Bedîr Beg e.

26-BEGÊN GELBAĞIYAN: 4 ‘eşîrên Kurd bûn. Bendeyê Sefewiyanin. Di 1579an da dighêjne Osmaniyan. Begêewil ji ‘eşîra Rengerojê ‘Ebas Ağa,ê dawîjî Huseyîn Beg e.

27-BEGÊN SÎYAH MANSÛR’AN (?-1596):Siyah Mansûrî‘eşîreke Kûrd e. Mîrektiya Siyah Mansûran, ji 24 ‘eşîrên Kurd pêk hatiye.Navend Kerşeb e. Begê ewil Xelil Xane. Di dewra Şah Tahmasbda dibe mîrê Eyaletê. Ûnwanê “Xantiyê” didinê. Erdnîgarî navbera Qazwîn û Tewrêz e. Begê dawî Dewlet Yar Xan,di 1596an da tê îdamkirin.

28-BEGÊN PAZÛKÎ(?-1579):Ewjî ji ‘eşîra Siwêdî ne. Erdnîgarî Kiğê, Xinûs, Milazgîr,Eleşgîr, Erdîş, Elcewaz. Di dewra Aqqoyûniyanda hene.Begê yekem Huseyn Elî Bege. Di dewra Şahsûwar Beg da dighêjin Sefewiyan. Paşêdibinbendeyê Osmaniyan. Pazûk, Sancaqdi nav herdudewletandatên û diçin.Osmanî, begê dawî Niyaz Beg di 1579anda dikujin.

Di dewra Osmanîû Sefewiyanda bi kurtasi rewşa mîrektîûbegtiyên Kurdan eve: Lêdivê ev jî bê zanîn; Rewşa teriqan (Weke Neqşebendî, Qadirî, Xalidî)şêx, murşîd ûalimên Kurdan, hem dinav Kurdan, hem jî dinavmilletên din da bitesîr û hêzdartirin. Ji ber vê bandor û dîndartiya Kurdan, mîr ûrêberên Kurdan, ji xwe re şêx û alim hilbijartine. Înşallah di pêşda emê li ser alim, şêx ûmurşîdên Kurdanên dîrokîû bandorû dewsa wan ya dinav ummeta Îslamêda bisekinin. Spartî Xwedabin. Di nav xêrû xweşiyêda bin.



# Tesewwûf - 2

✍ M. Ce'fer Bêcirmanî

Me hejmara çû li ser wateyên Tesewwifê yên ku ‘alimên Tesewwifê li ser vê ‘ilmê kirine beyan û bi rêz kir. Ebû Nesr Serrac Et Tûsî di serê pirtûka xwe ya bi navê El Luma’ de li ser sê mektebên Îslamî diaxive û bi vî awayî behsa wan dike: “ ‘Ilim cûrbecûr in. ‘ilmên dînî jî sê beş in: ‘Ilmê me’rîfeta Quran, ‘ilmê me’rîfeta sunneta bi şan û ‘ilmê zanîna heqîqetên îmanê. Ev her sê ‘ilim di navbera van hersê koma de digere. Ev her sê ‘ilim ji ayetên Xweda Te’ala, kirin, peyv û teqrîrên Resûlê Xweda ‘Eleyhîsselat û Wesselam û ji hikmetên ku ji dilê ‘Ebdên Xweda yên welî ketine çêbûne. Çavkaniya van ‘ilman; hedîsa “îman, îslam û îhsanê” ye… Digel vêna çawa ku di ayeta pîroz de jî tê beyan kirin: “Ehlê ‘ilmê derece derece ne.”[1]… Ji ber vê yekê kesê kû di derheqê ûsûl, firû’, hiqûq, heqaîq, zahir û batinê dîn de pirsgirêke ke wî hebe divê li ber destê van hersê koma çareser bike: Ango muheddîs, feqîh û sûfiyan.”[2]

Ebûn Nesr bi vî awayî peyvên xwe didomîne û li ser van hersê koma sernivîsek cuda dideyne:

**‘Ilmê Hedîs û Muheddîs**

“Muheddîs girêdayê zahirê hedîsên Resûlê Xweda ‘Eleyhîsselat û Wesselam dimînin û dibêjin: “Hedîs bingeha dîn e.” Lewra Xweda ‘Ezze We Celle wiha kerem kiriye: “Pêxember çi fermanê bide ber we, wê bikin û çi li we qedexe bike xwe jê vedin…”[3] muheddîsan vê ayetê ji xwe re ferman qebûl kirine û ji bo hedîsên Resûlê Xweda ‘Eleyhîsselat û Wesselam hîn bikin derketine rêwîtiyên dûr û gelek zehmetî kişandine. Digel vê yekê hînkirina van hedîsan ji gel re weke wezîfeyekî mezin ji xwe re dîtine. Rîwayetên ku ji sehabe û tabiiyan gihîştine wan kom kirine, keyfiyeta jiyana wan, peyvên wan, ûsûl û uslûbên wan, şîrove, îxtîlaf û kirinên wan yên di derbarê ehkamên Îslamê de qeyd kirine. Di temamên ‘ilmên Hedîsê de bûne pispor… Resûlê Xweda ‘Eleyhîsselat û Wesselam di derbarê wan de wiha kerem dike: “ Xweda Te’ala rûyê kesê ku ji min peywek sehkiriye û wî ji mirovan re tebliğ kiriye ronî bike.”[4] ji ber bereketa vê du’aya Resûlê Xweda ‘Eleyhîsselat û Wesselam Xweda Te’ala, bereket xistiye ilmê wan û jiyana wan û digel çar muctehîdan, muheddîs di ‘alema Îslamê de gelek hatine hez kirin. 5

Pey Muheddîsan Şêx Ebûn Nesr di derbarê Feqîh; ango ‘alimên bi fiqhê û ehkamên Îslamê de jî bi vî awayî kerem dike: “

**‘Ilmê Fiqhê û Feqîh**

“‘Alimên fiqhê digel qebûl kirina ‘ilmên muheddîsan, ûsûl û wateyên ku wan danîne; ji ber fêma xwe a deqîq a di fêm kirina hedîsan, derxistina ehkam,

hidûd û mijarên şerî ji ehlên hedîsê mezintir hatine qebûl kirin. Lewra yê ku ehkamê dîn; nasix û mensûx, ûsûl û firû', xisûs û 'imûm, sünnet, îcma' û qiyasê îzah û beyan kirine ew in.

Feqîhan, her tiştî danîne cihê wî û hidûdê her tiştekî di dîn de xweşik bi xêzik kirine. Mijarên tevlîhev ji nav hev derxistine… Bi vî awayî gelek pirsgirêkan çareser kirine, girêkan vekirine, rêyan paqij kirine, şek û gumanan bi dawî kirine… û sînorên dîn bi ihtiyat parastine. Ji ber vê yekê di hidûdên îlahî û ehkamên şer'î de texlît kirina 'alimekî 'alimekî din an cahilekî cahilekî din an xewwasekî xewassekî din an 'ewamekî 'ewamekî dinê ne durust e.

Xweda Te'ala di derbarê wan de wiha kerem dike: " Ne rewaye ku bawermend hemû pêk ve derkevin cîhadê. Vêca bila ji her komekê ji wan civatek derkeve (cîhadê) da ku (yên mayîn) di emrê dîn de zana bibin û dema gelê wan (yên çûne cîhadê) li wan vegeriyan wan agahdar bikin, ji bo ku ew jî (ji gunehan) xwe biparêzin."6 -7

Şêx Ebûn Nesr, pey re jî di derbarê sûfiyan de diaxive bi vî awayî;

**Tesewwif û Sûfî**

"Sûfî, di mijarên baweriyê de weke muheddîs û feqîhan îtîqad dikin, 'ilmên wan qebûl dikin û li hember esasên wan dernakevin. Lewra Sûfî, xwe ji bîd'et û 'ebdîtiya nefsê diparêzin, girêdayê exlaqê xweş û di her 'ilmî de bi wan re muwafiqin. Ji Sûfiyan kesên ku negihîştine asta muheddîs û feqîhan, ji bo pirsgirêkên kû di hidûdê islamê û ehkamên şerî de derketine pêşiya wan çareser bikin serî li muheddîs û feqihan didin. Di tiştên ku 'aliman îcma kirî de sûfî jî îcma dikin. Lê di mijarên ku 'aliman îxtîlaf kirine de Sûfî a herî nêzî teqwa û îhtîyatê kîjan be wî dineqînin. Bi vî awayî fermanên ku Xweda Te'ala li 'evdên xwe kiriye te'zîm dikin û ji nehyên Wî xwe diparêzin.

Di terîqa Sûfiyan de terka 'ezîmetê û pêgirtina rûxsetê; zordayîna deriyê te'wîlê, bi meyla rehetiyê, sistatiya di mîzênan de, şemtandina bi bal tiştên bi şik û guman ve tuneye. …

Digel van tişta weke derece û halên bilind û menzîlên weke 'îbadet, ta'et û exlaqê heye. Hinek kûrahiyên 'îbadet, exlaq û halan li cem wan heye. Van tişta ji feqîh û muheddîsan cuda taybetê bi Sûfiyan e."8

Şêx Ebûn Nesr pey van beyanên xweş di derbarê edeba sûfiyan de diaxive. Di beyana vê yekê de emê dîsa serî li El Lumâ wî bixin. Digel beyana mekanê Tesewwifê digel her dû mektebên din yên Îslamê gelo yê ku vê 'ilmê daniye kî ye?

"Li gor Ehlê Tesewwifê yê ku esasên vê 'ilmê daniye: Murşîdê herî Kamil, roniya çavan Resûlê Xweda 'Eleyhîsselat û Wesselam e. Allah 'Ezze We Celle bi îlham û wehyê hînê wî kiriye. Dibêjin di serî de Cibrîl bi şerî'etê hatiye di pey ku şerî'et kamil bûye, di rêza diduyan de bi heqîqetê hatiye û ji hinek kesan re vê 'ilmê xisûsî girtiye herkesî pê mesûl negirtiye. Yê ku 'ewwil di vê derbarê de axiviye; Îmamê 'Elî (Kerremellahû Wechehû) ye. Yê ku 'ewwil jê ev 'ilm girtiye Hesenê Besrî razîbûna Xweda lê be ye. Hinek 'aliman jî gotiye yê ku 'ewwil ji Îmamê 'Elî ev 'ilm girtiye Îmamê Hesen ku 'itreta Nebî Eleyhîsselat û Wesselam e."9

Çavkaniya Wê

"Çavkaniya Îlmê Tesewwifê Quran û sunnet, îlhamên salihan û fetwayên 'arifa ne. Beşek ji 'ilmê fiqhê jî ji ber pêdiviyê 'aliman xistine nav Tesewwifê. Çawa ku Îmam Ğezalî di "Îhyaû 'ûlumud Dînê" de, İmam Suhrewerdî di "'Ewarîful Me'arîfê" de û Şêx 'Ulwan El Hemewî di pirtûka xwe a bi navê "Mîsbah'ul Hîdaye" de kiriye."10

Cuneydê Beğdadî dibê:

ليس التصوف لبس الصوف و الخرق
بل التصوف صفو القلب و الخلق

دلائل الصدق لا تخفى على احد
كحامل المسك لا يخلو من العبق

"Tesewwif ne li xwe kirina cilên sûf (hirî) an hişk e/ Tesewwif paqijiya qelb û xulq (tebî'et) e."

"Delîlên rastiyê ji kesî veşartî namînin/ Çawa ku miskfiroş ji bêhna miskê bi par namînin"

Çavkanî:

1. (Mücadele 58/11)
2. (El Luma' (İslam Tasavvufu) Ebûn Nesr Serrac Et Tûsî, wergera: Prof. Dr. Hasan Kamîl Yılmaz, Weşanxaneya Erkam, rûpel; 9,10,11,12)
3. (El Heşr, 59/7)
4. (Ebû Dawûd, 'ilim, 10; Tirmîzî, ilim, 7)
5. (El Luma' (İslam Tasavvufu) Ebûn Nesr Serrac Et Tûsî, wergera: Prof. Dr. Hasan Kamîl Yılmaz, Weşanxaneya Erkam, rûpel; 9,10,11,12)
6. (Et Tewbe, 9/22)
7. (El Luma' (İslam Tasavvufu) Ebûn Nesr Serrac Et Tûsî, wergera: Prof. Dr. Hasan Kamîl Yılmaz, Weşanxaneya Erkam, rûpel; 9,10,11,12)
8. (El Luma' (İslam Tasavvufu) Ebûn Nesr Serrac Et Tûsî, wergera: Prof. Dr. Hasan Kamîl Yılmaz, Weşanxaneya Erkam, rûpel; 9,10,11,12)
9. Rîsaletul Kuşeyrîyye, Tehqîqa 'Ebdulkerîm 'Eta rûpel; 8,9 Mektebetu Ebî Henîfe)
10. (Rîsaletul Kuşeyrîyye, Tehqîqa 'Ebdulkerîm 'Eta rûpel; 8,9 Mektebetu Ebî Henîfe)

# HZ. ADEM ('E.S)

## MIROVÊ YEKEMÎN Û QASIDÊ EWIL



✍ Ehmed Zeytûnî

Dema Xwedayê Teala dinya afirand, li ser rûyê dinyê tu mexlûqat tunebû. Lêbelê piştî Xwedayê Teala dinya afirand, xwest ku mirovan jî biafirînê.Wê demê milyaketan ji Xwedayê Teala pirsîn û gotin: "Ma qey tê li ser rûyê erdê mirovên ku wê xerabîyê bikin û xwînê birjînin biafirînî? Em her dem ji te re îbadet û îtaet dikin."

Xwedayê Teala ev rewşa han bi vî awayî bersivand: "Tiştên ku hûn pê nizanin ez pê dizanim." Wê demê milyaket bêdeng man û ji hev re gotin: "Xwedayê Teala bê gûman tu tiştî bêkêr û bêsedem çênake."

Piştre Xwedayê Teala ji milyaketan re wiha got: "Gelî milyaketên min! Wexta ku min vî mirovî ji herîyê afirand û ji giyana xwe pifkirê, hûn milyaket derhal jê re herin secdê û divê hûn jê re hurmet bikin." Milyaketan pev re gotin: "Ey rebbê me yê bilind û mezin! Me ev fermana te guhdar kir û di heman demê de îteat kir."

Lê belê vê fermana Xwedayê Teala, kêfa şeytan revandibû. Şeytan xwe û Hz. Adem didan ber hev û ğemgîn dibû. Şeytan xwe bi xwe difikirî û xwe gellekî dieciband. Xwe bilindtirînê mexlûqatan didît. Di nav mexlûqatên ku Xwedayê Teala ew afirandibûn de, xwe ji wan hemûyan qenctir û mezintir didît.

Xwedayê Teala daxwaza xwe bi cih anî û ji giyana xwe pifkirê. Di encama vê bûyerê de bavê me Hz. Adem wek mirovekî xweşik hat afirandin. Milyaketan di wê gavê de ji Hz. Adem re çûn secdê. Lê belê şeytanê le'netûllah, xwe ji Hz. Adem mezintir û qenctir dît. Şeytan bi vê rewşa xwe bû ji dijraberan. Lewra şeytan li hember Xwedayê Teala serî hildabû. Xwedayê Teala jê re wiha got: "Çima tu fermana min guhdar nakî û digel milyaketan ji Hz. Adem re naçî secdê?"

Şeytan ev sûala Xwedayê Teala bi vî awayî bersivand: "Ya rebbî! Te ez ji êgir, Adem jî ji heriyê afirand. Agir ji heriyê bilindtir e. Ji ber vê yekê ez ji Adem qenctirim."

Li ser vê bûyerê Xwedayê Teala lê hat ğezebê. Şeytan ji beheştê qewirand û jê re wiha got: "Dakeve ji wir û biteqize! Êdî tu yekî mel'ûn e."

Şeytan li hemberî bilindbûna Xwedayê Teala xwe mezin dîbû û xwe pesinandibû. Bi vê tevgera xwe bûbû ji dijraberan. Tu qedr û qîmeta wî li cem Xwedayê Teala nemabû. Li pêşberî vê rewşê şeytan şaşwaz bûbû. Xwedayê Teala jê re wiha got: "Ey ê ji bihiştamin hatiye qewirandin û ji rehmeta min hatiye dûrkirin! Min Adem ji herîyê afirand û nîmeta herî giring aqil dayê. Ji ber vê taybetîya xwe ew ê Adem û zarokên wî, baş û xerab, qenc û neqenc ji hevdî veqetînin.

Digel vê yekê te guhdar nakin û bera dû riya te ya çewt nadin." Lêbelê Xwedayê Teala ew nimeta herî hêja daye mirovan û bi vê nîmeta Xwedayê Teala, heke mirov rûyê xwe ji Xwedayê Teala bizivirîne û bi ya şeytan bike, ew bi xwe berpirsîyar e. Xwedayê Teala weha got: "Yên bi ya şeytan bikin û bidin dû riya wî, bê gûman ezê wan ceza bikim û dojehê ji wan re bikim mesken.Lê belê şeytan tucarî nikare evdên min ên hişdar û qenc ji riya rast veqetîne." Wê gavê Xwedayê Teala ji şeytên re wiha got: "Ezê heta qiyametê wextê bidim te. Heta wê demê tu azadî."

Xwedayê Teala xwest ku ji alîyê zanebûnê Adem û milyaketan bide ber hev. Li pêşberî wan cûrbicûr ajal û çûk derxistin. Cara ewil ji milyaketan pirsî: "Ka bêjin, van tiştên hûn dibînin navê wan çine?" Milyaketan: "Ey rebbê me! Ê ku her tiştî dizane û nîşanî me dide tû yî. Ji ğeynî tiştên te hînî me kiriye em tu tiştê din nizanin."

Li hember vê bersiva milyaketan Xwedayê Teala îcar ji Adem pirsî: "Ey Adem, ka navên van tiştên ku min nîşanî te dane ji milyaketan re bibije."

Hz. Adem navên wan ajal û çûkan yek bi yek anî ziman. Piştre Xwedayê Teala ji milyaketan re wiha ferman kir: "Ey milyaketên min! Ma min ji we re negotibû ku çi tiştên veşartî û çi yên eşkere ez ji hemû tiştan agahdarim."

Piştre Xwedayê Teala Adem kir beheşta xwe û Adem bû nişteciyê beheştê. Rojekê Hz. Adem di xew re çû û piştî demekê ji xew şiyar bû. Dema çavê xwe vekir dît ku jinek li kêleka wî rûniştîye. Li hember vê rewşê Hz. Adem şaş bû û ji wê pirs kir: "Tu çi kesî û navê te çiye?" Hz. Hewwayê ev sûala Hz. Adem wiha bersivand: "Ez pîrekim lê belê navê xwe nizanim."

Hz.Adem bi kêfxweşiyeke zêde bala xwe da Hz. Hewwayê. Piştî nêrîna demekê fêm kir ku ev jin tevdigere û rihber e. Di heman demê de bi coş bangî wê kir: "Tu Hewwa yî." Wê gavê milyaketan bi armanca zanebûna Hz. Adem biceribîne, navê hevsera wî ji wî sûal kir: "Ka bêje ey Adem! Navê vê jinê çiye?" Hz.Adem ev pirs bersivand û got: "Navê wê Hewwa ye."

Xwedayê Teala destûra xwarina fêkiyên her darê dabû, lê belê ji wan daran darek ji bo wan qedexe kiribû. Xwedayê Teala şîret li Hz. Adem kir û got: "Ey Adem! Bi rastî şeytan hem neyarê te û hem jî neyarê hevsera te ye. Ji ber vê yekê hişyarbin. Bila şeytan we ji beheştê dernexîne. Bi rastî di beheştê de ne tîbûn, ne birçîbûn, ne 'acizbûn û ne jî westabûn heye. Hz. Adem û hevsera wî Hz. Hewwa demekê di beheştê de bi şahî û bextivarî jiyan. Lê belê şeytan ji bo bigihêje armanca xwe, hertim bi fen û bena derdiket pêşberî Hz. Adem û Hewwa. Carekê nêzîkî wan bû û di guhên wan de pispisand: "Ey Adem! Ezê darekê nîşanî te bidim. Heke hûn ji wê darê bixun, hûnê ebedî bibin niştecihên beheştê."

Wê gavê bi Hz. Adem re heyecan peyda bû. (Ev heyecan wxeş bû, lê belê ji wî re ne xêr bû.) Hz. Adem li şeytên nêrî û wiha got: "Ka ew çiye? Nîşanî min bide." Şeytan tilîka xwe dirêjkir û ew dara ku Xwedayê Teala ji bo wan qedexe kiribû nîşanî wan da. Lê belê Hz. Adem pê bawer nebû û ew ji cem xwe qewirand. Lê şeytan tu carî aciz nedibû û têkoşîna xwe didomand. Dîsa dihat cem wan û di guhên wan de dipispisand: "Ma hûn dizanin rebbê we ji bo çi ev dar qedexe kiriye? Baş bifikirin û haydê rabin ji fêkiyên vê darê bixwin." Hz. Adem dîsa li şeytên guhdar nekir û xwe jê dûr xist. Le belê şeytan dîsa li pey wî çû û jê re wiha got: "Ez bi navê Xweda sond dixwim ku ez riya rast bi ber we dixim. Ji min bawer bikin."

Dema şeytan bi navê Xweda sond xwar, Hz. Adem û Hewwa kûr fikirîn û ji xwe re gotin: "Ez bawer nakim tu kes bi derew bi navê Xweda sond bixwe. Dibe ku rast dibêje." Paşê çûn cem wê dara ku Xwedayê Teala ji wan re qedexe kiribû û jê xwarin. Dema ew fêkiyên dara qedexe, ji qirika wan hat xwarê û kete zikê wan, di heman demê de yek car rût û tazî bûn. Gelekî fedî kirin. Bi pelên daran xwe nixumandin. Li hember vê bûyerê li xwe heyirîn û nizanibûn  ewê çawa bikin. Ji Xwedayê Teala şerm kirin û dûr reviyan. Hz. Adem û Hewwa baş fêhm kirin ku wan fermana Xwedayê Teala binpê kirine. Bi xwarina wan fêkiyên dara qedexe, li hemberî Xwedayê Teala rabûbûn. Xwedayê Teala dît ku Hz. Adem direve. Bangî Hz. Adem kir û jê re got: "Ey Adem! Ma tu ji min direvî?" Hz. Adem wiha bersivand: "Ya rebbî! Qet ne biderfete ku ez ji te birevim. Lê belê ji ber şaşîya min kiriye, ez li hemberî te fedîkar û bêrû me." Xwedayê Teala: "Ma min ew dar ji bo we qedexe nekiribû? Disa min negotibû ku şeytan ji bo we neyarekî eşkere ye? Ji bo çi we fermana min guhdarî nekir?" Hz. Adem û Hewwa gotin: "Ya rebbî, me bibexşîne." Xwedayê Teala: "Min emrî we kiribû, lê belê we emrê min binpê kir."

Adem û Hewwa li ber Xwedayê Teala geriyan û gotin: "Ey rebbê me! Me xwelî li serê xwe kir. Heke tu me nebexşîne û li me neyê rehmê, bê gûman emê bibin ji wan kesên ku di xisarê dene. Ya rebbî! Ez bi îzzeta te sond dixum ku min tu carî bawer nedikir ku kesek bi navê te bi derewan sond bixwe." Xwedayê mezin û bilind, li hember rewşa Hz. Adem a xirab wiha got: "Ez bi îzzeta xwe sond dixum ku hûnê dakevin ser rûyê erdê û li wir bijîn. Êdî di jiyana we de keda pîya û xwêdana eniyê heye. Mîna li beheştê jiyaneke aramî êdi tûneye." Piştre Xwedayê mezin ji Hz. Adem û Hewwa û ji neyarê wan şeytan re wiha got: "Ji hev re wek neyaran dakevin ser rûyê erdê. Hûnê demekê li wir debara xwe bikin û cihwar bibin.

Hz. Adem, ji ber ku Xwedayê Teala jê ğeyidîbû û ew ji beheştê derxistibû, gelekî ğemgîn ketibû. Ji ber şaşiyên xwe poşman bûbû û digiriya. Ji Xwedayê Teala re wiha dua dikir: "Ya rebbî! Min bibexşîne û 'efû bike." Bi vî awayî li ber Xwedayê Teala digeriya. Paşiya paşî Xwedayê dilovan, tobeya Hz. Adem û Hewwa pejirand û ew bexşandin.

Bê gûman Xwedayê dilovan û mihrîban, tobeya kesên li şaşiyên xwe haydar dibin û ji lew poşman dibin, dipejirîne. Dawiya doza me, herdem şikurkirina Xwedayê Rebbul 'alemîn e.

# XEWN Û XÎYAL

Cewdet Karaman

Di quntara çiyê de
Li ber tirba Xanî raketim
Min xewn û xiyal bûne yek
Dîrokek zindî
Bi ximam li serê çiya xwîya bû

Agirî!
Nîşana xeşyet û heybetê
Kahnîyek sor û sipî
Li ber çava pêl veda
Geh ji xwînê
Geh ji agir herikî

Serî berf e
Dorhêl deşt û çîmen
Warê şivan û gavana
Şahidê qe'hr û ğema
Pir borandîye dem û dewran
Dikele ji binî ve
Hê nehatîye 'xezebê

Îhsan Nûrî li Quntarê
Konê berxwedanê veda
Heskê Birê Têlî
Bi kerkîta tevna mêrxasiyê dihûne
Silêmanê E'hmed
Keremê Qolağasî
Diçin û tên li der û dorê
Qulingê 'Evdal
Ji sêrtê tê li ser datîne

Heywax! Kela Bazidê hilweşî
Deng ji Surmelî Memmed paşa der-
nayê
Ehmedê Xanî dibê
Kanê Mihemmed Beg gelo
Ka padîşahê Serheda
Quntara çiyê
Buye meğelê Qazan û Beta
Lê lê hedê rebbêne şerekî li me çê bû...
Hê gotin di devê dengbêj de
Teyrê 'ecelê çû û hat
Şêx Zahir şûrê xwe li ber min danî go
Kereme ke lawo!
Min Eve mîras

Agirî sebr e
Agirî serbilindî ye
Agirî xezeb e
Agirî beheşt
Agirî dojeh

Kî çi bajo wî diçine
Herkes û nesîbê xwe
Herkes û kesba xwe

Nûrsî bûye mêvanê Xanî
Dibê: Ya Eyyûhel Ekrad
We heye xwedî û xudanek
Alî kerem û letîfedanek
Ji kalanê şûr
Hubra qelemê dadiwerive
Dibit Rîsalê Nûr
Yan Reçetetul Ekrad
Xem nexwe Xanî
Kalan ji qelem re bûye kiras
Hêj hene merd û mêrxas
Di cebirîne êş û elema
Li ser pişta hespê
Xweş tê dengê Işaratul îcaz

Paşê...
Li ser baskê teyr çûm Wanê
Bêhnek rûniştim li Xorxôr
Bişkivîn wek fêkî
Gul ji hubra qelemê şîn bûn
Gulên ber biroj
Bêhna wek misk û 'enber
Şax vedane qor bi qor

Vebûye Medrestuz-Zehra
Qeb qeba kewê ribat
Bi sî û sê zimana
Di xwîne li ser sitûn
Dengek wek dengê bilûr
Ji nişka ve tê ji dûr
Dibê şad û bextewar
Îro ezim li vî diyar
Min cebirîn êş û elem
Lew bi Kurdî dinvîse qelem

Min go: Kî yî tu xalo!
Go: Nursî me 'evdalo

Derxist ji ber xwe
Sifrekî dewlemend danî
Tev kitêb û qelem bûn
Go min di dewsa nan ji wer anî
Ev sifra xan 'Ebdal e
Yan a şerefxanê Kal e
We nan û av û azadî
Bi 'ilm e
Ne bi şûr û mertal e

# Gotinên Pêşiyan-4

- *Tu diz bî şevê reş pir in.*
- *Çê kiro bi xwe kiro, xera kiro bi xwe kiro.*
- *Dewê ceribandî ji mastê neceribandî çêtir e*
- *Dujminê baqil ji dostê ehmeq çêtir e.*
- *Bersiva ehmeqa sikût e.*
- *Dû parê xizanîyê ji nezanîyê ye.*
- *Zimano req serîyo teq.*
- *Peqilkê ser avê rûyê derewîna derdixe.*
- *Bila Xweda yar be bila şûrê te dar be.*
- *Aşê nezana bi xweber digere.*
- *Ji devê dikeve ji hopehopê namîne.*
- *Piştî baranê ga cilik dike.*
- *Siwarê dêlrûtê, sibê diçe êvarê zû tê.*
- *Axa jin û mêran ne yek be, serê wan naçe ser ba'lîfekê.*
- *Dinya nediyan dinya nedî, kulmek bulğura wan hebû, kirin 'eydî*

# XANIMA ŞEHÎD



Mûhemmed BARAN

Ez qîzeke ciwan, hê 19 salî bûm. Dilêmin herî bi hizûr û xweşîyê tijî bû. Ji bo min dinya şên û şeng bû. Ez bêxîlaf dikarim bêjim ku heta vî 'emrê xwe, ez qet bêhizûr nebûbûm.

Ma qey ez tenê bûm ê herî dil bi hizûr û xweşî û ji heyata xwe lezzet distend…Na, na welahî hemî malbata min, wisa di hizûr û xweşîyê da dijîyan. Çar xwuşkê minê ku ji min biçûktir û bi tevlî Memoşê me jî wisa bi kêfxweş bûn. Gula mala me, di malbatê de kurekî bitenê û yê 'ewil bû Memoşê me. Piştî ewqas hesret bi me da kişandin, dûre welidî û hat dinyayê. Piştî pênc qîzan, Xwedê ew da, ji lewma ewqas nazdar û delal bû Memoşê me.

Memoşê me yê ku hizûr û xweşîya malbata me herî zêde kir, hê di yeksalîya xwe de bû. Bavê me, bi hatina Memoş ya dinyayê, pir bextewar bûbû. Ev hesreta bavê me ya bi salan, bi dawî bûbû, di dewsa wê de bextewarî û hizûrî lê kon wedabû. Bi sedem vê kêfxweşîya bavê me, em jî pê bextewar dibûn.

Bavê min, di dewreke ku Îslam û bawerîya bi Xweda, îşlikek ji îşlikê êgir bû de, ev îşlik li xwe kiribû. Ew exlaqê wî yê nerm, çiqas xweşik ji bawerîya wî re dibû xeftan. Ev bawerî, ew kiribû însanekî kamil. Ev şi'ûr bi me zarokên xwe jî dabû hînkirin. Qey ew bêje û em li pey gotina wî neçin, ma mimkûne gelo? Ez û xuşkê minên ji min biçûktir, em êdî mezin bûbûn û me bi çarşefa ku rûmeta me ye xwe nuxumandibû. Bavê me bi vê rewşa hanê jî pir kêfxweş bûbû. Me hemî hessasîyetên Îslamî ji wî hîn dikirin. Heyata me û roja me hê bêtir ronî û binûr bûbû. Ji xwe min qet texmîn nedikir ku malbateke wisa mîna me bi hizûr û bextewar hebe.

Em di dewreke wisa de bûn ku hinekan tehemmul nedikir li welatê me însanên dîndar û bawermend hebin. Orgutek û rêxistineke murted a neyarê Îslam û muslumana hebû. Em jî rastî wê dewra dijwar hatibûn. Ev rêxistina murted, hema ji bo kuştin û qetilkirina xelkê musluman ketibû rê. Wan zaliman tu sînor nas nedikir. Lê belê hewce bû ku bavê min karê xwe bimeşîne. Yanê ne ku bavê min tedbîra xwe nedigirt. Feqet serê sibehekê dema bavê min diçû karê xwe, pêşîya wî girtin. Hezar û sed hezar lanet bibare li ser xwînmij û zaliman…

Bejna bavê min, di xwîna sor de mabû. Bavê min şehîd bûbû. Ji vê kêlîkê û pê de, êdî dinya li serê me xerabû. Ew jîyana me ya xweş û bextewar li ber çavê me reş bû. Lewra heyata me bi vî însanê kamil şên bû. Êdî ez naxwazim li dinyayê bijîm. Ew hesreta ku gavek berî gavekê min dixwest bighêjim bavê xwe yê şehîd, ez perîşan dikirim. Hela tew dema ku ez çav li dîya

xwe ya stûxwar diketim, min ji dinyayê nefret dikir. Hela tew îjar sêwîmayîna Memoşê me yê yek salî! Bavê minî ku ewqasî hesreta wî kişand û têr pê şa nebû, gula ber dilê xwe têr bêhn nekir…

Ez Memoşê xwe digrim û diçim cîhekî sakîn û têra xwe hêsra dibarînim. Ev zarokê yek salî qet bi me'ne nedikir ev girî û hêsir barandina min. Li hember vê rewşa min, dilê wî yê biçûk dişewitî û bi destê xwe yê biçûçik hêsrê ku li ser gepa min diherikî paqij dikir. Ji vî halê ku ez tê de me, ew jî 'aciz dibû, ğemgîn dibû. Lê belê tiştê ku di dilê wî de bû nikaribû derxista der. Qet min nedixwest ku ez wî ğemgîn bikim, lê ev sêwîmayîna wî ya di yeksalîyê de dilê min dişewitand.

Di ser şehadeta bavê min re tam salek derbas bûbû. Di vê demê de nayê bala min ku însanek li mala me kenîya be. Me qet lezzet ji xwarin û vexwarina xwe nedistend. Tenê ji bo ku em li ser pîya bimînin û li hember vê êşa bavê me, em pê ji taqet nekevin, me dixwar. Pirê caran xwarina ku me herî zahf jê hizdikir, tevde dima û bi vî awayî me sifreya xwarina xwe radikir. Ew zemanê ku bavê me bi me re rûdinişt û şîva êvarê dixwar, ji me re bûbû xeyaleke herî bi êş û ğem.

Me fotoğrafê bavê xwe bi dîwêr ve daliqandibû. Wêneyê wî yê bixwîn yê di heyama ku tê de şehîd bûbû… Roj tunebû ku me hêsir nebaranda. Jixwe dayika mina ketûm û bêdeng, qet ne dipeyivî û hêsrên wê herdem diherikîn.

Carna digot: “Ger min rojekê ji bavê we, gotineke dil pê dişkê bihîstiba an jî diltengîyeke wî, dibe ku ji min ra biba tesellî.” Û behsa wê heyata ku bi bextewarî bi wîre derbas kiribû dikir û piştî van gotinan hêsrên wê weka çeman diherikîn.

Min gomlekê bavê xwe yê bi xwîn, li ba xwe veşartibû. Timî çavê min li demek û cîhekî sakîn bû ku ez wî derxim, bi ser çavê bidim û maçî bikim, maçî bikim… Dema ku min bêhn dikir, bi min weka bêhna wî ya roja ewil jê dihat.

Eqrebayên me, çav berdabûn serweta bavê min û zû tevgeriyabûn, hatibûn min bixwazin. Lê piştî şehadeta bavê min, zewac qet di hişê min re derbas nedibû. Lewra ji dinyayê êdî tu hêvîyamin nemabû…

Niha jî fikreke wisa ku hat eqlê min, qet ez nizanim bê ka ji kuve hat, bi carekê ve ez hemî pêçam û xistim bin tesîra xwe.

“Bi îzn û destûra Xweda, şehîd dikarin li eqrebayên xwe yên nêz şefaetê bikin.”

Min ev jî berî niha ji bavê xwe yê şehîd bihîstibû… Ev fikra ku meriv xanima şehîd be, wê meriv pir bi îmtîyaz û cûda be, êdî di zîhnê min de tam cî girtibû. Car car min li dîya xwe dinihêrt û min xweziya xwe pê dianî. Belkî min ji wê ziyade ku dîya min ne di şiûra wê de bû ğipta dikir; Ger bavê minî şehîd, heqê xwe yê şefaetê yê 'ewil ji bo dîya min bîne cî…Min tim ev difikirî.

Êdî li ber dayika xwe, ne ji bo ku hema dîyamin e, herî zêde bi sedema ku xanima şehîde, ez jêre rêzdar bûm. Hema kêlîkekê jî ji ber çavê min biçûya, ez 'aciz dibûm, tebatî nedihat min.

Piştî şehadeta bavêmin, ez fikirîm û min got ku ez ê heyata xwe ji bo xuşk û birayên xwe nezir bikim. Terbîye û edeba ku min ji bavê xwe hilanîbû, minê hînî wan jî bikira û ew bi vî awayî mezin bikirana. Bi taybetî jî gula malê, hezkiroxê berdilê bavêmin û memoşê me yê ku wê di pêşerojê de bibe reîsê malê, birayê minê kur yê 2 salî ye…Hewceye ku min ew bigîhanda û mezinbikira.

Bi mehan min li ber te'deya eqrebayan di ber xweda. Ez li hemberî daxwazên wan sekinîm û min qet serê xwe li ber wan netewand. Lê belê êdî tu çareya min nemabû. Êdî ez pir dixwazim bibim xanima şehîd, ev fikr û daxwaza min jî, ji wê demê û pê ve dest pê kiribû. Min biryar da ku ez ê bi hevaldozekî bavê xwe re bizewicim. Him bi vî şeklî, ezê hemû dezgahê eqrebayên xwe jî xera bikim.

Eqrebayên min, hineka ji wan weha digotin: “Keçê, ma qey tu dîn bûyî? Wê evana hemû rojekê tev bên kuştin. Tê di vê ciwanîya xwe de jinbî bimînî. Bera pozê te, ji yê dayika te bişewite. Him evana tev feqîrin, ji çûna bavê xwe 'îbret bigre!”

Min ji van hemî gotin û peyvan fêm dikir ku birastî jî ev doz û de'wa Xweda, yek ji gomlekê êgire. Ê jixwe me ev îşlik carekê li xwe kirîye. Êdî bi şûnda derxistin tuneye. Min di vê rêya de gula berdilê xwe, bavê xwe yê herî bi rêz û qîmet daye, feda kirîye. Ji bo ku ez bi kesekî vê dozê bimeşîne re bizewicim, min biryara xwe sağlem kir.

Di coğrafyaya me de, her rojê di mala muslumanekî de şîn hebû. Bi sedem bawerîya xwe her rojê muslumanek dihat şehîdkirin û ber bi meleê e'layê ve bi rê diket. Ew kesê ku ezê pêre bizewicîyama jî, dibe ku di heman demê de bihata şehîdkirin. Meriv bûbaya xanima şehîdekî, Xwedê zane ya… Belkî min ev daxwaza ji bo ku ez bighêjim bavê xwe, bi wê hesretê min dixwest. Bi vî şeklî jî ez difikirîm ku ezê hê bêtir nêzî rehmet û 'efva Xweda bibim.

Wan însanên ku de'wa bavê min, bi bihayê canê xwe didomandin…Ew kesên ku xwîna wan li 'erdê nedihiştin, ji herkesî bêtir nêzî me bûn. Ne bextewarîya xwe tenê, ez bextewarîya wan 'egîdan difikirîm û di wê dewrê de xuşkên fedekar ên weka min difikirîn jî gelek bûn. Ev xuşkên ku guh nedidan pere û pûlan…

# Zîyaretgehên Me




✍ Kerbela Şanlı

Bınavê xweda. Selat û selam li ser ronîya ç'ava. Gelî dostû bıra û xwendevanên hêja! Welatê meyê Kurdîstanê gelek kûre, weke deryakîye, pir tıştên xweş û baş dı xwede hebandîye. Xwey gelek reng û rewşe, gelek cîhên wîyên pîroz û mübarek hene. Gelek zat û weli têde razandî hene, gelek dost û qencê xweda lê paldaî hene, nexasım gelek sehabe baxusûs pêxemberên xweda lê henîn. Weka pêxemberê xweda Nebî Nûh (as) lî Cızîrê (Cizre) û Nebî Zulkıfl û Elyes'e lı Êgla Amedê (Egil/ Diyarbakır).

Lê belê welatê me tevlî van reng û xweşîyên xwe welatek gelek pır bê xwedîye/bê xwedî maye, bı her hawaê xwe ev dewlemendî lı kurbana vêga wê Dınya pê bı hesîya û zanÎbana lê mıxabın sed mıxabın hê gelek welatîyên nêz ji van zîyaretgah û zata bê xeberın.

Mesela; cîhkî weke Amedê (Dîyarbekîr) ji 27î zêdetır sehabê lê radızên, di şunaku bivî 27 heb sehabîyî –weke Suleymanê kurê Xalıdê kurê Welîd û hevalên wi- bê naskirin meşhûr û navdarkırın, lê me'elesef tu dınêrî bı çend heb zebeşî tê nasîn, Ev Jî bı zanebûn tê kırın, evjî hîle û pîlanên kufrêne neyaran daîma xwestîne ku bene navbera me û sehabîya ji hev bibirib û bı qetînin û em wan jibîr bikin, şopa wan taqip nekin cahîl û nezan bımînın, da ku neyar karıbın me bı hêsanî bı qurtîne, an me lı pey 'urfu çanda xwe geni bı meşînın an me bıke kole û xızmetkar me ji xwere bı şuxulînin…

Belê dıvê mıjara xwe de emê lıser zîyaretgahên günde PİRXAK bi zazatÎ PÎRXEKON xeberbıdın. Ev gûndê bı pîranê dıkeve. Gelê herêmê tev zaza ne. Ev zîyaret dı rojên paşî ji meha gulanê pêk te hanîn. Dıvê zîyaretêde dostê xweda Seyyîd Şerîf radızê.

Jıberku emjî bı komela evîndarên pêxember ve gırêdayî bûn û lıwan derû dora me mewludên pêxember (as) lıdar xıstıbûnû gel bı hezaran tevlî van bernameyan dıbûn. Gundê Pîrxakîya em da'wetkırın û xwestın em vê zîyareta gûndê wan bı qelıbînın sôhbet û qesîde, zıkr û selawatan, mejî gotına wan neşıkand emjî çûn gûndê wan –jıxwe em tıştekî wer dı gerîyan- cîyê zîyaretê lı roj avayê gûnd lıser gırekî bılınd û mezıne û bıqasî kilo metrekî zêdetır jı gûnd düre.

Welatême jı ber kû hım muusulman bûn hımjî Kûrd bun zede zulm û zordestî lê hatekırın, hate 'ecıqandın. Ew jı 'urfû 'edetê xweyê Îslamî hatîn durkîrîn. Jî bervê gele me xwe parîkî bı alî 'urfû kevneşopîyên ğeyrî Îslamî ve kışandın weke 'urfû 'edetên ku lıvê zîyaretgahê de, zîyaretvanên mer û jîn xwe jî hevna parêzîn, hınek têvlî hevî heye.-Em bawerîn bere bere wê van 'edeta rabe Înşaallah-

Berîyaku zîyaretvan werın zîyaretê çend roj berê xwe amade dıkın, jı cilû berga jı xwarın û vex-warına –wek mehîr û gırar û kıbab û dew vs.- jiber ku dı fîrea gelê Kurd de camêrî û merditî heye gele derdor ku xelkê ji dûr hatıbûn ew dı êziübandın û mêvan perwerîya xwe dıkırın nan û av dıdan zîyaretvanên dûr.

Ya muhîm/gırîng dema meriv jorda lı zîyaretgah û zîyaretvana meze dıkır ev tıst dıhat ber zêhn û

'eqlê meriv û weke sûretekî/fotrafekî dıhat pêş û ber çavê merıv ku Welatê meyê Kurdistanê gelek pexember û sahabe û tabı'în, meşayız û 'alım bı cîhkırî û hebandîye. Gelê meye Kurd jî pir weli Kutb, Sadat û Seyda daye rakırın.

Û ev zîyaretgahên me dıde nîşandayîn ku xelkê me çıqas qîmet û rûmetê dıde ehle 'îlmê, seyda, ewlîya û meşayîxa û gele herêmê çıqas bidinê xwe, kıtêba xwe û çanda xweya Îslamî ve gırêdaî ve ye.

Jî evîndarên pexember êku em çûbûn wûr tevi hunermend û dengbêjên xwe. Kekê Bîlal, Veysî, Cahît û Musab, ku îlahî û qesîdeyên xweyê xweş dıgotın mıllet dıanîn cezb û coşê pıstra îmkan û fırseta sohbeta mejî çêbû. Em dıkarın bêjın evîndarên pexember(as) bıwê bernameya xwe gelê xweyê dîndar (kurd û zaza) zîyaretvan mest û heyran hıştın sekna mılletê bı se'eta kıser lınga gôhdarîkırına wanê bı eşqû şewq dıda fêmê ku gele meye musluman weke erda havine a gelışî û terıkî çewa muhtacê avêye evjî bı wî hawî tîyê îslamê u berdewarê muslumanê ğîretkêşe ku bı destê wan bıgrın…

Yek ji 'edetê vê herêmê û zîyaretê "Qamçî" ye. Şerê bı qamçîya kevneşopîyeke wanê pır kevne.lıgor gotına extîyarên wan ev 'eden dıdema osmanîyade hebûye û dıdome, extîyarekî wan dogot "Ez bı xwe çıl (40) sale qemçîtîyê dıkım û berîya mın jî ev 'edet hebu".

Dema Qamçî tê gotîn meriv dıbêje qey çend meriv lı zîyaretê li hev dıcıvın û çend qamçîya lı hev dıdın û hew. Na, ev qamçîtî wek pêşbirkekîye mılletê heremê dınav xwde çê dıkın.

He berîya roja zîyaretê mıllet jibo pêşbırka bı qamçîya amadehîya xwe dıkın, pêşyê qamçîyê xwe li hev dı êdilînin.

Qamçî ji pota çê dıkın, dıhûnın, gırêka lê dıdın, jibo ê hember xwe pis bıhêşînin jı êvarda wê qamçîyê dixine sîravka xwê, paşê tên zîyaretê qada şerê bı qamçîya, lı meydana ku jibo şer hatî amadekırın dora bêncsed (500) însan liha dicivin û weke xelekê helqekek mezin gırêdıdın, (xelkê tên wê sehê pırê wî şervanin) paşê cîhê şer paqij û rast dıkın lihev di 'edilînin û kevıra jê hildiçının şerdanê sibê dest pê dike nîvro xelas dıbe belê şervan û terefdar bi heyecan û coşek mezın lı rû hev sekınandîne. Şervan hinek jinave û qame sırf tazîne hınek ji atlet tenê lıwane, paşê hakemek 'adıl û bêteref tê , hılbıjartin, paşê şer destpêtê kirin û şervan yeko yeko dıkevın berhev û şîrqû şîrq şîrqû şîrq bıwan qamçîyê hışk wek kevır lı hev dıxın. Kî jiber kî bıreve ê revok meğlube. Bıvî rengî bı se'eta lıber tavê, dıkevın ber hev. Pêşbırk gelek bı heyecane, dema qamçî bıkeve 'erdê an yek jıwan bıreve hakem wan dıde seknandın û jı herdu terefa pêşbırkvanek dın bılez û bez weka gura dertê hole û radıhêje qamçîyê û ew dı gûrmînın û dı repînın dı şerqînın dı hevde, bıvî hawî hevûdın mehf û perişan dıkın – merıv nizane jıvî halê wan re bıkene an bıgrî ¬– heta ev pêşbırka be însaf pırê cara dıbe sebebê kîn û nefret û neyartîyê. Ev 'edet lı zîyaretgahên cîwar/derdor jî hebûye lê jiberku carek bûye sedemê kuştınê hatîye hilanîn, lê me'elesef ev 'edet hê vê zîyaretgahe heye.

Ji xwe yek jı hedef û meqsedameya ku em çûbûn wûr ku em van 'urfû 'edetê ku ne ji îslamêye em rakın, bıdın rakirin, heta dı sohbeta xweya wurde me ji gelê wur û şervanara ev got " Çıma em lı hev dıxın, hevdu dıheşînin eger em d'ewa mêrani şer û mêrxasîyê dıkın ha neyarên me vane lı hember me meydanê dıxwînın, neyarême îsraîle, Yahudîye, Emerîqaye... ê ku hun d'ewa şer û meranîyê dıkın em we d'ewetî van derê han dıkın…

Hevîya me jı Rebbê 'Alemê eve ku me û gelême İslah bıke, Şû'ûrû fehma îslamî bıde me û me jıvê xewa gıran hışyar bıke. Amin.








# EY 'HEBÎBÊ QELB Û RÛ'H

Sîye'hpûş

Ey 'Hebîbê qelb û rû'hê wey qerarê canê ma
Dê çi bîtin carekî ger tu bibî mêhmanê ma

Bêy ser çavê mi rûnî menzeret qelbê mi bî
Ez ğûlamê kemtirîn bim her tu bî sultanê ma

Sed wekî 'Îsa û Eflatûn û Calînos Hekîm
Çareyê derdê me naket bê te ey Loqmanê ma

Qelb û dil mecrû'hê 'eyna eswed û birhê te ne
Nîne bê cama meyê qet merhem û dermanê ma

Torî Sînaya dilê min  daîma 'erşa te ye
'Ehdê çil rojê temam kir Mûsayê l-Îmranê ma

Çav di rê da kore bûn Ye'qûbê ez beytîl 'hezen
Qet nema carek xuya bit Yûsûfê Ken'anê ma

Ez esîrê qeyd û bend û zulfê zincîrê te me
Re'hmê kun tu ba esîran ey mehê tabanê ma

Qet nema Hudhud xuya bit pêşê Belqis ez Seba
Pê muferreh bit Suleyman mutme'în bî canê ma

Sohtim ez narê fîraqê mujdeya weslê nehat
Ku ji wî şem'ê munîr bit zulmetê eywanê ma

Zulf û xalên mahê rûyan çoq Sîyehpûş edeler
Qorqarim ben qere olse çadir û seywanê ma





# DI ZIMANÊ KURDÎ DE ERGATÎF Û SALIXNAV

Cewat QEMERÎ

Herwekî ku tê zanîn zimanê Kurdî zimanek İranî ye. Zimanên İranî jî beşek ji beşên zimanê Hînd û Ewrûpaî ne. Zimanzanan di dabeşkirina zimanan de nêzikbûna ji hêla binyadê ve wek qaîde pejirandine. Ji ber ku zimanê Kurdî ji hêla binyadê ve bêtir nêzikî zimanê İranî ye zimanzanan zimanê kurdî wek şaxek zimanê îranî hesibandine. Li gorî ku Feqî Huseyn Saxnıç dibê:

Koka zimanê Kurdî û Farisî di zimanê Pehlewî de li ser zimanê avestayê dighê hev.

Piştî van agahîyên Kurt û kin, dibê em bên ser mijara xwe ya ergatîfê. Ergatîf peyveke Yûnanî ye. Mana wê ya di zimanê Yûnanî de xebitandin û bikar anîne.

Her weki ku tê zanîn di temmamê zimanên ergatîf de di temmamê deman de fê'l û fa'il li gorî bireserê (bar) di guherin û tên tewandin. Lê ji ber ku zimanê Kurdî zimanek nîv ergatîv e tenê di dema borî de , di hevokên gerguhêz de fê'l û fa'il li gorî bireserê tên tewandin û di guherin.

Di zimanê Kurdî de giringîya ergatîfê bê nîqaş e. Lewra rast fêmkirin û standardîzasyona ziman, di warê bikaranîna ziman de xalekî gelek muhîme. Em dê li jêr bi çend mînakan vê heqîqetê rast bidêrin ku zimanê Kurdî, nexasim Kurdîya Kurmancî zimanek ergatîve. Û bê ergatîvê wê metn û axaftin şaş bên fêmkirin.

1: Nêçîrvana şêr kuştin.

Eger em bi mantalîteke rasterast li vê hevokê mêzekin. An jî di televîzyonê de nûçevanek vê hevokê di gel wêneyan teqdîmî me bike, emê bi zanibin ku nêçîrvana çend şêr kuştine. Lê belê eger em vê hevokê di nav metnek Kurdî de bixwînin, emê bejin qey ku nêçîrvana koka şêra anîye. Û yek şêr li ser rukê cîhanê nema ye. Ev yek bi me dide zanîn ku di zimanê Kurdî de nebûna ergatîfê dibe sebebê şaşiyek mezin. Bes eger ev hevok li gorî qaîda ergatîvê wihareng bikar bê, êdî şaş fêmkirin ne mimkûn e.

Nêçîrvana şêr kuşt. Îdî kî çi wextê li kurdê vê hevokê di xwîne an dibhîze ew zane. Îdî wê herkes yek maneyê ji vê hevokê fêm ke.

2: Cewdetî kitêb xwendin (Em ji vê hevokê fêm dikin ku Cewdetî gelek kitêb xwendî ye. An jî jimara kitêbên ku wî xwendiye ji yekî zêdetir in.)

Cewdetî kitêb xwend. (Di vê hevokê de jî aşîkar e ku Cewdet bi tene yek kitêb xwendî ye.

3: Me ew dît.(Kesê ku em dibinin yek kes e.)

Me ew dîtin (Kesê ku em dibinin pirhejmar in)

4: Min masî girt (Xwîya ye ku min yek masîkî girtiye.)

Min masî girtin (Min gelek masî girtine)

5: Avê newal şûşt (Di vê hevokê de newala şûştî yekhejmar e.)

Avê newal şûştîn (Avê gelek newal şuştî ye)

Herwekî ku di mînakên jorîn de jî xwîya ye ergatîfîya zimanê Kurdî aşîkar e. Bê bikaranîna ergatîfê rastfêmkirin û sitandardîzasyona ziman ne mimkûn e.Lê dibê em bizanibin ku zimanê Kurdî zimanek nîv egragtîf e.Tenê di dema borînde di hevokên gerguhêz de fê'l û fa'il li gorî bireser(bar) diguherin.

Dİ ZIMANÊ KÛRDÎ DE SALİXNAV

Salixnav: Ew peyvin ku salixê reng û şekl û şemalê nava pê tê dayîn. Salixnav bi navan ve girêdayî ne. Wek mînak:

Gayê beş, Tirêna reş, Mirovê exlaqxweş, 'Ewrê sipî, Nanê germ, Goştê nerm, Kêra tûj, Dînê mubîn, Berfa Sipî, Zivistana sar, Mirîşka kor, Dîkê Sor, Tayê mor, Canîya tor, Kewa gozel, Goyê bel……

Herwekî di mînakan de jî xwîya dibe, salixnav piştî nav tê û nava ji hêla reng û şekl û şemalê ve dide naskirin. Ji lew di hinek grameran de wek nasnav jî tê binavkirin. Salixnav ji hêla binyad û wateyê ve wek du beşa tên dabeşkirin.

1- Ji Hêla Binyadê Ve Salixnav: Salixnav ji hêla binyadê ve wek salixnavên xwerû, salixnavên dariştî, salixnavên hevedûdanî, salixnavên hevedûdanî û dariştî li ser çar şaxa tên dabeşkirin.

A: Salixnavên xwerû : Ev salixnav besît in. Ji yek kokekî pêk tên.Û bi wesîla qertafan ji peyvên dî pêknehatine.Wek mînak:

Kor: Mirîşka kor naçe koxê

Biçûk: Xort ji texsîya biçûk hes dikin

Mezin: Zanîngehên mezin li Îstenbolê ne.

Tor: Canîya tor naçe bara.

Delal: Dergûşa delal li mal e.

Dema em di van mînakan de li van salixnavên xwerû mêzekin emê bibînin ku koka van salixnava yek peyveke besit e.

B: Salixnavên dariştî: Bi kêmtirîn ji peyveke bi wate û pêşqertaf an jî paşqertafekî pêk tê.

B.1: Hinek pêşqertafên salixnavê dariştî ev in.

Ber: Sêwîyê berdest bê çare ne

Li: Peyva lirê kesî naşkêne.

Bê: Kûrê bêxêr mala bavê dibe ber mîratê. / Kesê bêkesa Xweda ye. / Mala bêmala xirbê xalîye./ Mirovê bêkêr ji tiştekî re nabin.

Bi: Bizina bigoşt biha ye/ Sermiyanê bixêr 'îlm û îrfan e/ Mirovê bikêr nanê xwe ji kevir derdixe./ Zevîya biav ji a bêav çêtir e.

Hev: Ehmedê hevkar çû, nave nebaş ma li dû./ Heywanên hevreng dişibhin hev./ Kesên hevçax ji hev fêm dikin

Hem: Kesên hemderd bi serê hev de dixwînin / Ahmed û Mihemedê hemderd çûn ba qadî lê tu çarekî ji derde xwê re nedîn./ Zanayên hemdem di bin bandora demê de dimînin.

Jê: Keçika jêhatî di nav refê keça de kifşe.

Ne: Parîyê nebaş para nezana ye./ Kesê nezan têrnaxwe nan / Pisîka nexweş dinale.

B.2: Hinek paşqertafên salixnavê dariştî evin:

-a: Hespa beza, Mirovên zana

-al: Zarokê delal, Mirovê heval

-ek: Hevalê virek mala xwe jî a mirov jî xera dike./ Pisîka newêrek ji mal dernakeve./ Mitribê parsek bê şerm e.

-ik: Keçika xweşik, Dergûşa rindik, Dinya gewrik

-kar: Xortê xebatkar, Gundîyê cotkar, hevalê alîkar, mirovê riyakar

-van : Xortê gavan, Mêrê nêçîrvan, keçika bêrîvan, lawikê notirvan

-dar: Xortê evîndar, Leşkerê birîndar, tucarê maldar, sêrbazê remildar

-baz: Rovîyê fêlbaz, sextekarê hoqebaz

-bend: Hunermendê sazbend, Ehmedê nalbend, Reşîdê solbend

-yar: Însanê hişyar

-iyar: Hunermendê bextiyar

-mend: Tucarê dewlemend, însanê ‘aqilmend, keçika hunermend

-în: Kevçîyê darîn, dasa hesinîn, kuçikê kevirîn, bextê derewîn, gula rengîn

-kî: Zimanê Kurdkî, Zaravayê Kurmanckî, Zaravayê Kirdkî/ Dimilkî

**C: Salixnavên Hevedûdanî:**

Ev cûreyên salixnava kêmtirîn ji du peyvên watedar pêk tên. Mimkune ku salixnavê hevedûdanî an ji  nav û salixnavekî, an ji salix û navekî, an ji du nava, an jî ji nav û daçek û navekî pêk bê.Wek mînak:

Xewna ğemrevîn, hevalê  xêrxwaz, xortê karker, çavê mêrkuj, mehkûmê rêbirr, dergûşa şîrmêj, gurê xwînxwar, zanayê dûrbîn, pîrika çîrokbêj, şakirê dengbêj, rovîyê dûv dirêj, kûçikê gurxenêq, tucarê zembîlfiroş, pisporê zimanzan, hevalê xêrnexawz, teyrê perşikestî, keskesora heftreng, teyrê gerdengaz, emirkinê bextereş, mêrê mêrxas, nexweşê esrarkeş, şervanê şûrkêş, bêrîvana bizindoş, nexweşê çavlirê.......

2: Jı Hêla Wateyê Ve Salıxnav: Di gramerên Kurdî de salixnav ji hêla wateyê ve wek salixnavên wesfî û salixnavên diyarî li ser du beşa tên dabeşkirin.

A: Salixnavên Wesfî:  Di vê babetê de salixnav wesfê nava bi şekl û şemal û sekn û rewşê bi me didit naskirin. Wek mînak:

Mamosteyê jîr, karkerê jêhatî, mêvanê hêja, agirê sor, asîmanê sayî, çiyayê bilind, zivistana sar, havîna germ, goştê nerm, kerê guhdirêj, hespê rehwan, gaye beş, giyayê şîn, ‘ewrê sipî, roja ronî, şeva tarî, bejna zirav, sêva sor, porteqala zer......

Eger em li van mînakên jorîn mêzekin emê bibinin ku salixnav di vir de ji hêla rewş û şekl û şemalê ve nav bi wesfê wî bi me dide naskirin.

B: Salixnavê diyarî:  Ev salixav ji hêla reng û awa û şekl û îşaret û pirsê ve salixê nava dide. Salix navên diyarî piştî nava tên . Di vî babetî de salixnav wek salixnavê îşarî, salixnavê pirsî, salixnavê hejmarî, salixnanvê nediyarî, salixnavên wekhevî û salixnavên pêwendî, salixnavê serdestî û pîleyî li ser heft şaxa tên dabeşkirin.

1: Salixnavên Îşarî: Berya nava tên û bi îşaret salixê nava didin. Ev salixnav wek nav û cînavkan ditewin. Wek mînak:

Ev: Ev şêr, ev mêr, ev kêr, ev pisîk, ev ga, ev gamêş ev nêrî, ev berxik, ev kar, ev kur, ev kejik, ev xweşik, ev jin

Tewang: Vî: Vî şêrî, vî mêrî, vî gamêşî, vî karî,

Vê: Vê şeve, vê berxê, vê kare, vê kêrî, vê çerxê, vê behre, vê sêvê, vê bizine

Van: Van şevan, van berxan, van çerxan, van behra, van kêra, van sêva, van bizina

Ew: Ew çiya, ew heval, ew bajar, ew şêr, ew şar, ew hinar, ew mar, ew har, ew fîl, ew gund, ew mêrg, ew kanî, ew zozan, ew mil, ew banî

Tewang: Wî çiyayî, wî hevalî, wî bajarî, wî şêrî,

Wê: Wê hevalê, wê hinarê, wê şarê, wê mêrgê,

Wan: Wan gundan, wan hevalan, wan hinaran, wan şaran, wan mêrgan, wan bajaran, wan maran, wan fîlan, wan zozanan

2: Salixnavên pirsî: Bi saya qertafên pirsî yên salixdanê ê wek -çi, -kê, -kîjan, -çiqas û -çend wek sual salixdana nava tê xwestin. Wek mînak:

Çi şêr e ? Çi karî dike ? Çi tişt bû ? Çi tişt çû ?

Di gulaşê de kîjan pehlewan têk çû ?/ Kîjan xort delal e.

Çiqas nexweş di neweşxanê de ne?/ Çiqas birinc lazim e?

Çend berx li çolê diçêrin? Çend xort di gund de hene?

3: Salixnavê Hejmarî: Ev salixnav ji hêla jimarê ve salixê nava didin. Mirov bi saya van salixnavan jimara nava fêr dibe. Ev jî wek salixanvên hejmartinê yên bingehî, salixanvên hejmartinê yên rêzî û salixnavên hejmartinê yên dabeşî tên dabeşkirin.

A: Salixnavê Hejmartinê ê Bingehîn: Hejmara navan rasterast beyandike. Wek mînak:

Sê dar, çar kevir, deh mêr, du şêr, çar doxtor, şeş gund.......

B: Salixnavên Hejmartinê yên rêzî: Ji hêla rêzê ve salixê nava didin.Wek mînak.

Kitêba pêncemîn, nanê şeşemin, xortê dehemîn, mala yekemin, dîkê çaremîn, Mûradê çaremin, sala bîstemîn….

C: Salixnavên Dabeşî: Awayê parvekirina navan beyan dike. Wek mînak:

Nîv zebeş, şêstyek sêv, çaryek saet, şeşyek purteqal, ji heftê du kundir...

4: Salixnavên Nediyarî: Bi van salixnavan baş kifş nabe bê ka nav çawan e. An bi çi şeklî weya çiqas e. Wek mînak:

Hinek dar, çend kes, piçek av, herçî bajarî…. hwd.

5: Salixnavê Wekhevî: Wek qam û bejn û giranî û pîvan û reng wekhevîya navan beyan dike.Wek mînak:

Şûrê min biqasî ê te tûj e./ Sêva Hesen wek sêva Heyder e./ Nanê te û nane wê wekî hev germ in./ Dirêjîya Salim û Salih yek e.

6: Salixanvên Pêwendî: Bi saya qertafa pêwendîyê pêwendîya navan beyan dike. Wek mînak:

Cewdetê Qemerî, Ehmedê Xanî, Kurdên Hewlêrî, Zarokên Amedî……ev herfên î tev qertafên têkildarîyê ne.

7: Salixnavên Serdestî û Pîleyî: Ji hêla serdestî û meznahî berzkirinê ve salixê nava dide. Wek mînak:

Çiyayê Agirî ji çiyayê Nemrûd Berztir e./ Ehmet ji jina xwe kaltir e. /Ya mezin jîrtir e./ Dostanîya qencan qenctir e/ Xortê herî çeleng Rustem e./ Tiştê şîrîntirîn peyva qenc e.

## ENCAM

Herwekî ku di mînak û şîroveyên jorîn de jî ‘eyan e, salixnav û ergatîf di zimanê Kurdî de du xalên girîng in. Lazime rast û di cihê xwe de bên bikaranîn. Di warê standardîzasyona ziman de jî dibê di vî warî de tifaqek çê bibe.

Ji ber ku zimanê Kurdî zimanek nîv ergatîf e di dema borîn tenê de fê’l (barbirr) li gorî bar (bireserê) tên kişandin û di tewin. Her wiha bargir (biker) jî di dema borî de li gorî fêla gerguêz di guher e. Ev xusûsîyteteke zimanê Kurdî ye. Û zimanê Kurdî ji zimanên dî vediqetîne.


**ÇAVKANİ**

1:Kadrî yıldırım (Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi)

2:Murat Ciwan (Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbîlgiisi)

3:Feqî Hüseyîn Sağnıç (Dîroka Wêje ya Kurdî)

4:Celadet Bedîrxan (Elîfba û Gramer)

5:Samî Tan (Rêzimana Kurmancî Pdf)

6:Qanadê Kurdo (Rêziman)


*1 Ciwan Mûrat Türkeçe Açıklamalı Kürtçe Dil Bilgisi. Rûpel 16

*2 Ciwan Mûrat Türkeçe Açıklamalı Kürtçe Dil Bilgisi.Rûpel 16

*3 Sağnıç Feqî Huseyîn. Dîroka wêjeya Kurdî Rûpel 31

*4 Di gelek kitêbên gramerê ê Kurdî de pêyva fê’l wek lêker, a fa’îl jî wek bikerê tên bikaranîn. Lê qenaeta min ewe ku ev bikaranîn şaş e. Lewra hem ev peyv di hevokê de naherikin. Hem jî peyva fê’l û fa’il ji teref gel ve hatiye pejirandin. Û ji hezar salî zêdetir e ku ev peyv di nav gel de tên bikaranîn. Ji lew min di vir de bi zanîn, peyva fê’l û fa’il bikar anî. Qanadê Kurdo jî wek me fikiriye û di gramera xwe de peyva fê’l bikar anîye.Ne a lêkerê.Lê eger îlla em li peyvên Kurdî bigerin dibê em di dewse peyva fê’l de barbir, di a fail de bargir, di a bireserê de bar bikarbînin.

*6 Di gelek gramerên Kurdî de li ser binavkirina sifetê navan tifaqek qewî nîne. Wek mînak Celadet Bedirxan wek rengdêr, Qedrî Yıldırım û Mûrad ciwan wek hevalnav,Qanadê Kurdo wek xeysetnav,Mehmet emîn Bozarslan jî wek salixnav bikaranîye. Me divir de bikaranîna Bozarslanî pejirand û bikar anî. Lewra mexsed ji sifetê salixdana nava ye. Li gor qenaeta me ev bikaranîn bêtir di cîh de ye.

*7 Yıldırım Qedrî Temel Alıştırma ve Metînlerle Kürtçe Dil Bîlgîsî Rûpel 248

*8 Mûrat Ciwan vê babetê wek hevalnavên besit bi nav dike

*9 Mûrat Ciwan vê babetê wek hevalnavên pêkhatî bi nav dike

*10 Qanadê Kurdo peyva qertafê wek pirtik bi nav dike. Eger em bi ya Qanadê Kurdo bikin, dibê em bejin paşpirtikên salixnavî. Bnr. Qanadê Kurdo Zimanê Kurdî. Rêziman. Weşana Komkar Rûpel 57

*11 Digel ku nivîskarên Gramera Kurdîya Kurmancî Qedrî Yildirim û Samî Tan vê babetê wek hevalnavên çawanî, Murat Ciwan jî wek hevalnavên pesindanê binav dikin jî ,ji ber ku ev salixnav nava bi wesfê wan bi me didin naskirin me ev salixnav wek salixnavên wesfî binavkir.

*12 Qedrî Yildirim di vê babetê vî salixnavî wek hevlanavê nîşanî, Samî Tan wek hevalnavê payeyi, Mûrat Ciwan jî wek hevlanavê diyarkirinê bi nav dikin. Me di vir de tarîfa Ciwanî bêtir pejirand.

*13 Tan Samî, Rêzimana Kurmancî rûpel 166

*14 Ji ber ku divir de dabeşkirin û parvekirina tiştan mewzûbehs e me divirde ev babet wek salixnavên dabeşî binav kir.

# SALIH BEGÊ HÊNÎ

# PROFÎLA REWŞENBÎREKÎ

'Ebdulqadir TÛRAN



Dîtina rewşenbîrekî xweşmîsal, ne rihet e. Li nav 'alema Îslamê rewşenbîrên gihayî, pir tune ne. Salih Begê Hênî, ji wan hindik rewşenbîrên gîhayî ye û rewşenbîrekî ji her aliyê ve kamil e. Ciwanên ji xwe re li rewşenbîrekî misluman digerin, ji bo wî dikarin bêjin: "kesê ez li digerim ew e."

Her term û îbare, li gorî kultura ku aydiyê wê ye me'neyan hildigre. Li Tirkiyeyê îbara "rewşenbîr" weka li ğerbê ji bo ehlê xwedî zanîn û tiştên Şoreşa Fransayê diparêzin nayê gotin. Ehlê çepgîr û lîberal, "rewşenbîr"bûnê weka "çepgîr"bûn û "lîberal"bûnê bi kar tînin, ji ehlê Îslamî tenê kesên ku di alema wan de akredîte bûne tevlî vêya dikin, ev jî karguzariya wan nîşan dide. Ev şol û tevgera wan, îşgalkirina term û îbareyan e.

Li nav alema Îslamê "rewşenbîr" bi me'neya kesê ku bi îlmê xwe amil e. Ferqa wê ya ji entellektuelê yan jî ji akademîsyenê medreseyê yê neaksiyoner, ew e ku entellektuel an jî akademîsyenê medreseyê yê neaskiyoner dibin xwedî zanîn, lê belê qebûl nakin ku zanyarî wan dikin xwedî mesûliyet.

Ji bo entellektuel an jî akademîsyenê medreseyê yê neaksîyoner, zanyarî zanîn tenê ye. Ew zanînê tenê dide kesê agahiyan jê dixwaze û heta di bedêla dayîna agahiyan de ucretê dixwaze. Zanîna wî wî coş nake, tew hîç nayîne ğeleyanê. Zanîna wî dengnekir e, li gorî menfîetê weziyetê hildigre, dizane li ciyê xwe bisekine.

Hal ew e ku 'alimê bi 'ilmê xwe 'amîl û zanîna kesê rewşenbîr çalak e, lebatkar e. Nahêle ku xwediyê wî li ciyê xwe bisekine. Tê gotin ku ji helbestvanên Tanzîmatê Ziya Paşa weha gotiye: "Ey 'eqlê min! Ya tu tuneba ya ez. Em her du li hev nakin" Zanîna rewşenbîr jî weka wî 'eqlî ye. Ew çiqas înkîşaf bike, rewşenbîr jî bawer dike ku mesûliyeta wî zêdetir dibe, rewşenbîr divê wî têxe hereketê.

Rewşenbîr xwe ji halê civat û milletê mesûl dibîne û rastkirin û edilandina wê rewşê, wezîfa xwe dizane. Ji vê hêlê ve li nav 'alema Îslamê rewşenbîrê heqîqî, warisê Hz. Pêxember('e.s) e.

Li nav 'alema Îslamê bi rastî "alim" tenê "alim" e. Ne hewce ye ku meriv wesfekî din bi wî ve bixe. Kesên di medreseyan de 'ilm tehsîl kirine û bi vî îlmê civat ronî kirine alim in û ev wesif ji bo wan bes e. Esil problem ew e ku ew ê ji kesên di medreseyan de 'ilm tehsîl kiribe, lê ji derdên mislumanan re li çareyê digere û di vî warî de xwedî zanîna hewce be re çi bê gotin? Yan jî kesên hem medrese xwendibe û hem jî ğerbê û ğerbiyan bizanibe? Ji wan re 'alim tenê bê gotin, carna problema t'erîfkirinê pêk tîne.

Salih Begê Hênî "alim" e. Ji bo mezinahiyê ev ji bo wî bes e. Lê belê di 'eynî zemanî de ew rewşenbîrekî heqîqî ye jî. Bi rastir ew bi wesfê xwe ya "rewşenbîr"bûnê, ji alimên hemdemê xwe cûda ye.

Dîtin û peydekirina rewşenbîrekî xweşmîsal ne rihet e. Li nav alema Îslamê rewşenbîrên gihayî pir

tune ne. Salih Begê Hênî ji wan hindik rewşenbîrên gihayî ye û bi her alîyê ve kamil e. Hinek rewşenbîr zêdetir nêzî mitefekîriyê ne, hinek jî ji mitefekîriyê zêdetir, zilamên hereketê ne. Lê Salih Beg… Hem medrese xwendiye; 'ilmên 'erebî, 'ilmên dînî yên bilind tehsîl kiriye û hem jî bi wasîteya kîtêb, kovar û rojnameyan, fikrên çaxê xwe şopandiye.

Hem xwedî 'îlmekî derûnî ye ku dikare li mehkemê bi weziyeteke hessas qiyama mezin bîne ziman û hem jî zilamê hereketê ye ku di dema qiyamê de dikare bibe qomandarekî leşkerî yê yekemîn wek "reîsê mucahîdan ê ewil"

29ê Hezîranê salvegera ku Kalê Şêx Seîd û 'alimên din û suleha bi dar vekirine. Mesaja qiyamê, rûhê qiyamê di îfadeya ku li mehkemê daye de veşartî ye. Li gorî Şêx Seîd ew bi 'ilmê di şûna çar stûnan de palpiştek e, liyaqî î'tîmadê ye(bi qasî ku pêbawerbûnê heq dike mezin e) Îfada Salih Beg a ku li mehkema ew dişandin daliqandinê dida, bi tena serê xwe mijareke tezê ye. Di vê nivîsê de hinek wesfên wî tên behskirin.

Salih Begê Hênî Kî Ye?

Serokê mehkemê dipirse, Salih Begê Hênî cewab dide:

- Te çi tehsîl kiriye?

- Min tehsîla 'ilmên 'Erebî, 'ilmên dînê bilind temam kir û bi serê xwe hinek 'ilmên fenî jî tehsîl kiriye.

- Tu kîjan zimanan dizanî?

- Tirkî, 'Erebî, Farisî, Kurdî, Zazakî û hinekî Frensîyê dizanim.

- Tu Frensî dizanî? Kitêbeke Frensî jî li cem te peyde bûye.

- Min terceme nekiriye, tercemeya Gulistanê ya Frensî hebû, min ew peyde kiriye.

- Tu Îngîlîzî dizanî û bi tu kesî re xeber didî?

- Min Îngîlîzî ji mamostakî Ermenî hinekî xwendibû, nikarim pê xeber bidim.

Û bi rastî Ermenîkî jî dizane ev zilamê bişaşik… Bi qasî ku berhema mezin a Gulistana Sadî ya bi Frensî bikaribe bixwîne Frensî û hinekî Îngîlîzî… Lê bi rastî 'alimekî serf û nehwa 'Erebî… Di 'ilmên Îslamî de 'alim… 'Ilmên fenê jî hîn bûye… Farisî baş dizane… Ew bi xwe Zazakî xeber dide, bi zaravayê Kurmancî helbestan dihûne…

Dibêjin ya… Ew ê Îslamvanan welat bi paş ve bibirana. Ger hûn Salih Beg û Îslamvanên wê dewrê bixwînin, hûn ê bibînin ku tam çewt û vajî vêya ye. Ji bona welat bi pêş ve neçe, Îslamvanan ji îktîdarê bi dûr xistin. Lewra wê demê rewşenbîrên ğerbperest ên herî jêhatî, li cem kesên wek Salih Beg, weke xwendekarekî lîseyê bûn. Fikr û asoya Salih Beg û rêhevalên wî ripîronî bûn, lê fikr û asoya rewşenbîrên din, bi hêviya ku ji rebbên Yewnanê agir hilînin û xwe pê ronî bikin, ewqas reşîtarî bûn.

Li gorî M. Şerîf Korkûsûzê ku di heqê 'alimên Diyarbekirê de li ser belgeyên arşîv lêkolîn kiriye: "Salih Begê Hênî di 23ê Cemaziyelê ewil a 1290î / 19ê Temûza 1873an de li Mehela Derîkam a Hênîya Diyarbekirê hatiye dinyayê (li gorî malbata wî di salên 1868-1869an de hatiye dinyayê.) Xalê wî Şêx Ma'rûf Efendî li Hênê muderrîs bû û ji şêxên Neqşîbendî-Xalidî bû. Salih Beg ji xalê xwe û ji muderrîsên din îlmê hewce tehsîl kiriye û ji Mela M. Zekî Efendiyê melayê camiya Balikliyê îcazeta xwe girtiye. Digel zimanên xwe Kurdî û Zazakî, Erebî, Tirkî û Farisî jî 'elimîye, paşê di sewiya baş de Frensî jî hîn bûye. Li Diyarbekirê, li Erğeniyê mamostetî û muderrîstî kiriye. Bi navê Mewlîda Hurriyetê rîsaleke wî heye ku îdara Îttîhad û Terakkîyê tenkîd û rexne dike. Demekê li mekteba Ruşdiyeyê ya Hênê xwendiye û dîploma wergirtiye, li vê mektebê dewrehevalê Ziya Gokalpê bûye. Paşê di dewrên ku di Ziya Gokalpê de guhertinên fikrî/aqîdevî çêbûne de, bi wî re niqaş kiriye. Piştî hedîseya Şêx Seîd, tewqîf bûye û digel Şêx Seîd hatiye îdamkirin."

Salih Beg jî wek gelek alimên Îslamê sêwî mezin bûye. Bavê wî Seîd Beg, hê ew 6-7 salî bûye, wefat kiriye, ji hêla dê ve kalê wî Şêx Ehmed Efendî ew xwedî kiriye. Tê rîwayetkirin ku Salih Beg, çaxa bavê wî defin dikin, digrî. Wê çaxê kalê wî Şêx Ehmed Efendî jê re weha dibêje: "Negrî Salihê min negrî, eger Xweda bixwaze, çawa ku Misir di nav şûran de meşhûr e, ew ê Salihê min jî roja mehşerê, di nav began de meşhûr be."

**REWŞENBÎREKÎ ZANA, ÇALAK Û MESÛLIYETA KARÊ XWE TÎNE CÎ**

Ji Malbata Şêx Seîd Ebdulîlah Firat Beg, di heqê mehkema Şêx Seîd û rêhevalên wî de, behsa agahiyeke ku zêde nayê zanîn dike:

Şêx Seîd bi hessasiyeta ku zayîat hindik be ji hevalên xwe re dibêje, "ji bo îfadeyê gazî we kê bikin, hemî mesûliyetê têxin stûyê min." Tev qebûl dikin, lê xizmetkarekî Şêx ê 'ewam û Salih Beg xarîç… Yek 'ewam, yek 'alim, ew her du jî weha dibêjin, "Şêxim!

Her emrê te li ser ser û çavê me. Lê em xêra xwe ya qiyamê nadin" û mesûliyeta tevgera xwe hildigrin.

Di kitêba Şevket Beysanoğlû ya Diyarbakir Tarîhî de, di cildê 3an de, di zabitnameyên mehkemeyê de tê dîtin ku kesên derketine pêş heyeta mehkemê, bi kurtasî îfadeke weha dane: "Şêx Seîd ji xelkê re digot hikûmetê şerî'et hilanî, em serê xwe rakin, dîsa şerîetê bînin. Bi vî şeklî em tevlî serhildanê bûn."

Lê Salih Beg, li ser pirsa "Ma Şêx Seîd hûn xapandin?" weha cewab daye: "Ez ne yekî wisa me ku bêm xapandin. Ne Şêx Seîd ba, ew ê yekî din vêya bikira." Li ser pirsa "Kê xelk li ber dewletê bi teşkîlat dikir?" jî weha bersiv dide: "Kesê ku ferd dicivandin tunebû. Min di her ferdekî de dilzîzî didît. Kesê pêşîvan tunebû. Paşê Şex Seîd Efendî hat, tesadufî ye."

Beriya îdamê ev helbestê dibêje û serbilind diçe bidarvekirinê:

"Gerçi enzâr-ı ahibbâdan dahi dûr olmuşuz (Her çiqas em ji nêrînên dostan dûr bûbin jî)

Rahmet-i Mevla'ya yaklaşmakla mesrur olmuşuz(Bi nêzbûna rehmeta Xweda em dilgeş bûne)

Bu dünyada müflis u harâb-hâne olduksa da (Li vê dinyê em muflîs û xanîxerabe bibin jî)

Bu harâbât ile biz, ma'nada ma'mûr olmuşuz (Bi vê xerabûnê em di heqîqetê de ava bûne)

Kul bizi zulmen mücâzât etse pervâ etmeyiz (Evd bi zulmê me ceza bike, em jê perwa nakin)

Şüphemiz yoktur ki, İndellah'da me'cûr olmuşuz (Bêşek em li cem Xweda bimikafat bûne)

Ehl-i Hakk'ız korkmayız i'dâmîden berdârîden (Em ehlê heq in, natirsin ji îdamê, ji sêpêyan)

Çünki, te'yîd-i İlâhî ile mansûr olmuşuz (Lewra bi tesdîqa Xweda em ğalib bûne)

Sâlihim, ehl-i salâhım Dîn'e cân kıldım fedâ (Salih im, ehlê salah im, ji dîn re can kirye feda)

Lutf-i Hâkk'la teşnegâna âb-ı Kevser olmuşuz." (Bi lutfa Allah em tîyên ava Kewserê bûne)

Tewreke liyaqî 'alimekî bi îlmê xwe 'amil û rewşenbîrekî heqîqî…

## REWŞENBÎREKÎ CIVATÊ NAS DIKE

Divê rewşenbîr yek dudu zimanên ecnebî bizanibe. Salih Beg gelek zimanan dizane. Divê rewşenbîr civatê nas bike. Salih Beg civatê bi xas û 'am û xwendî nas dike.

Ji bo têkiliya bi ehlên civatê re, zimanên dizane bes e. Lê belê ew bi vêya qîma xwe nayne. Têkiliya wî bi civatê re xurt e ku xelk dizane ew ê li ber tesîrekê çawa tevbigere, çi bike û çi neke. Jê zêdetir ew malbat bi malbat, şexs bi şexs civatê dizane û disinifîne. Li gorî wî 'alim hene û salih hene. Li Diyarbekirê gelek xwedîşaşik hene. Lê bi ya wî 'alim tenê Nakîp Bekir Beg heye. Ew bi şola 'alima ye û pir zêde salih e. Belkî ji bo wî xwedîşaşikbûn, nayê maneya 'alimbûnê. Divê hinek wesfên din ên 'aliman hebin. Kesên salih, ger 'ilmî nebin melcee jî, ehlê xwedî şiûra Îslamî ne.

Salih Beg, rojnameyên wê dewrê yên wek Hakimiyeya Mîlliye, Tewhîdî Efkar, Waqît dixwîne. Haya wî ji rojeva Tirkiye û dinyayê heye. Lê belê digel ku perê wî heye jî, ne aboneyê van rojnameyan e, ji bo wan pere xerc nake. Çawa derdora Stenbol, Enqerê ji rojnameyan dizane, Diyarbekirê jî baş dizane. Haya wî jê heye ku Diqtor Fûadê bi fikrên xwe yên modern tê zanîn ne şerîetvan e. Cemîl Paşazade dûrî salihbûnê ne û paşê jî tewreke dijberî Îslamê şopandine. Li ser pirsa ku ji bo wan gotiye "ji salihan e" dibêje "haşa". Tarîx îro tesbîtên wî yek bi yek tesdîq dike.

## LI GORÎ SALIH BEG ANALÎZA QIYAMÊ

Li gorî Salih Beg, tiştên ku şertên qiyamê amade kirine, tevgera hikûmetê ya li dijî şer'a şerîf e. Vê tevgerê tesîrek pêk aniye, hereketek derxistiye meydanê, pêşîvanên civatê ber bi bayê vê hereketê ketine, qiyam kirine, xelk jî bi ğeleyaneke tebiî tevlî wan bûye.

Ev analîza ku hedîseyan di çarçoveya sedem-encamê de bi awayê ecêbmayî beyan dike, kesên li ber şerî'etê rabûne wek sûcdarên esil îlan dike, xelkê jî li ber neserkeftinê derdixe derveyê pêvajoya cezayê.

Li gorî Salih Beg li ber tesîreke weha, bivênebê ew ê qiyam çê bibe û şert çawa bin bila bibin ew ê kesên wek wî difikirin tevlî qiyamê bibin. Di binê tesîreke weha de fikirîna li ser îmkan û netîceyan jî ne mijara axaftinê ye. Salih Beg dibêje "Sedema tesîrê, însên sewkî hinek rêyên ğeyrî me'qûl dike. Hûn dixwazin ku bi temamî mentiqî be, lê planeke me ya weha tune bû" û bi rastî dide zanîn ku qiyam, li ber ewqas êrîşên li ser Îslamê, mitleq mecbûriyeta nîşandayîna bertekê ye, yên din tev detay in, di vê mecbûriyeta mezin de, fikara li ser zerara ku bigihêje can û mal ne rast e.

Ev, ji bo balkişandina ser zerareke mezin, halê xwefedakirinê ye. Ew hal mecbûrî be, yê din teferrûat e. Ji neslên di pey xwe re, mesaja wî ya mezin ev e.

# GER NEBIT DIL

Mela 'Elî Bohtî

Dayîna ehlê dilan ger dil hebit
Ger nebit dil dê çikit dinya hebit

'Heyderê qadir li ser fetha cîhan
Îsm û cism nîne eger quwwet nebit

Xwtt û xalên li cemala te heyîn
'Elem in emma dibêm şu'le hebit

Zulf û biskê te ne sermeste kirin
'îde û sersale ger selwa hebit

'Aşiqên çeşme te ey naziketîf
Hey dibin ava 'heyatê ger hebit

Can dixwazî were da ez can bidim
Ger hezar rûh û rewan tê de hebit

Telbeya te cerg û mêlaka me ye
Were qessabî eger sikkîn nebit

Bi xwedê dayîm xiyala min tû yî
Bal te ye qelbî hetta qelbî hebit

Di şeb û rojê me nînin xab û xwar
Ger ji te yek lehzeyek firqet nebit

Qedehek ava heyatê min nevêt
Şerbeta wesla te yek cur'e hebit

Were destê me digota ey 'Elî
Di reqqasê saz û def eger hebit

# JI BÊTIFAQÎYÊ EM BÛN PENABER



Mûhemmed Çelîk

Te dît bê ev bêtifaqîyê çi anî serê me…Em bûne lîstok, di destê emperyalîzma ğerbê de. Ma ne wisa ye ezbenî? Em misilman, Xweda em kirine bira. Çi ‘Ereb û Kurd û Laz, çi Hebeşî û Faris. Çi wexta ku me îman anî û em bûne misilman; Xweda em li hev kirine waris.

إِنَّمَا الْمُؤْمِنُونَ إِخْوَةٌ Encax mumîn bira ne… Ayet nazil bû li ser biratîya me.

Çi bûye ji me gelo? Em bûn perçe û parî. Bombe dixwe de teqand û em bûn qujûtk û arî. Çi bûye ji me gelo? Em bûne mihtacên çareserî û demokrasîya sextekaran. Ji hev em bûne dubend, tifaq nema di nav me da. Ew herdû mîrasên pîroz. Quran û sunnet ji pêxember ma ye ji bo me doz.

Ka ulemayên me, warisên pêxember. Dengê wan nayên, çima nabin seferber. Her derê reşgirê da, her kes bûne kor û kerr. Ma qey hûn zen dikin ku hêz û quweta me qîm nake ji bo têkbirina kufrê. Ez ji vê zenê dûr im ez benî. Na! Em bi guleya tefrîqeyê birîndar in. Birîna me bêtifaqî ye û ji lewma em bûne penaber. Ji lewma cesedên me di deryaya spî de bipêlên avê tê rex. Em ne ji bela ku keştî noqbûye fetisîn û mirin, sedemê wê biratîya me fetisîye, wîjdanê me xeniqîye. Em bi berpirsyarî tevnegerîyan. Ji me kesî destê xwe nexist bin kevir. Hêvîya me ji me nemaye û bûne pepûk didestê ğerbê de.

Em bûne penaber, penaberê bê rêber. Tuneye welat ku em pê de her. Ez macir û penaber, lê reva min ne ji ğerîb û bîyanîyê ye ha! Ez ji ber zilma bira bazdidim û bi çola dikevim. Ger em bûbana yek û me dest hev bigirta, qey em dibûn lîstoka destê xwîn mijê ‘Emrîqa?

Ma emê çi wext hişyar bin lo bira… ma ne bes e êdî ev stûxwarî û ev zillet. Êdî dîroka bikaranîna tefrîqayê ne qediyaye gelo? Wêneyê Aylanê 6 salî, agirberdadilê me, feqet poz û bêvila me neşewitî… Hişyar nekir em, îşgal û şewitîna Qudsê! Hişyar nekir em, qêrînên pîrekên jinbî, zarezarên zarokên sêwî û êtîm. Hewar û gazîya dayikên dilzîz û dilşewat. Heta ku nebin em bira û wehdetê ava nekin, wê kufra ğeddar wicûda me bidestê me perçe kin…

Carna bombe û warîl bi ser me de barîya di şûna tava biharê de. Û em di binê kavilê xanî û avahîyan de pelçiqîn, ‘eciqîn, selixîn…Carna jî di rêwîtîya umîdê de, dikeştîyên ne serrast de em di deryaya spî de fetisîn. Em fetisîn û cesedên me bi pêlênbehrê re hatin qirağ û rexan. Dinyayê em kirin manşet, lê me negirtîye şîret. Heta em nebin bira timî em ê bibin sosret. Ma ne bes e ezbenî! Nehat wexta wehdetê? Emê kengî ji vê rewşê bigrin ders û şîretê. Û êdî werin ğîretê…

Ez reben û neçar, ji Xweda daxwaz dikim her car; Xwedêyo! Tu çavê me ji dîtina xetayê birayên me re kor, guhê me jî ji guhdarkirina emperyalîzmê re bike kerr û îmanê jiqelbê me re bike nûr Rebbî! Wek ensar û muhacir, tu me bike bira û hur. Dengê ulemayên me bilind û bi bandor bike. Wehdetê bike nesîb ya Rebb! Wehdet...

# ‘ÎDE ÎRO BÊ QERARIM

✍ Şêx ‘Ebdurrehmanê Axtepî

‘İde îro bê qerarim ez ji feqda dêmdurê
Bê ‘hebîb im bê ‘hebîb im bê ‘hebîb im bê ‘hebîb
Herkesek ba yarê xwe meşyan se‘hergahan li rê
Pur kebîb im pur kebîb im pur kebîb im pur kebîb

‘İd e kêf û şahî ye nêv xas û ‘amê ğulğul e
Yek yekan ‘aşiq li ser sorgul mîsalê bulbul e
Nîne der qelbê me bestek çun ku mecrû‘h dilkul e
Bê tebîb im bê tebîb im bê tebîb im bê tebîb

‘İdeyan yarê xwe girtin çûne seyra gulşenan
Muntezîr ba sağir û rey‘han û werd û sosinan
Lê tenê mame digel eşkan di kinc û gulxenan
Bê nesîb im bê nesîb im bê nesîb im bê nesîb

Sub‘hê ‘îdê herkesek dergeştê se‘hra renge reng
Ser me ez ğem cem‘î bûne leşkerê Rom û Fireng
Der bunê ğarê fîraqê keftîme pê yarî şeng
Ez ğerîb im ez ğerîb im ez ğerîb im ez ğerîb

Rojê ‘îdê tarî ye wek leylê bê şem’ û çira
Ser ğerîbê bê kesê dûrbit ji yar û hogira
Şadîya ‘îdê li min ‘huzne gelî yar û bira
Dil keîb im dil keîb im dil keîb im dil keîb

Dê çawa ‘idê temaşakim li kêf û şahîya
Çunkî muhlet nakevîtin dil ji ah û zarîya
Dûr û mehcûr im ji yarê ser refîqa zûsîya
Na qerîb im na qerîb im na qerîb im na qerîb

‘İd e yan îftar kirin dîtin mahê nû yek bi yek
Saim im hêja mi nedye meh li ser çeşmê belek
Cumle yaran firaz in lê tenê ez tek bi tek
Der neşîb im der neşîb im der neşîb im der neşîb

‘İd e nig xelqê temaşa ye wekî feslê buhar
Neğme xûn in herkesek berwerdî weslet sed hezar
Gul mi winda ye di hîcranê dinalim zarî zar
‘Endelîb im ‘endelîb im ‘endelîb im ‘endelîb

Gerçê îro ‘id e emma cergê min ateş ketê
Dil te‘hemmul nakitin seyra riyadê cennete
Min ‘hebîb ne xwîya ye weyla ketme pêta fîrqetê
Bê şekîb im bê şekîb im bê şekîb im bê şekîb

‘Îd e herkes li kêf û şahî ye ev rojê ‘îd
Ez tene mame di kuncê namuradê bê umîd
Cumle ‘aşiq surxî rolê ez div ê ‘halê şedîd
Şubhê sîb im şubhê sîb im şubhê sîb im şubhê sîb

‘îd e sa‘hib yari ba yaran dikin geşt û guzar
Min ji me‘hrûmî nema qet sekne û sebr û qerar
Nîne der destim ji mehcûrê zî mamî îxtiyar
Dil ferî bim dil ferî bim dil ferî bim dil ferî

Min ne newroz e ne ‘îd e min ne kêf û ne surûr
Dil ji hîcranê melûl e nabitin şad û sebûr
Gerçi ‘hala der fîraq im lê bi qelbê sade nûr
Der rekîb im der rekîb im der rekîb im der rekîb

‘İd e mehcûr im ji yarê nazikê xed sorgulê
“Rû‘hî” ‘ulwî yî emma ketme dereka esfelê
Lê kî çûn bû mubtela bê ‘hed selef zatê welê
Mustetîb im mustetib im mustetîb im mustetîb



“فَإِنَّ مَعَ الْعُسْرِ يُسْرًا
إِنَّ مَعَ الْعُسْرِ يُسْرًا”

# SÛREYÊ ÎNŞÎRAH

## SER YO VATEYO KİLM

Yûsûf ‘Arifoğlu

Be nomeyê Homayo bexşendî û bexşîyoxi (ma dest be wendişkenî).

1. Ma sîneyê tu nêkerd a û nê kerd hîra
Rina me’nayê ina ayeti ser sureyê Zumer ayeta 22’ini di hina vîyerena:
“ Gelo kesêko Alleh qefsing/sîneyê yi Îslomî ri kerdo hîra û wu Rabbê xu ra yo nûr sera nîyo? Kesêko qelbê yin zîkrê Homê ra (îmonî rî) qefilya/qesiyayo rusfayî yînî bi. Ha ê kesî he yo mîyonê şaşîya eşkera de.”
Ina ayeti ra yena fohmkerdiş akerdiş û hîrakerdişê qefsingê Hz. Muhammedî ra ‘fohmkerdişê yi beşerî be wehyî zêdîyaya.’ Rina mufessîr vonî, ‘In akerdişê sîneyê Hz. Muhammed aleyhi selam zêdîyê fohmkerdiş û berzîyê me’newîyata ku dîyaya ci, wa wu wehyêka yî rî yena fohmbîker, bipaw û wazîfeyê pexamberîyê xu bîyaro ca.’
Rina tay mufessîrî zî vonî ‘În ayet, dewomê sureyê Duha yê ku, yo müddet benatê dîya bi wehy û newe ra be destpêkerdi wehyî me’newîyatê Hz. Muhammed zêdîyaya.’
Rina yena vatiş, akerdişê qefsingê Hz. Muhammedî raştî ra bîya; ina ayetî zî a bîyaye ser nîşondona:
“Hz. Muhammed aleyhi selam vati bi, ‘Ez cê Laconê Sa’d bîn Bekr di lonîya û pawîyayo. Ruecêk ez û birayê mi şitî pîya penîyê bononî ma di varêk çerinene. A hel di kesî çilî yin sipîyê ome cê mi. Destê yoyî di tasêka zerrîn bi bi zere ay vor dekerdi bî. Yin ez depişta, qefsingê mi qelişna, qelbê zî vet û qelişna. Eyi ra yo çilkeka gunîya sîya vet û eşt yo kişt. Sîne û qelbê mi be a vor kerdi pak.”

2. Û ma barê tuya giron (tu) paştî ra ru nîna?
3. A barêka paştê tu kerdi bî çowt.
În wurd ayetoni di meqsedê ‘a barêka paştê Hz. Pexamberî kerda çowt’ û ‘barê giron paştî ra ru nînayiş’i di tay akerdişî est î:
Tayî alîm vonî ‘Bari ra meqsed efwkerdişê gunon û bexşkerdişê xetayonê Hz. Muhammedî ya.’ In vatiş sist û zeîf o ; çimkî Muhammed aleyhîselam nubuwwetê xu ra veri zî be exleq weş, gunoni ra dûr vînayiş,

putoni ra xu kerdiş omenî zonayiş. Hemi zî tarîxi di yo qeyd çînî ku Muhammed aleyhîselam yo gune kerda. Çendek, wextê Pexamberî yi di îctihad ser tike kemî virazîye înî zî xeta û guna nîye; bîlaeqs rizayê Homê ser wesîleyê sewab ê.
Guerê qenaatê ma 'barêka be lutfê Homê paştê Muhammed aleyhî selamî ra ru nîya ya' di tewiri di yena îzahkerdiş:
- Wu mîyonê a komi di cuwiyenî, yi bawerî û ehlaq ser kowti bî haleko xirab. Yin, erdo ser zey 'şîrk, dizdî, zulm, faîz, reqî wuerdiş, nêheqî...' yo guna nimendi bi kerden. In hali zî Pexamberî ma rî giron omen û zerrê yi dejêne. Ina yo bara gironi bî, Homê be paştgirîyê xu paşta da Muhammed aleyhîsselam û be wehy şirawtiş zerrê yi kerd hîra û ina gironî da wera.
- Yi kafiron û muşrîkonê Mekke di qey dînê Home kowten tîver û mucadele kerden. Îsyan, heqaret, ver vecayişê ê kafiron Muhammed aleyhisselamî rî giron omen. Homê zî ina ser zaf paşt da ci û wu be ardimê xu wuar nêverda.

4. Û ma zîkr(nome û wesf)ê tu kerd berz. Homê, în alêm hemi viraştî û mîyonê yini ra înson vîcîno û meqemê 'ebdî dawa ci. Mîyonê înson, cîn û meleketoni ra zî Muhammed aleyhîsselam vîcîno. Wu alêmoni rî kerdo wesîleyê rehmet û meqama Mehmud dawa ci.
Hemi zî yi ra ver 'kîtabono muqeddesi di nomeyê yi nuşt û mîjdonê omayişê yi do, kelimeyê şehadeti di nomeyê yi pa nomeyê Homê ca gurewto, Quroni di pîya îtaatê Homê yi rî zî îtaat wazîyo.'
Rina ina ayet di yena fohmkerdişi 'Heta ruecê qiyamet nomeyê Muhammed û dîneko teblîğ keno dunya di şinasyen û vilabeno.'
Rina ê wesfî Muhammedî Quroni di vîyerenî ê zî me'nayê nomeyê Muhammed aleyhîsselam berzkerdişi di yenî fohmkerdişî.

5. Helbet pîya zuarî di yo rehetî est a.
6. Raşti ra, pîya zuarî rina yo rehetî est a.
Hz. Pexamber û ombazî yi, Mekke di zaf îşkence onten, muşrîkonê Mekke yin zaf şedinen û tengî dene yin. Bisilmonê zî in zulum û heqerati ra zaf dejiyen. İn hal hem Hz. Muhammed hemi zî bawermendon qehirnen û yi kowten ver. Homa zî hem qey teselîdayişê yin hemi zî qey rehetkerdişê zerrê yin în wurd ayet şirawut û mîjdon da ku, her tengî dima yo hîrayî, nêweşî dima weşî, renconî dima arisyaye, zuarî dima rehetî, gironî dima şenikî est a.
Riwayet bîya ku wextêko ina ayet nazîl bîya Hz. Muhammed aleyhîsselam mîjdon dawa bawermendon û hina vato:
"Şima rî mîjdoni bi! Şima rî rehetî omîy; hînî yo zuarî çire nêeşkena di heb rehetî qelbido!"

7. Çi wext ti bîye veng, o wext (yowna gure ser) biko xebat
8. Û (tenika) vere xu bidi Rabbê xu.
Dunya, cayê gure, xebat, renconî û cehd a. Însonî rî zî 'geurê 'amelê yi, xebatê yi' yo qezonç est o. Homa 'battalî, beradayî, veng gerayişî' ra hesnêkeno. Eg in kesêk yo bawermend o yan zî Hebîbê Homê Hz. Muhammed o cî rî qet veng vindertiş nêbena. Gera merdimo bawermend, yo gure ra- in gure çi beno w abi bo, ha yo gureyo taybetî ha yo gureyo komelî- biveng lezalez dest bierzo yowna gure. Ku her wexte xu di wa gureko muhîm seri bişuxulîy.
Mavac; destmac qedîya wa destpêkero nimac, Qur'on wendiş qedîya wa bihevily tefekkür, gûreyê yi ruecî qedîya wa keye û tutonê x udi tekîlî bikero, sedeqa dayişî ra biveng wa bihevily vacîyayişê holî...
İna tefsir ser yena fohmkerdiş gera Resulullah û şexsê yi di Bisilmonê "heme wextê xu gurono xeyrini di bivîyarnen; îbadet, dûa, de'wet bîkeren; guronê dunya ser bixebityen, biromen, bimusen, yobînonî rî ardim bikeren, paşt biden yobînonî..."
Gera merdim ha xebatê ha 'ebdîyê xu di tena ver xu bido Homê, çi gure beno wa bibo waştişê rizayê Homê ser bîkero û çi wazeno zî wa Yi ra biwazo.

# ÊSAYİŞÊ HALÎ MA

Îbrahîm Çabakçurî

Her ca di yo têmîyonkerde est a
Tay he bini de tay he seri de raşt a
Nêheqqî zaf zixm a, heqqî zaf sist a
İn hal mîyonê ma di yo cîyayî viraşta


O vono ez Tirk a, o bînî ez Kird a
Yo vono ez Sunnî ya, yo zî ez Şîî ya
Ti vono ez ‘eşîr a, wu vono ez kuyij a
Îslam ma rî besa wuar verden ina aya

Ma nefsê xu depişt, holî çirre nêva
Ma bî rehet xirabîyê xiraban nêmuejna
Ma her tim şî hêtê heva û hewesî ra
Ma hînî çi nêbênî ina ğefletî ra aya

Homa, ma kerd ummeta tewr xêyrin
Va: “ Şima tim holî emir bikerên,
Her çîyo xirabî ra men bikerên
Pa inay Homê xu rî bawerî biyarên

Gera ma tim şi reyê İslamî ra
Ma ruec a ruec paşt bîger heqî ra
Ayet û sunnet ma vaji şarî ma ra
Wa holî zey tîj biesîyo herkesî ra

Cumerdî tena be rindiyê leşî nêya
Komêko, ehlaq başi bi ine yi ya
Ma her wext gera xuser gera pîya
Quron û sunnet xu rî biker tima reya



# Qalîge Peyxemberê Ma




'Ebdullah Cewher

Qalige Peyxemberê ma Abdulmutalîb'bi. Numey Abdulmatîb'i Şebe'bi. Şeybe gijigdecidi sîpî bîyo çora Şeybe fato.

Abdulmutalîp Arabun mîyundi mevkîyeci zaf pîl je merdim bi. O verî kuyîya zemzemî vetî, çora Arabun mîyundi zaf mübarek je merdimbi.

Abdulmutalîp ro ce Hîcr'di koytbi ra. Hoyndecidi je merdek eyra vêyzi cay Mednunî bi kena va. Abdulmutalîp mednune çîçîyo va. Merdim ceyra a şi.

Roce bîn eynî merdim derna Abdulmutalîp hîcr'di koytbi ra derna umi. Zey roce verîn hoyndi veyzi Tayyîbe bikeni va. Roce bîn eynî merdim derna hoyndi umu veyzi Berre bikeni va. Abdulmutalîp berre çîçîyo va. Merdek hoyndi çeyra a şi. Roce bîn o merdek veyzî Zemzem bikani va. Cay zemzemi cay kirbununu cay siloy ortidiro. Uca kulika mocilin esta. Qela ey hetî naqurî kena.

Roce bîn Abdulmutalîbî qela dî. Şi qulika mocilun hetî başley kendiş ker. Vakitna kendiş tepey dese quyî dî. O vakit tekbîr ard. Qabe coy Mekke'yici umey ey heti. Înay va mayiqi ortak biki na quyî. Ey kabul nêke. Muyundêcidi münaqaşa vecya. O vakit lace Abdulmutalîb'î je tek bi. (Harîs) Va kese to çînno ti no hala na quyî ne dune ma. Abdulmutalîb'î va eğer Allah des lac bido mi ez je tekî qabe ey kani qirbun va.

Abdulmutalîb'î Mekkeyucîn münaqaşa dima va ma şerê je kahînî o kahîn Şam'dibi. Va ma şeri ey heti o savaco ma hunî biki. Mekeyicuv Abdulmutalîp koytî cadi şî. Cadira ovkaci qedye. Abdulmutalîbî va ma no çöldi mirani, tumdi o vakît linga Abdulmutalîbî koyti ju kerava. Binde a kerara ovgi vecye. O vakit şikir kerd veyndetta umbazunde xi da. O vaqitra tepey peyser çeyray a, ne şî kahînî heti. Mekkeyucun va no ruma Allaya va peyser umey.

Serrun tepeya Allay des biti day Abdulmutalîbî duay Abdulmatîbî kabul kerdi. Ju şêv koytra hoynde xidi adaqa xi dî. Vato adaqa xi bîyari ca. Abdulmutalîbî qura unti quradi Abdullah vecyov. No qura birra veşte Mekkeyucun ne şîya. Qabe Abdullay bermaye. Abdulmutalîb ra vato ne qirvi meyari ca. Abdulmutalîb rayna Mekkeyucuna şî kahîni heti. Kahînî vato qura bunce hata qura devare vecyase kura bunce her ju kuradi des deva kurbun kerê. Devey çeyki bî se o vakit kura devayunrê vêcye. Qalbe Abdulmutalîp rahat ne bi, derna kura unti . Derna devera vecye qura o vakit va Allah no girvira biyo razî. O rocra tepey kısasa je merdımı biya se devê, kim je merdımı bikişo gerêk hinti devun bido.

Hz.Peyxembere ma vato ez bitê di kurbunun. Je bitê Hz.İbrahîm İsmaîl kurbun kerd. Jena Abdulmutalîp bitê xi Abdullah kurbun kerdo.

Emunetê Allah bê...

Devum keno..

عَبْدُاللَّه جَوْهَرْ

# قُرْآنْ كَلاَمِ اِلاَهِي

قُرْآنْ كَلاَمِ اِلاَهِی
هَمْ شَرِيعَتِی رَبّانِی
نُورِ دُنْياوْ آخِرَتِی
هَمْ احْكَامِی عَدَالَتِی

قُرْآنْ مَارِی رَهْبَرُو
هَرْ وَخْت عِزّتُو شَرَفُو
دَاِمْ مَارِی هِدَايَتُو
قَيْ حُزُورِ مَا دَرْمَانُو

وَنْدِشِی قُرْآنِ وَشُو
هَمْ شَرْبَتُو اَنْگِمِينُو
دَرْدَانِ مَارِی دَرْمَانُو
قَلْبُو سِينَانْرِی شِيفَاوُو

قُرْآنْ جَعْدَيْ حَقْ مُوجْنَنُو
هَرْ دَااِمْ مَا هِيشْيَارْ كَنُو
شَيْطَانَانْرَا مَا دُورْ دَانُو
جَهَنَّمْرَا مَا حِفْظْ كَنُو

قُرْآنْ خَلاصِی وَازَنُو
مَا دَعْوَتَه حَقَّه كَنُو
جَعْدَيْ جَنَّتِی مُوجْنَنُو
حُزُورُو عَدَالَتْ آنُو

قُرْآنْ مَارَا هَرْ وَخْتْ وَانُو
نَفْسِی خُورَا غَافِلْ مَبِی
شَيْطَانَانْرَا مَه خَاپِيِی
عِبَادَتْ تَرْكَ مَه كَرِی

قُرْآنْ شُعْلَيْ مُؤْمِنَانُو
طَارِيتِيدَه نِفَرْدَنُو
ظَالِمَانْرَا مَا دُورْ دَانُو
حَقِّيُو عَدَالَتْ آنُو

قُرْآنْدَه اَسْتُو بِرَاتِی
هَمْ اِتِّفَاقُو يَوِيتِی
هَامَوْ وَدَارْتِشِی نَيَارْتِی
هَمْ تَفْرِيقَوْ مُنَافِقْتِی

قُرْآنْ مَارِی رِنْدْ فِرْسَتُو
هَمتَدَه هَرْ چَارَه اَسْتُو
حُزُورِ دُنْيَاوْ آخِرَتِی
اَحْكَامِی قُرْآنْدَه اَسْتُو

عَبْدُاللَّه فَانُو اَيْ بِرَا
مَبَه تَابِعِی كَافِرَا
خُو مَحْرُومْ مَكَه قُرْآنْرَا
خُو دُورْ مَدَه عَدَالَتْرَا



موەحديد كو وەك ستونا ژنورێنە حيمايەكرنا دينێ ئيسلامێ داتينن سەرێ جەسارەتا خوە، ئو ددن بەر چاڤێ موراقەبا خوە، ئو ددن سەر ملێ غيرەتا خوەيا ديني.﴾ دبەدێلا كەسێن نەئەهل و بێغيرەتدە ئوممەت تەڤي جەسارەتا خوە حيمايا دينێ ئيسلامێ دگرە سەر خوە.

﴿هون دبينن كو ئەوان تيرژێن ژهەڤ پەرچە پەرچە ئيدي ڕۆناييێ ددن، هێدي هێدي بەر بهەڤ تێن ئو وێ بهەڤ مەزج بن﴾ موەححيدێن كو ددنيايێدە ژهەڤ پەرچە پەرچە ئو هەر يەك ژوان وەك تيرژەكە ژنورێيە، هێدي هێدي بەر بهەڤ تێن، وێ تەڤ بگێژن هەڤ ئو نورا يێكيتيا ئوممەتێ وێ عالەما ئسلاميێ تێخە بن قۆنترۆلا خوە.

﴿د فەننێ حيكمەتێدە ئەڤيا حوكمەكي قەطعيە كو: حسسياتا ديني بتايبەت دينێ حەق يێ فطري گۆتنا وێ بێتر دەرباس دبە، ئو حوكمێ وێ عاليتر و بلندترە، ئو تەئسيرا وێ شەديتترە﴾ مادەم حەقيەت ئەڤە، مەنسوبێن ڤي ديني ژهەڤ بەلاڤبويي ئو بێ سەري وێ نەمينن. كەسێ كو خوە ژڤي ديني ئو موەححيدان دور كە ئو خوە نێزي لائيك و سەكولەريستا دكە تو خێرێ نابينە.

﴿ئەلحاصل: كەسێ كو بغەيرا ئەمين نەبە وێ بنەفسا خوە تەشببوسا كار بكە﴾ مادەم باوەريا وە بكەسي نايێ ئو هون خوە ناسپێرن كەسي ئەوچاخ بارێ ڤي ديني هونێ هلگرن

﴿ئەز ژوەڕە ميثالەكێ بێژم: بنەڕن هون كۆچەرن، مالێ كۆچەرا ژي مێشنن (مي، پەز)، هون ڤي كاري دزانن، ئيدي هەر يەك ژوە هنك پەز تەسليمي شڤانكي كريە، حالئەڤە كو شڤان كەسلانە، ئو موعاونێ شڤان بێعەلەقەيە، ئو كوچكێ شڤان بێكێرە. هەگەر هون خوە بتەمامي بسپێرن شڤان ئو هون بڕحەتي خوە لمالا خوە درێژكن، ئو پەزێ ڕەبەن دناڤ گورێ ظالم و دز و بەلاياندە بهێلن گەلۆ باشە؟﴾ هەگەر هون مللەتێ مسلمان بدەستێ سەرۆكێ دەولەتێ و ئاليكارێن وي يێن كو بمەسەلەيێن خەلكێ مسلمانڕە بێعەلاقنە، ئو پۆليس و عەسكەرێن بێكيرڕە بەردن باشە؟

﴿يان هون بێكێرتيا شڤان زانبن و خەوا غەفلەتێ بتەركينن ئو وەك قەهرەمانا هەريەك ژمالا خوە بازدە ئو لدۆرا پەز ببە حەلقە، دبەدێلا شڤانكيدە هەزار موحافظ دەركەڤن ئو تو گور و دز جەسارەتي دەستدرێژيا پەز نەكن نە چێترە قەي؟﴾ لازمە هون ڤيا ببينن: كاربدەستێن دەولەتێ بێكێرن، عەلاقە بدەردێ خەلكێ ناكن. گەرەك هون خەوا غەفلەتێ بتەركينن، گەرەك مال و جان و دين و ناموسا خەلكێ مسلمان ژدژمنێ دين هون محافظە بكن.

﴿قەي ئێ كو دزێن عەشيرا مامخوران كر تۆبەكار و صۆفي نە ئەڤ سڕبو؟ بەلێ، ڕحێ وان خوەست بگري، يەك بو سەبەب، ئەو ژي گريان﴾ دەما هەركەسي بازدا چو بەر سەرێ پەزێ خوە ڤان دزان تشكي كو بدزن نەديتن ئو زڤڕين و تۆبەكرن. كەسێن كو لپەزێن خوە خوەدي دەركەتن بون وەسيلا تۆبا وان. هەگەر هون ژي بيززات لدينێ خوە خوەدي دەركەڤن، سەرۆك و ئيدارێەڤان و كەسێن خوە بدەستێ چەپگرا و بێديناڤە بەردايە وێ چما تۆبە نەكن؟

﴿بەلێ بەلێ!... هەگەر كەلمێش «طنطنا» خوە ببڕە ئو مێشا هنگڤ «ڤزەڤز»ا خوە بتەركينە ژي برا شەوقا وە نەشكێ، هون لبەر نەكەڤن. چمكي موسيقيا ئيلاهيا كو كائيناتێ بنەغەماتێن خوە دڕەقسينە ئو سڕڕێن حەقيقەتێ دلەرزينە تو جاري ناسەكنە، ئەبەديەن ب»زرمزرم»ێ دەنگ دەردخە.﴾ دنيا بەرۆڤاجي ژي ببە هون مەحزون نەبن. چمكي دەنگێ قورئانێ كو كائيناتێ تينە حەرەكەتێ ئو زەڕڕەيان ژحالەكي دخە حالەكي ئەبەديەن قوط نابە.



# دجەهالەتێدە خوە نەفەطسینن

عبد الصمد حلمي

هَڤْپَیْڤِینا جِڤَاکَا کُورْدَان بِسَیْدَاي بَدِیعُ الزَّمَانْه: رَچَتا کُرْدَانْ-١٥

بسم الله الرحمن الرحیم

گەر هون قەنج بن حکومەتو ترك چەوابن ژي خەرابیا وان ناگهێژه وه، وێ قەنجیا وان بگهێژه وه

س- :﴿ چەوا قەنجیا وان دگهێژه مه ئو خەرابیا وان ناگهێژه مه؟چمکي هەردو برێ هڤن، ئو بهەڤڕه تێن﴾

ج- :﴿چمکي حکومەت وەك حاوزه، لژێره، دکۆنجالێده یه، خێرابي گرانه، بەر بژۆرڤه نا گندڕه، قەنجي ژي نوره، تیرژا وێ دده ژۆر﴾ هەما هون وێ نەقەنجیێ وەك مەقلەتیزێ نەکشینن خوە بەسه. حەتا کو هون شەریعەتێ زانبن ئەو نکارن زرارێ بدن وه. یاني تەمامێ مەسەلێ زانەبونا شەریعەتە ئو عەمەلکرنا پێیه. برا خەباتا وه هەر لسەر ڤێ به.

س- :﴿برا دین زرارێ نەبینة چ دبه برا ببه﴾ مه زرار دیتیه یان نه دیتیه نه مهیممه

ج- :﴿ئیسلام وەك ڕۆژێیه بپفکرنێ نا تەفه. وەك ڕۆژێیه بچاڤگرتنێ نابه شەڤ. کەیێ کو چاڤێ خوە بگره ئەو لخوە دکه شەڤ﴾ هون لحالێ خوە بنەڕن ئو خوە لگۆرا شەریعەتێ بعەدلینن، دجەهالەتێدە خوە نەفەتسینن، کەسێ کو خوە نەگوهەڕینە خوەدا وان ناگوهەڕینە، هەگەر خوەدا بخوازە وێ هیدایەتێ بدە ئینسانا.

﴿هەم عەجەبا مەرەڤ خوە بسپێره پادیشاهەکي مەغلوبو بێچارە، یان ژي هنك مەئمورێن قەللاش، یان ژي هنك پۆلیسێ بێ عەقل، مەرەڤ حیمایەکرنا دین بدەستێ وانڕە بەردە قەي چێترە؟﴾ قەي مەرەڤ خوە ئو دینێ خوە بدەستێ نەتەوەپەرەست و چەپگراڕە بەردە پڕ باشە؟ ﴾ یان مەرەڤ خوە ئو دینێ خوە بسپێره مەعدەنا حسسیاتا ئیسلامیا کو لپشتا ئەفکارێ عاممەیە، ئو شەفقەتا ئیمانیا کو دقەلبێ هەرکەسیدە یە، ئو کۆما کەمالاتێن نورێن ئیلاهي، ئو چروسکێ نورانیێ غیرەتا دیني کو ژ سطونێ نوراني ئو شورێ ئەلماس پەیدا دبن﴾ بەلێ، مەرەڤ خوە ئو دینێ خوە بسپێره کەسایەتو مەجلسا مسلمانان ژآ سەکولەریست و لائیك و چەپگران نە چێترە قەي؟

﴿هون بخوە محاکەمە بکن. ئەڤان کەسێن

سڤیلانرە گرتن، مداخەلە نەکرن و ڕێ لبەر زایعاتا جانو مال نەگرتن، بون سەدەما کو پێڤاژۆیا چارەسە ریێ هات ڤەپرسین. ئەڤ ئێریشو یێن بڤي ڕەنگي لهەرێمێ، نە لئالیێن ئیسلامي تەنێ، یەکجار لئیسلامو مسلمانان تێ نڕخاندن. ئێریشێن لنرخێن ئیسلامي تو جار نایێن قەبولکرن.

٨١- پەکەکە ئو پەڤگهانێن وێ بپێڤاژۆیا چارەسەریێ، ستراتەژیا کو لهەرێمێ ببن هێزا سەردەستا بتەنێ بپێشخستن. بویەرێن ٦-٨ێ جۆتمەهێ یێن دبن ڤێ ستراتەژییێدە پێك هاتن، زۆردەستیو تەعدەیێن دن یێن قەوماندن، زەمینا کو لکوردستانێ پەکەکە بیێن نە وەك خوە دفکرەڕە ئو ژیێن غەیري خوەڕە پەڤرە بژي ژهۆلێ ڕادکە. پێڤاژۆیا چارەسەریێ یا کو پڕێ هێلێن جڤاکێ ئو جامیعا ئیسلامي ژي پشتگریێ ددێ، پشتي بویەرێن ٦-٨ ێ جۆتمەهێ، مەعروزي کێمبونا پێباوەریەکە جدي بویە.

٩١- ستراتەژیا زۆردەستیو تەعدەیا کو لهەرێمێ تێ مەشاندن، دگەل کو تو مەنفیعت نەدایە خەلکێ کورد، مخابن بزەمانڕە دبە سەدەما کو هێلێن جودا ژبۆ پاراستنو هەبونا خوە مەجبوري پەڤچونان ببن. دڤێ پەکەکە ئو پەڤگهانێن وێ دەڤ ژسیاسەتا شددەت و زۆردەستیو قوتفاندنێ یا کو هەرێمێ بەر بکائۆسێڤە دبە بەردن؛ قەبولبکن کو مەجبورن برێخستنێن نەوەك وان دفکرنڕە پەڤرە بژین.

٠٢- قانونا بنگەهینا داربەیێ یا کو فێکیا زهنیەتا کەمالیستە ئو چاڤکانیا قەومینا پرسگرێکا کوردە، دڤێ بێ گوهەڕتن، ژجەختو عونصورێن ئەتنیکي بێن پارزوناندنو لسەر ئەساسێ وەلاتیبونا وەکهەڤ قانونەکە ئەساسیا نو بێ ئامادەکرن. دڤێ دەڤ ژوەصفاندنا کو هەەکە سێ ببەندێ هەموەلاتیێ بدەولەتا جمهوریەتا ترکییێڕە گرێدایيڤە ترکە بێ بەردان. دسەریدە قانونا بنگەهین، دقانونانده جەختێن ئەتنیکي بێن دەرخستن. گۆتنێن عرقچي، نەژخوەحەسباندنێ ئو ئینکاري یێن حاکمێ زمانێ دەولەتێ، دڤێ ژهەمي مەوزوعاتو لیتەراتورو سیستەما پەروەردەهیێ بێن ئاڤێتن.

١٢- دڤێ سینۆرێن صونعي یێن خەلکێ کورد، عەشیرانو حەتا مالباتان ژهەڤ ڤەقەتینە ببن سەمبۆلیك، ژبۆنا پێشکەتنا تێکلیێن ئینساني، ئابۆري، چاندي ئو جڤاکي ئو پێکئانینا حقوقێ مەرڤانتیێ هەمي ڕێکو پێککرنێن حەوجە بێن کرن.

٢٢- بەپرسیاریا هەمي هێلان ئێ کو خوە هەر جورە یێ تەور و هەلوهستێن وێ نیڤەنگا پەڤچونێ کورتر بکە بپاڕێزن. ژخوە دژواربونا نیڤەنگا پە ڤچونێ ئو لهەرێمێ قەومینا نیڤەنگا کائۆسێ، وێ ببە سەدە ما شەواتا کو لهەرێمێ هەمي کەسي بشەوتینە. ژبەر ڤێ یەکێ ژبۆنا لهەرێمێ دناڤبەرا کوردانده پەڤچونەك نەقەومیبە، دڤێ هەرکەس مەسئولیەتا کو دکەڤە سەر ملێن وي بینە جي.

٣٢- دڤێ ژبۆنا دپێشدە دژمنانتیو مەغدوریەتێن محتەمەل نەقەومن، تەدبیر و بەرگریێن حەوجە بێن هلدان، سیستەما پاڕێزڤاني بێ ڕاکرن.

٤٢- عاقوبە تا بهەزاران وەلاتیێن وەندا دڤێ بێ داخویاندن و لێ پرسینێن جدي بێن کرن داکو فاعلێ مەجهولانو ئینفازێن ناڤخوەیي یێن ڕاخستیێ بێن ڕۆنیکرن، گوندێن هاتنە شەوطاندنو ڤالاکرنو بەرپرسیارێن کو کۆچبەریا مەجبوري دانەکرن بێن تەسبیتکرن.

٥٢- ژبۆ عەدلاندنا بنگەها ئەخلاقێ کو د جڤاکێدە بەر بخەرابونێڤە دچە ئو ژنوڤە ئاڤاکرنا براتیێ، وەکا بەرێ مەدرەسەیێن کو وێ ڕۆلەکە سەرەکە هلدن سەر خوە بێن بجانکرن. ڕێ لبە ر پەروەردەیا دیني بێ ڤە کرن، هەیاما کو دپەروەردەیا مەدرەسەیێدە دبهرە، ژدەما پەروەردەیا مەجبوري بێ حەسباندنو ژ ئیجازەتێن تێن داییڕە بەلگەیێن هەڤتایي بێن دایین.

٦٢- دڤێ قانونا پارتیێن سیاسي، ژهەلوەستێن دەورا وەسایەتا لەشکەري بێن پارزوناندن، دگەل بەرگریێن ئیستیقرارێ دپاڕێزن، بئاوایێ کو وێ تەمسیلیا جڤاکي بهەري بەلاڤبویي تەئسیس بکە بێ گوهەڕتن، بەنداڤا هلبژارتنێ بێ ڕاکرن.

٧٢- بئارمانجا کەسێن ژبەر سەدەمێن سیاسي دحەپساندەنە ڤەگڕن وەلاتێن خوە، دڤێ ڕیکوپێککرنێن قانوني یێن حەوجە بێنکرن.

٨٢- ژبۆنا پێشڤەچونا کوردستانا کو بپۆلیتیکایێن زانەبون، ژئالیێ ئەکۆنۆمیکێڤە لپاش هاتیە هشتنو ژبۆنا باشبونا ئابۆریاوێ، دڤێ ژهەرێمێڕە جوداهیخازیەکە پۆزیتیف بێ کرن، گەرحەوجەبە دڤێ بڤەبەرهێنانێن ڕاستە ڕاستێن دەولەتێ، دەرفەتو ئیمکانێن ئیستیخدامێ بێن زێدەکرن.

هەیئەتا تەرتیبکرنێ یا کۆمخەباتێ

و ئاسیمیلاسیۆنێ یێن ئیدەئۆلوجیا ڕەسمي یا نەتەوەکار، بەرفرەکرنا مافو ئازادیێن سەرەکە، بئاوایێ هەموەلاتیبونا وەکهەڤ بداویکرنا جوداهیخوازیێ، بداویکرنا پەڤچونێن کو ئەڤ سەرێ سي سالیە وەلات بگەلەك دەردو کولێن پرهێلیرە ڕوبرڕو هشتیە ئو وەسایەتا لەشکەري خورت دکە، بێچەککرنا ڕێخستنێن چەکدار، پێکئانینا تەڤلیبونا سیاسەتا سڤیل و دئانالیزا داویندە ژي سەکناندنا خوینا دهەڕکە ڤەحەوینە.

٦- دڤێ زەمینا جڤاکي، سیاسي، ئابۆري ئو پسیکۆلۆژیکا پێڤاژۆیا چارەسەریێ بێ چێکرن

٧- پرسگرێکا کورد حەتا ئیرۆ ژبۆ کەسێن کو دخوازن ستاتوکۆ بەردەوامبە ئو سیستە ما وەسایەتێ لسەر پیا بهێلن، تم بویە واسیتەیەکە بکێرهاتي. ژڤي ئالیڤە هەم کەسێن طەرە فداریێ وەسایەتا میلیتاریست هەم ژي هەمي هێلێن کو خوە بپرسگرێکا کورد خوەدي دکن، خوەستنە پرسگرێك بەردەوامبە ئو خەبتینە کو حەولێن چارەسە رکرنا پرسگرێکێ بێئەنجام بکن.

٨- پێڤاژۆ دگەل هەمي ئێریشێن پرۆواکاتیف ژي، بسایا پشتگریا جڤاکي ددۆمە. ژبۆنا پێڤاژۆیا چارەسەریێ یا کو پرجاران هاتیە سابۆتەکرن، شەففافتر و دزەمینەکە ساغلەمتر بمەشە، دڤێ بنگەها هەیەتەکە کو ژکەسێن خوەدي پێباوەریا جڤاکي ئو ژتەمسیلکارێن پارتیێن سیاسي پێك تێ بێ ئاڤاکرن ئو تەڤلي پێڤاژۆیێ ببە. وێ ئەڤ وەکا چاڤێ سێیەمین دناڤبەرا دەولەت و ڕێخستنێن چەکداردە حەکەمتیێ بکە، یێن دخوازن پێڤاژۆیێ ڤەتوربکن ئو سۆزا خوە نایینن جي دەشیفرە بکە ئو وێ ئەرێني مداخەلا بێڤاژۆیێ بکە.

٩- دڤێ مەسە لا کوردو پرسگرێکا پەکەکێ ژهەڤ بێ ڤەقەتاندن. دڤێ هەردو پرسگرێکێن کو ئەڤ ٠٣ سالە ژبەر تەڤگەڕو سەپاندنێن دەولەتێ یێن ئەولەکارو نەتەوەکار کەتنە ناڤا هەڤ، ژهەڤ بێن جوداکرنو زەمینەکە سیاسیا کو پرسگرێك لسەرێ چارەسەر ببە بێ بپێشخستن

٠١- ڕایەدەرێن دەولە تێ دڤێ پرسگرێکا کورد دانەخن ئاستا بپەکەکێ سیلەح دانبەردانێ یان ژي ئاگربەستیێ. کورد مژارا ئەصلي یا پێڤاژۆیینە. مافێن وانێن سەرەکە یێن ئیسلامیو ئینساني کو ژئالیێ سیستەما کەمالیست ڤە هاتنە غەصبکرن، دڤێ قەط نەبن مژارا تو بازارکرنێ ئو دهەر حالو کاریدە بێي دەرەنگخستنێ بێن دایین.

١١- دڤێ ژبەر ظولمێن حەتا نها هاتنە کرن، دسەریدە یێن لعالمێن کورد وەك شێخ سەعید کو خەلکێ کورد وان بڕێز و حورمەتەکە مەزن ببیر تینە، لسەر ناڤێ دەولەتێ عوزر و لێبۆرین بێ خوەستن ئو ئیعتیبارا وان بێ ئیعادەکرن. هەروها دیێن مەزەرگەهێن شێخ سەعید، ئوستاد بەدیع الزَّمان ئو سەید رزا بێن دیارکرن.

٢١- دڤێ کوردي وەك زمانێ ڕەسمي یێ دویەم بێ قەبولکرن، هەمي ئاستەنگێن لبەر پەروەردەیا بزمانێ دایکێ بێن ڕاکرن

٣١- چەوتیەکە مەزنە (کێماسیەکە گرنگە) کو حیکمەت دپێڤاژۆیا چارەسەرییێدە هێلەکە تەنێ دکە مخاطەب، کەسو گروبو سازیێن کو لهەرێمێ بەرگندێن وانێن سۆسیۆلۆژیکو سیاسي هەنە دیققەت ناگرە.ژبۆنا پێڤاژۆیا چارەسەریێ شمولي هەمي جڤاکێ ببە، دسەریدە ئالیێن ئیسلامي هەمي هێلێن جڤاکێ دڤێ تەڤلي پێڤاژۆیێ بێن کرن ئو لحەسساسیەتێن وان دیققەت بێ گرتن.

٤١- ژبۆنا چارەسەریا پرسگرێکێ دسەریدە هوداپار، حەڤپار دڤێ هەمي نونەرو تەمسیلکارێن ئالیێن ئیسلامي تەڤلي پێڤاژۆیێ ببن. ژبلي ئالیێن ئسلامي، فکرو ئیدەئۆلۆجیا وان چ دبە بلا ببە، دڤێ بهەمي سازیێن ڕاخستي یێن کوردنڕە ژي هەڤدیتن پێك بێن ئو ڕێ لبەر کەدا وانا ژبۆ چارەسەریێ بێ ڤەکرن.

٥١- پەرسپەکتیفا سیاسیا کو حکومەت ژبۆ چارەسەر کرنا پرسگرێکا کورد بپێش خستنە، ژئالیێ پێشخستنا سیاسەتا سڤیلڤە نۆقتەیەکە موسبەتە، لێبە لێ ئیرۆ ژئالیێ ڕەوشا کو حزورو ئەولەهیا خەلکێ خستیە بن تالوکەیێڤە، دڤێ ژنو ڤە دبەر چاڤانڕە بێ دەرباسکرن.

٦١- حەتا ئیرۆ دحەقێ بویەرو ئێریشو ئاگرپێخستنا کو هەما هەما سەرێ ٠١ سالانە بێناڤبڕ لکۆمەل، پارتیو کارگەهان هاتنە کرن دە، لێپرسینێن جددي نە هاتنە کرن، دهەڤێ گەلەکاندە ژبەر کو دۆز نە هاتیە ڤەکرن، ژ ئالیێ ئەولەهیا قامویێ ڤە تابلۆکە زەعیفیێ دەرانیە. حسسیاتا پێباوەریێ یا جڤاکێ زرار دیتیە.

٧١- نەخاسم دبویەرێن ٦-٨ جۆتمە هێدە لبەر میلیتانێن کو بحنجەتا کۆبانیێ داکەتن کوچەیان و ئێریشێن وان گهان زیروەیا ڤاندالیزمێ ئو پاشێ دحادیسەیێن کو لجزیرێ قەومیندە هێزێن ئاسایشێ، چاڤێن خوە ژئێریشێن لسەر

فەرمانا تەنظیماتێ یا ٩٣٨١ ئان نەڕحەتیێن مەرکەزي بخوەڕە ئانینە. لائیکتي ئو نەتەوەکاریا کو کورتاسیا فەلسەفەیا سازبونا جمهوریەتێیە، پرسگرێکێ مەزنتر کرنە، دئەنجاما طەبیعیا پراتیکا دەولەتا نەتەوەییدە پۆلیتیکایێن ترککرن (ئاسیمیلاسیۆن)، ئینکارکرنا ناسنامەیێن جودا، ئیمحاکرن و بدورخستن، ظولم گهاندنە وي حەددێ کو نابێ تەحەممولکرن. بێیي مەرڤ دکەڤە شاشیا کو فاتورا لخەلکێ ترکێ مسلمانێ کو ئەو بخوە ژي مەغدورێ ئیدەئۆلۆجیا ڕەسمیە بێ برین، دڤێ پۆلیتیکایێن دەولەتێ یێن تەکپارێز، نەتەوەکاري ئو لائیکتي یێن مەحکومکرن.

تاریخ نە بویە شاهدێ خەلکێ مسلمان ئێن بهەڤدوڕە شەڕ کرنە، دهەیاما سي سالێن داوینا لهەڤخستنێدە، سەدەما هەري مەزن ئا کو پلانێن بەرهەڤدانا خەلکێ کورد و ترك هەڤ نەگرتیە، مسلمانبونا هەردو خەلکایە. گەر کورد و ترك ژ ئیسلامێ بێن دورخستن، ئەوێ شەڕێ دناڤبەرا هێزێن چەکدارێن ڕێخستن و دەولەتێدە، ریسکا کو شەڕ دناڤبەرا هەردو خەلکاندەژي بقەومە دەرینە ئو وێ ئەو ڕەوش ببە فەلاکتا کورد و ترکان.

پرسگرێکا کورد، مە سەلاترکیێ یا هەري گرینگ و عاجلە. ژبۆنا ئەڤ مەسەلە عادلانە بێ چارەسەرکرن، دڤێ پرسگرێك د زەمینەکە ڕاستەدە بێ نقاشکرن، پێڤاژۆیا چارەسە ریێ شەففافتر بێ مەشاندن، دەڤ ژوێ یەکا کو سیلەح و شیددەتێ وەك مەتۆدا بدوکەتنا حەقێ ئو واسیتەیا پێکئانینا حاکمیەتا سە حابێ دبینە بێ بەردان.

بەرگەها ناڤنەتەوەییا پرسگرێکێ، موازەنەیا سیاسي ئو پۆلیتیك چارەسەرکرنا پرسگرێکێ دژوارتردکە. لێ بەلێ ئەڤ فاقتۆر نەخوەدي باندۆرەکە دیارکەرن. هێزێن ناڤنەتەوەیي نەخاسم نونەرێن ئەمپەریالیزمێ دەعوەتي ماسەبێ بێنکرن، ئەوێ مەسەلەیێ گریفتر بکە. چارەسەرکرنا مەسەلەیێ دڤێ لسەر دینامیکێن ناڤخوەیي پێك بێ.

دگەل ڕاست تەسبیتکرنا هەدەفێ پێویستە کو ڕێوڕێبازا تێ شۆپاندن ژي ڕاستبن. ژبەر ڤێ یەکێ دڤێ مەرڤ قاعیدەیێ کو «ئوصول دکەڤە پێشیا ئەساسان» ژبیر نەکە. یان نا گهاشتنا ئارمانجێ نە ممکنە. دچارەسەرکرنا ڤێ مەسەلەییدە موخاطەبدیتنا هێلەکە تەنێ، چارەسەریێ دژوارتر دکە ئو دبە سەدەما خەتمینێن جددي.

چارەسەرکرنا پرسگرێکا کورد، بدەرکەتنا دەرڤەیێ پارادیگمایا دەولەتا نەتەوە ئو نێرینا نەتەوەپەروەر و لیبەرالێ ممکنە، دڤێ دنێرینا ئیسلامي ئو تەجروبەیا تاریخیدە لچارەسەرکنا پرسگرێکێ یا لسەر بنگەها عەدالەتێ بێ گەڕین. مخابن حەتا نها ژبەرگەها ڤێ نێرینێ دور سەکنینە، ژتەجروبەیێن تاریخي ژي نە هاتیەئیستیفادەکرن.

لترکیێ هەمي ناسنامە ئو کولتر، دخوازن بڕەنگ و نەقشێن خوە دعەیني توالیدە بگهێژن هەڤ؛ دعەیني ئەبروییدەهەبن، بئامور و ئەنسترومانێن خوە عەیني نەوابێ بێژن. دعەیني وەقتێدە دل دکن کو دعەیني چارچۆڤەییدە لعەیني بەرگەهێ بهەڤڕە بنێرن، خەونا پێشەڕۆژەکە خوەش ئا کو وێ قەدەرەکە مشتەرەك هەڤپار بکن دبینن.

ئەم ٠٠٦ دەلەگە ئو دگەل نێزي ٤ هەزار پەڤگهانێن خوە دداویا کۆمخەباتا کو مە ژبەر مەسئولیەت و شاهدیا خوەیا ئیسلامي پێك ئانیدە، تەسبیتێن خوە یێن دوارێ «چارەسەرکرنا پرسگرێکا کورد، پێکئانینا ئاشتیەکە دائیمي ئو ئاوابێ ساغلەمتر مەشاندنا پێڤاژۆیا چارەسەریێ گاڤێن دڤێن بێن ئاڤێتن» دە دەرکەتنە هولێ، بڕایا گشتیڕە پارڤە دکن.

١- تشتێن دپێڤاژۆیا تاریخێدە قەومینە لالیکي ڕۆژا مە یا ئیرۆدە خەلکێ کوردێ مسلمان هەم ژدەولەتێ هەم ژ پەکەکێ موزدەریە. هەمي ئینسانێن لکوردستانێ دژین لهەرێمێ چارەسەري ئو حزورێ دخوازن.

٢- بێیي دققەتکرنا داخوازێن ماف و حەسساسیەتێن خەلکێ کوردێ مسلمان، چارەسەرکرن پرسگرێکێن کو بصەد سالاچێبونە نە ممکنە. پایدەیا هەڤپارا خەلکێ کورد ئیسلامە. ژبەر ڤێ یەکێ خەلکێ کورد تو چارەیا غەیري ئیسلامي قەبول ناکە.

٣- دچارچۆڤەیا چارەسەرکرنێ یا پرسگرێکا کوردا کو دئەنجاما زۆردەستیێن ئیدەئۆلۆجیا ڕەسمي یا کەمالیستدە دەرکە تیە حۆلێ ئو حەتا ئیرۆ بویە سەبەبێ مرنا بهەزاران ئینسانان ئو کشاندنا ئێشێن گراندە، ئەشکەرە بویە کو دڤێ سیلەح و شددەت نە بن ئەنسترومانێ چارەسەریێ.

٤- دڤێ چارەسەریا برێێن سیاسي یا پرسگرێکا کورد بێ پاراستن و پێڤاژۆیا چارەسەریێ یا کو بڤي ئاوابي هاتیە دەستپێکرن.

٥- دڤێ پێڤاژۆیا چارەسەریێ؛ تەرککرنا پۆلیتیکایێن ئینکار



# ژبەر كو هەدەف ڕاست نایێ تەسبیتكرن پرسگرێك كورتر دبە



## ئەنجامنامەیا كارخەباتا چارەسەریا ئیسلامیا ژبۆ پرسگریكا كورد

لدیاربەكرێ ٧-٨ ێ ئادارا ٥١٠٢ داندە ببەشداربونا نێزي ٠٠٦ دەلەگەیێن ژجوربەجور سازیێن جڤاكي یێن سڤیل، جەماعەتو جامیعە، عالمێن مەدرسەیان ئو پێشیڤانێن مەیێن مەعنەوي كۆمخەباتا چارەسەریا ئیسلامي یا ژبۆ پرسگرێكێن كورد هات تەرتیبكرن.

بئارمانجا چەوتیێن كو دپێڤاژۆیا چارەسەرییدە هاتنەكرن، سەدەمێن چێبونا ختمینان بێن خەبەردان، تەوسیە بێ كرن دا كو پێڤاژۆ لسەر زەمینەكە ساغلەم ڕونێ، شاشیتي بێن ڕاستكرن، خەتمین بێنە ڤەكرن؛ ریا چارەسەریەكە عادل و ئاشیتیەكە دائیم بێ نقاشكرن، دەلەگە هاتن جەم هەڤ و لسەر وەشاندنا ڤێ ئەنجامنامەیێ لهەڤ كر.

پرسگرێكا كورد نە ببعودەكە بئەولەهییێ تەنێڕە عەلەقەدارە؛ مەسەلەكە كو ببعودێن وێ یێن دیرۆكي، سیاسي، سۆسیۆلۆژیك، ئابۆري، هەرێمي ئو ناڤنەتەوەیي هەنە. ژبەر كو هەدەف ڕاست نە هاتنە تەسبیتكرن و ڕێبازێن ڕاست نە هاتنە بكارئانین، چارەسەري دەرەنگ دكەڤە ئو ژلەو پرسگرێك كورتر دبە. گها یە نۆقتەیا كو بەر بقانسێرێڤە دچە، ژبەر ڤێ ژي مەسەلە گەرە بەریا هەر تشتي ئو عاجیلەن وەرە چارەسەركرن.

كورد هەما پشتي عەرەبان، بەریا ترك و فارسان بئیسلامێ شەرەفیاربونە ئو بونە عنصورەكە ئەصلي یا ئوممەتا ئیسلامێ. كوردستانا كو بپڕاني ئو كۆمي كورد لێ دژین دناڤەندا جۆوغرافیایا ئوممەتێدەیە. پرسگرێكا كورد بێچارەسەر بمینە، ئەوێ باندۆرەكە مەنفي لهەمي جۆغرافیایێ ئو ئوممەتێ بكە، لێ بەلێ چارەسەریەكە عادل ئەوێ ئوممەتا ئیسلامێ ئو جۆغرافیایێ دلڕحەت بكە.

ترك و عەرەب و فارسێن كو قەومێن جیرانێن جۆغرافیایا كوردستانێنە، تایبەتمەندیا وانا هەري گرینگا بكوردانڕە هەڤپار، مسلمانتیە. جودابونا زمان و ڕەنگێن مە، ژئایەتێن خوەدانە. (ڕوم: ٢٢) ئەم وەك خەللك و قەبیلەیێن ژهەڤ جودا هاتنە خولوقاندن دا كو ئەم هەڤودو ناسبكن. (حجرات: ٣١)

بێگومان ئاشیتي بخێرترە (نساء: ٨٢١)

# Bexçê Zaroka



## Şekir û Şukur... Herdû Jî Gelek Şêrîn in

Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm Yanî Xwedayê dilovan.
Selat û selam li ser rêber û rêzanê me Hz. Mûhemmed Mistefa û li ser ehlê beyta wî û li ser sehabîyên wî û kesên heta roja qiyametê rê û rêça wî bişopîne be.
Zarokên hêja û delal!
Ji bo ku Xweda em di vê hejmara kovara Kelhaamed de dîsa gîhandiye hev dû, em şukr û hemdê wî dikin.
Erê, havînê jî mala xwe koç kir û li şûna wê payizê kon vegirt.
Di hejmara borî de me behsa ehemîyet û fezîleta xwendina Qurana Kerîm kiribû. Ez bawerim ku hûn hînî xwendina Quranê bûne. Wer heye ku ji we hinekan gelek sûreyên kin jî ezber kirine. Xweda bike qismetê hemî zarokên mîna we… amîn.
Belê zarokên hêja!
Em di 'erefa 'îda zurbanê de ne. Ji Muslumanan kesê ku Xweda kir qismet ji wan re çûn heccê. Xweda me ê ku ne çûne têxe ber du'ayên wan… amin.
Emê jî ê zarok li 'îdê bigerin, şekira bicivînin. Bi şekira re emê şukur bikin. Şekir û şukur… herdû jî gelek şêrîn in. Bes şekir bi şukurkirinê şêrîntir dibe. Ger we ne ceribandibe ka biceribînin.
Di vê hejmara me de jî, ji bo hûn jê îstîfade bikin, me gelek tiştên xweş û rind ji bo we nivîsandîye
Yek, hedîsên pêxember in, divê hûn baş bixwînin û ezber bikin.





Ya duyem çend gotinên pêşîya ne, divê hûn vêna jî baş ezber bikin û di axaftinên xweyên rojane de bikarbînin.
Yê din jî wek pêkenok û hist û serpêhatî ne ku meriv jê şîret û dersan bigrin û ewê ji bo me bibine mînak û rênîşan înşallah.

## KÎ JI WE DIXWAZE BIÇE CENNETÊ?


Mamosteyê dersa dînî, di dawîya dersê de ji zarokên xwendevan dipirse; gelo jiwe kî dixwaze biçe cennetê? Hemî xwendekaran pêçîya xwe bilind kirin û gotin em dixwazin herin cennetê, feqet yek ji wan bi navê Zeynep, pêçîya xwe ranekir û bêdeng ma. Ev tewra zeynebê bala mamoste kişand.
Mamoste: "Zeynep! Gelo çima te tilîya xwe bilind nekir, ma qey tu naxwazî herî cennetê?"
Zeynep: "Welleh mamoste ne ku ez naxwazim, diya min gotibû ku dema tu ji mektebê derket, dibê tu qe tbi tu der û cîhî de neçî û bi lez were malê. Ji lewma min pêçîya xwe bilind nekir."

## HEVALTÎYA MAR Û ROVÎ

Rojek ji rojan, pir derbasbûye wext û zeman.
Dibêjin mar û rovî bûne heval. Meriv dikare bêje tew bûne dost. Baş guhbidin vê hevaltîyê ev mînak e ji bo me û we… Lewra mar bi bêbextî û rêvî jî bi zeğel û fêlbazîya xwe tê zanîn. De werin sêrbikin li wan bê ka çi dibe.
Mar û rovî ketine rêwîtîyê, wê herin dereke cûda. Piştî demekê, hatin rexê çemekî û mar ji rê hevalê xwe re got; ez nikarim derbasî hêla din bibim. Rovî mêze kir ku hevalê xwe weha bihêle nabe, got: "Hevalê mar! Were ezê te di ser milê xwe de divî çemî re derbas bikim." Mar teklîfa dostê xwe qebûl kir û xwe li stuyê wî gerand û ketin nava çem, wê derbasî hêla din bibe. Rovî û rêhevalên xwe yê mar, di nav ava çem de gîhaştine nîvê rê. Piştî demekê mar xwe listuyê rovî şidand û xwest wî bifetisîne.
Rovî mêze dike ku wê bi rastî wî bifetisîne dibêje: "Lo hevalê mar, ma hey wa têmin bikujî, beriya ku ez bimrim ez dixwazim wan herdû çavên te maçîbikim." Û gelekî bi doramar dikeve. Didawîyê de mar qani' dibe û rovî ji boçavên wî maçî bike serê xwe dirêjî wî dike. Rovî çawa ku dibîne, hema dev liserêwî dike û wî dikuje.
Rovî der dikeve ji avê û diçe ser girikê rexê çem û wiha carê li mar mêze dike; marê ku mirîye bi ser avê ketîye û dirêj û rast bûye. Rovî lê dinêre û dibêje: "Lazim e hevaltî û dostanî wiha rast be ha!"



# BEXÇÊ ZAROKA



## GOTINÊN PÊŞÎYA

- Bi tifinga xelkê mêranî nabe.
- Mirov çiqas bi ‘eqil be jî, her hewceyî ‘aqilan e.
- Ku mirov diz be, şevreş pir in.
- Mirov di heftan de çi be, di heftêyî de jî ew e.
- Mêş hene hingiv çê dikin, mêş hene hingiv dixwin.
- Ez garisê şeng im, mêrê roja ceng im.
- Mirinê dibîne, bitayê qayîl dibe.
- Dil çiqas mezin be jî, du evîn tê hilnayên.

## HEDÎSÊN PÊXEMBER

1) Îslam exlaqê xweş e.
2) Kesên li însanan merhemetê neke, Xweda jî li wan merhametê nake.
3) Hêsan bikin, zehmet û dijwar nekin, mizgînê bidin, jê nede nefret kirin.
4) Kesên ji xêrê re dibe wesîle, mîna ku wê xêrê kiribe.
5) Ji we kesek heta ku tiştê ji nefsa xwe re dixwaze, ji bo birayê xwe yê misilman jî nexwaze, bi heqîqî û rastî îman ne anîye.
6) Heta ku hûn îmanê neynin hûn naçin Cennetê, heta ku hûn ji hev hez nekin jî, we bi heqî îman neanîye.
7) Bi birayê xwe yê mumîn re munaqeşe neke, qerf û henekên ku li xweşa wî naçe bi wî neke û ehd û soza ku tu nikarî bînî cî nede.
8) Xweda li wech û mal û milkê we nanêre. Feqet Xweda liqelbê we û li kar û ‘emelê we dinhêre.
9) Riza Xweda, di rizaya dê û bavan de ye. Hêrs bûna Xweda jî di hêrsbûna dê û bavan de ye.
10) Ê ku ji biçûkên (zarok) me re merhametê neke û ji mezinên me re rêz û hurmetê neke, ew ne ji me ye.
11) Ew kesê ku me dixapîne ne ji me ye.







# SEDEQETA HZ. ÎBRAHÎM Û TESLÎMYETA KURÊ WÎ HZ. ÎSMAÎL

Hz. Îbrahîm xewnek dît:
Xweda emrê wî dike ku kurê xwe Îsma'îl gorî bike yanî bike qurban û serjêke.
Hz. Îbrahîm sê caran li ser hev, ev xewn dît û êdî qenaata wî pê hat û yeqîn kir ku ji teref Xweda ve bi gorîkirina kurê xwe Hz. Îsmaîl hatiye emirkirin.
Lewra ev xewna Hz. Îbrahîm, wehyeke ji cem Xweda hatibû.
Wê demê jî Hz. Îsmaîl hê 12 salî bû. Feqet bi'eqil û bawerîya wî ya bi Xweda ze'hf şidandî bû û ji emrê Xweda re qet î'htiraz nedikir.
Hz. Îbrahîm got: "Kurê min! Xweda ez bi gorîkirina te emir kirime û lazime ez vî emrê Xweda bînim cîh."
Kurê wî Hz. Îsma'îl jî weha bersiveke ku bêhna teslîmyetê jê tê da û got: "Bavo! Ev karê ku Xweda emrê wî bi te kirîye, bîne cîh. Tê min ji wan kesên sebirkar bibîne."
Ellah û Ekber! Binêrin birano, binêrin xuşkno, we zarokekî 12 salî dît bê çawa ji emrê Xweda re teslîm dibe. Xweda emrê me bi çi anîbe, divê em jî wî wek teslîmiyeta Hz. Îsmaîl bînin cî.
Piştî vê bersiva Hz. Îsmaîl ku dibê "Emrê Xweda bîne cîh", êdî bavê wî Hz. Îbrahîm jî wî dibe ser girikê ku bi navê Sebîrê tê zanîn û cîhekî tenha û xewle ye. Wê Hz. Îsma'îl ji bo Xweda bike qurban û serjêke.
Êdî di heyama ku wê wî gorî bike, ka bifikire bê çibû?
Xweda kêra wî ko kir û destûr neda ku Hz. Îsma'îl gorî bike. Di şûna wî de beranekî xweşik şand ji wan ra ku qurban serjê bikin.
Xweda me jî weka Hz. Îbrahîm xwedî sedeqet û weka Hz. Îsma'îl jî xwedî teslîmîyet bike… amîn



# FERHENGOK

Aborî: Ekonomik
Afirandin: yaratmak
Agahdar: Haberdar
Agahi: Malumat
Agirbestî: Ateşkes
Ajal: Hayvan
Amûr: Araç, alet
Aram: Sakin, sabırlı
Aramî: İstikrar, dinginlik
Aso: Ufuk, çevren
Ast: Düzey, seviye
Babet: Layık
Badilhewa: Boşuna, 2- bedava
Bandor: Etki
Bar (bireser): Nesne
Behrem: Eser
Bêkêr: Yaramaz, faydasız
Bende: Esir, köle
Bergeh: Kapsam, görünüm
Bergind: Karşılık
Bergirî: Korunum, savunma
Bextewar: Bahtiyar
Bidawîkirin: Sonuçlandırma
Bihişt: Cennet
Bingeh: Temel
Binyad: Temel, usul, esas
Bireser: Nesne, obje
Biteqize: Defol
Bûyer: Olay, hadise
Cûdahîxwazî: Farklı olmayı istemek
Çalak: Etkinlik
Çarîn: Dördül
Çavkanî: Kaynak
Çepgir: Solcu
Çetewarî: Çete şeklinde
Çewt: Yanlış
Dabeşkirin: Paylaşma
Darîştî: Türetme
Debar: Dirlik, geçim
Dewlemend: zengin
Dewreheval: Dönem arkadaşı
Dihûne:  örüyor (örmekten "hûnandin")
Dij: karşı
Dijraber: Aykırı, karşıt
Dilzîz: Duygulu, hassas
Dîtbarî: Görsel
Dojeh: cehennem
Encam: Socuç
Ewlehî: Güven
Fikar: Endişe
Frengistan: Batı
Gelperwerî: kişinin kavmini sevmesi
Gengeşî: Tartışma
Gerdengaz: Uzun boylu
Gerdûn: Evren, dünya
Gerguhêz: Lazım, geçişsiz
Gihayî: Yetişmiş
Girîng: Önemli
Giyan: Can
Gûman: Haberdar olma
Ğezel: Gazel
Hayîdar: Haberdar
Helbestvan: Şair, Sanatçı
Heman dem: Aaynı zaman
Herî: Daha, en(büyük)
Hevaldoz: Dava arkadaşı
Hevok: Cümle
Hevpar: Paylaşma
Hevtayî: Denklik
Hol: meydan, orta
Hozan: Ozan
Hubba cah: Makam sevgisi
Înkîşaf: Ortaya çıkma
Îslamvan: İslamcı
Îşlik: gömlek
Jidayîkbûn: Doğum
Kalan: Kılıç kılıfı
Karguzari: İşgüzarlık
Lebatkar: Hareketli
Merc: Şart, koşul
Mexles: Mahlas
Mihrîbanî: Rahmani
Milyaket: Melek
Mînak: Misal, örnek
Mist: aya, avuç
Mixabin: Maalesef
Munîr: aydınlatıcı
Navend: Merkez
Netewekarî: Nasyonalizim
Newa: şekil, çeşit
Neyînî: Menfi, olumsuz
Nêzmeriv: yakın kişi
Niqaş: Tartışma
Nişteci: Yerleş
Nîveng: Ortam
Noker:  Uşak
Notirvan: Bekçi, korucu
Nûçevan: Haberci
Nûner: Temsilci
Parêzvanî: Savunuculuk
Parzûnandin: Süzme
Paşnav: İsmin sonuna gelen (ek)
Paşqertaf: Son ek
Payde: Payda
Pejirandin: Tanıma, kabullenme
Pergal: Nizam, sistem
Perwerdeyî: Eğitim
Pêşeroj: Gelecek
Pêşqertaf: Önek
Pêvajo: Süreç
Pevgihan: Bileşen
Pêwîst: Gerekli
Peyrew: Tabi
Pirhêlî: Çok yönlü
Pispisandin: Fısıldamak
Pisporî: uzmanlık
Qanûna bingehîn: anayasa
Qaşo: Sözde
Qelender: Aşık, babacan
Qertaf: Ek, ilave
Qetûbir: Kesici
Qezîkirin: Söz etme
Qutifandin: Sindirme, yıldırma
Rasterast: Doğrudan
Rêbaz: Ekol, metot
Rêgez: İlke
Rêheval: Yol arkadaşı
Rêkûpêkkirin: Düzene koymak
Remildar: Remilci
Reşîtarî: Koyu karanlık
Rewşenbîr: Aydın, kültürlü
Rex: Taraf
Rêxistin: Organizasyon
Rexne: Değerlendirme, elelştiri
Rêzdar: İtibarlı
Rîc'et: Dönüş
Rihber: Canlı
Ripîronî: Apaydınlık
Salixnav: Sıfat
Saziyên civakî: Sivil toplum kuruluşları
Sedem: Sebep
Sitemkar: Şikayetçi
Sohtandin: şewitandın
Solbend: Ayakkabıcı
Şaşwaz: Şaşkın, mütehayyır
Şehinşahî: İmparatorluk, kırallık
Şem': Mum
Şeng: Neşeli
Talîbbûn: Talip olmak
Taybetî: Özel
Taybetmendî: Özgünlük
Tenkîd: Eleştiri
Veberhênan: Yatırım
Vehewandin: Barındırma,
Wate: Anlam, mana
Wêne: İmaj, prtre
Wihareng: Bu şekilde
Xal: Nokta
Ximam: Anlaşılmaz, bulanık
Xîmê: Otak
Xodbînî: Kendini beğenme
Xweşmîsal: Güzel örnek
Yewnan: Yunan
Zanyar: Bilgin, alim
Zarava: Lehçe
Ze'f: zayıflık
Zulf: Yüzün iki tarafından sarkan saçlar